# Serhildana Seyîdan û Berazan

## [Seyîtxan-Elîcan-Fesihê Mihê Mîrze]

**Ahmet Aras**



*Dîrok*

Weşanên Pêrî

# SERHILDANA SEYÎDAN Û BERAZAN

## [SEYÎDXAN - ELÎCAN - FESİHÊ MIHÊ MÎRZE]

**Ahmet ARAS**

Ji bo berêz Argun Çakır
bi silavên dostî,
18.02.2010
İstanbul

**Dîrok / Folklor**

**Weşanên Pêrî**

Navê Berhemê:
**SERHILDANA SEYÎDAN Û BERAZAN**
**[SEYÎDXAN- ELÎCAN - FESİHÊ MIHÊ MÎRZE]**
**Nivîskar:**
Ahmet Aras
**Mijar:** Dîrok/Folklor
Çapa Yekem:
Çirîya paşin -Stenbol / 2009
**Edîtor:**
Ehmed ONAL
**Berg:**
Suzan Doğan
Wêne:
Mehmet Kolçak
**Çapxane:**
Kayhan Matbaası
Davutpaşa Cad. Güven San. Sitesi
C. Blok, No: 244, Topkapı - İstanbul
Tel: 0 212 576 01 36

ISBN : **978 975 - 9010 - 99- 7**
Mafê çapê parastî ye!

**Weşanên Pêrî**
Söğütlüçeşme Cad.
Pavlonya Sok.
Nuhoğlu Apt. No: 8 / 4
Kadiköy / İSTANBUL
Tel-Fax: 0 216 347 26 44
GSM: 0 533 488 01 12
e-mail: periyayinlari@yahoo.com.tr

# SERHILDANA SEYÎDAN Û BERAZAN

## [SEYÎDXAN- ELÎCAN - FESİHÊ MIHÊ MÎRZE]

**Ahmet ARAS**

**Dîrok / Folklor**

**Weşanên Pêrî**

*Ez vê bernameyê dîyarî wan dengbêjên me*
*yê bi rûmet dikim ku bi wan stranên xwe;*
*dirok, ziman û jîyana kurdewarî*
*bi folklorî gihandine me..*

EW DENGBÊJÊN KU ME JI SITRANÊN WAN ÎSTIFADE KIRIN

1) Resoyê Kopala. Qereyazî
2) Şakiro (Şakirê Bedîh). Qereyazî
3) Şakirê Kopê (Şakirê Biçûk). Bilanix
4) Zahîroyê Milazgîrê
5) Nûroyê Meter. Intab, Qerekose
6) Mihemedê Canşa. Gundê Delîkîyê, Qereyazî
7) Xênî, Gundê Beyro, Qereyazî
8) Mihemedê Beyro. Qereyazî
9) Marûf. Warto
10) Sidîqê Bozo. Qarliovê/ Kanîreş
11) Cemîlê Basawî, Mêrdîn

# PÊŞGOTIN

Serhildana Berazan û Seyîdan, di dîroka Kurdan da bû-yereke muhim e. Hejmara şervanên serhildanê bi tevahî pêncî sîyar bûne. Sîh û pênc sîyarên Elîcan, panzdeh jî sîyarên Seyîdxan bûne. Şeş-heft alayên sîyarî û bi hezaran jî leşkerên nizamî û milîs pey wan ketine. Gelek şer çêbûne û di wan şeran da bi piranî leşker têk çûne.

Elîcan hê di destpêka sehildanê da di roja çil û pêncan da hatîye kuştin. Wanên din serhildan domandine. Ew serhildana li gor fikr û ramanên Kurdî yan jî ji bo azadkirin û çêkirina Kurdistanî derneketîye. Mirov dikare bibêje ku ev serhildana wekî berxwedaneke xwezayî derketîye holê. Piştî serhildana Şêx Seîd Efendî, dewletê li ser Kurdan sîyaseteke pir hovane meşandîye. Her çi kesên ku pir-hindikî av lê germ bûne yan jî hatine naskirin gişt hatine nefîkirin. Heta ew kesên destgirên dewletê jî pêsîra xwe ji nefîyê xilas nekirine. Ji bo vê yekê li gelek deveran, gelek kesan serê xwe li ber vê helwesta dewletê netewandine; ber xwe dane û serî hildane.

Şervanên Berazan û Seyîdan şerê gerîlayî kirine. Mirov dikare bibêje ku ev di dîroka Kurdan da şerê gerîleyê pêşîn e. Di vî şerê gerîlayî da navend (merkez) tunebûye, rojekî li deverekî roja din li devereke din şer kirine. Her dem cîyê xwe guhestine. Bi vê metodê jî şervan her dem ketine tengasîyê û her dem kuştin li pêşîya wan bûye.

Ji ber vê yekê tirsa wan ji mirinê tûnebûye. Gava ku meriv ji mirinê bêtirs dibe meriv tiştê nebûyî dike ku tu kes jê bawer nake.

Gelek caran alayek yan jî du alayî leşker, hinek caran jî bi hezaran leşker û milîs wana dorpêç dikin, hildidin nava çemberê bi silehên modern û otomatîk û bi bombeyan dajon ser wan di dawîyê da meriv hew dibîne ku wana çember qelaştine û xwe xelas kirine û leşker jî têk çûne.

Di dema vê serhildanê da milîsên Kurdan roleke mezin lîstine. Ew jî xalek pir balkêş e. Piştî serhildana Şêx Seîd, dewletê ji Kurdan hêzên paramîlîter çêkirîye û berî pêsîra Kurdên neyarê xwe dane. Hinek kes li ser daxwaza dewletê û ji nakokîyên navxweyî bûne milîs. Lê gelek kes jî hema bi kêfa dilê xwe bûne milîs. Dewletê mînanî van salên dawîn çek û sileh, pere-pûl nedane milîsan. Ev pirsa tê bîra merîyan: gelo çima?.. Kivşe ku wan kesên ji bo ku pişta xwe bikutun dewletê û ji hêza dewletê îstifade bikin wusa kirine. Lê bi gelemperî gel wusa nefikirîye û sîyaseta dewletê nepejirandîye, dengbêjan li ser vê serhildanê gelek kilam derxistine. Di van kilaman da lehengî û mêrxasîya şervanên serhildanê anîne ziman.

Kilam, di eynî wextê da serencama serhildanê jî bi taybetî neqil dikin.

Gundê Elîcan *Hespreş* nêzîkî gundê me ye. Merivên malbata Bişar Axa gişt cînarê me ne. Li alîyê me di civatan da him ev serhildan tê xeberdan, him jî dengbêj van kilaman dibêjin. Min bi xwe jî ji dema zaroktîya xwe da ew xeberdan û kilam guhdarî kirine, piştî demeke dirêj min bala xwe dayê ku ew kilaman wek belgeyên dîrokî rastîyê neqil dikin.

Ji ber vê yekê, deh sal berê min biryar dayê ku bi gotina van kilaman va dîroka vê serhildanê binivîsim. Ji bo vê yekê min bi gelek kesan ra hevpeyvîn kirin.

Min pênc caran bi kurê Elîcan yê piçûk Hecî Silêman ra xeberda, min bi kurê kurapê Elîcan Ferîdun Qamîş, bi nebîyê Elîcan

Evdilqadir Ak, bi nebîyê kurapê Elîcan Xalit ra xeberda. Xêncî van kesan min çil-çil û pênc sal berê bi kurapê Elîcan Evdilezîz û Sûlheddîn ra jî xeberdabû. Wan herdu bira bi Elîcan ra beşdarî serhildanê bibûn. Tevî gelek şeran bûbûn, paşê jî derbasî Binxetê (Sûrîyê) bibûn û piştî heftdeh-heştdeh sala vegerîyabûn welêt. Wana ji min ra qala gelek tiştan kiribûn. Malên wan wê demê li Qereyazîyê bûn. Wexta ku ez diçûm Qereyazîyê, ez û Hecî Evdilezîz ji nava bajêr derdiketin nava mêrg û çayiran, me direj direj sohbed dikir. Wî ji min ra qala Kurdên Sûrîyê dikir. Di şeran da çi hatibûn serê wan ji min ra qal dikir. Li Sûrîyê bi Cegerxwîn ra çawa bibûn cînar, çawa bûne dost tev ji min ra dîyar dikir. Wî navê Cîgerxwîn (Şexmûs) li kurekî xwe jî kiribû. Bi kurtî ez bêjim, di derheqê serhildanê da min jî gotinên Evdilezîz û birayê wî Sûlheddîn pir îstifade kir. Di dema lêkolînê da ez bi parlamenterê Muşê yê kevn Şêx Qîyasedîn Emre ra hevnas bûm û sê sal berê min bi wî ra hevpeyvînek kir. Şêx Qîyasedîn nod û pênc salî bû û wî Elîcan û Seyîdxan dîtibû.

Di destpêka serhildanê da Elîcan û Seyîdxan bi sîyarê xwe va çûne gûndê wan, şevekê li wir mane, Şêx Qîyasedîn wê demê heftdeh-heştdeh salî bûye. Gundê Seyîdxan nêzîkî gundê wan bûye û bavê wî û Seyîdxan jî dostê hev bûne. Tiştên ku wî ji min ra gotin, min hildane pirtûkê. Şêx Qîyasedîn ez bi nebîyê Seyîdxan Hecî Sulhedîn û birayê wî Şahîn ra danasandim. Du meh berê Şex Qîyasedîn çû ser heqîya xwe, rehma xwedê lê be.

Ez ji bo ku bi nebîyên Seyîdxan ra xeberdim, divêd biçûma Mûşê, lê ev pêk nehat. Paşê min gelek caran bi nebîyên Seyîdxan Hecî Sulhedîn û Şahîn ra bi telefonê xeberda. Hecî Sulhedîn ji min ra salixê serpêhatîya Fesihê Mihê Mîrze kir. Fesîh jî ji ber zulma dewletê firar kiribû û tevî serhildanê bibû. Hecî Sulhedîn ji min ra got Fesîh serpêhatîya xwe nivîsîye û sûretekî wê daye pismamê xwe Dr. Muzafer Demîr. Min ji Dr. Muzafer ra telefon kir, ewî di

demeke kurt da serpêhatîya Fesîh şand. Şeş-heft meh berê Dr. Muzafer di qezayeke tarfîkê da jîyana xwe ji dest da! Ez pir ber wî ketim. Bi rastî jî Dr. Muzafer Demîr rewşenbîrekî pir bi rûmet û Kurdekî dilsoz bû. Wî li ser çand û dîroka Kurdan jî lêkolîn dikir. Min ji gotinên wî jî îstifade kir. Rehma xwedê lê be!

Fesîh çil sal piştî serhildanê di serê salên 1970yî da bi Tirkî serpêhatîya xwe nivîsîye. Serpêhatî bi deqtîloyê hatîye nivîsandin û pêncî û sê rûpel in. Ew di bîst rûpelên ewilîn da qala serhildanê dike. Di beşa din da jî qala jîyana xwe ya Sûrîyê û Tûrkîyê dike. Di sala 1937an da Erebên Sûrîyê li ber Fransîyan serî hildidin û bi hêzên Fransizan ra şerê çekdarî dikin. Fesîh jî tevlî serhildanê dibe û bi Fransîyan ra şer dike. Paşê ku serhildan têk diçe ew jî tê girtin, di pey ra Fransî wî teslîmî Turkîyê dikin û ew demeke dirêj li Tûrkîyê di hepsê da dimîne. Serpêhatîya Fesîh Begê pir bi kêrî min hat. Gotinên wî û ew kesên ku min pê ra hevpeyvîn kiribûn pir nêzîkî hev bûn. Tiştekî din jî gotinên Fesîh Begê rastîya kilaman nîşanî me didin.

Ew kilamên ku dengbêjan li ser serhildanê derxistine panzdehşanzdeh heb in û îro jî di nava gel da tên gotin. Ew êdî bûne kilamên klasîk. Û wê ji îro û şûnda jî bên gotin. Emê bersîva vê sualê bidin. Kîjan kilam dibin kilamên klasîk? Ew kilamên ku ji alîyê dengbêjên baş va bi qaîde û meqamên xweş va tên gotin û heger dengê wîcdana gel jî bi awayekî objektîf îfade dikin, ew êdî dibin klasîk. Piranîya kilamên vê serhildanê ji alîyê Mistefayê Xellê Heyran va hatine afirandin. Mistefayê Xellê Heyran ji gundê Qazîcelalê ye. Ango Mistefa jî her wekî cînarê malbata Elîcan e û wê malbatê ji nêzîk va nas dike. Ez dikarim bêjim ku Mistefayê Xelê Heyran piştî Evdalê Zeynikê li Serhedê dengbêjê herî mezin e.

Wê demê li ser dengbêjan jî zor û zexta dewletê hebûye, dengbêjan ku qewimandinên Kurdan yên dîrokî anîne ziman, li ser ser-

hildanên Kurdan û lehengên Kurdan kilam derxistine, dewlet pir aciz bûye. Li gelek deveran karmendên dewletê li dengbêjan îşkence kirine. Lê li gellek deveran berpirsîyarê dewletê yên camêr jî hebûne. Yek jî ji wan rastî Mistefayê Xellê Heyran hatîye. Wekî mînak em qala wê serpêhatîyê bikin.

Gundê Mistefayê Xelê Heyran jî wê demê li ser Hesenqelê bûye. Berpirsîyarên dewletê helbet xeber hildane ku kilamên Mistefa tesîreke mezin li ser Kurdan dikin. Fermandarê Hesenqelê yê leşkerîyê cendirma dişîne û Mistefa tîne huzûra xwe. Li wê hêlê gundên Tirkan û Kurdan di nav hevûdu da ne. Mistefa him Tirkî baş zanîbûye û him jî ji sitranên hozanên Tirkan jî hayîdar bûye. Li gor gotinan fermandar bînbaşî yan jî albay bûye. Fermandar bi hêrs jê ra dibêje;

*"Me xeber hildaye ku tu li ser serkêş û firaran, li ser xa-yinên dewletê kilaman dibêjî, ev rast e an ne rast e?"*

Mistefa bersiva wî dide û dibêje;

*"Belê, rast e!"*

Fermandar bi ser wî da digurmice û dibêje;

*"Çima tu nizanî ev sûcekî giran e û dewlet ji bo vê yekê serê mirovan difirrîne?.."*

Mistefa dibêje;

*"Dewlet qet nikare tiştekî bi min bike."*

Fermandar şaş dimîne, şoq dibe û dibêje;

*"Tu bi çi cesaretê waha xeber didî?"*

Mistefa dibêje;

*"Ez miroveki hunermend im, ez hozanekî mezin ê qirna bîstan im. Çi ber çavên min bikeve, ez li kîjan bûyerê bibim şahid, ez li ser wê kilaman dibêjim. Ez li ser merivan, li ser çîya û banîyan, li ser dar*

*û beran, li ser çem û avan, li ser her tiştî dibêjim. Ne tenê bi Kurdî, bi Tirkî jî ez dikarim bistirêm. Hezdikî ez aniha li ser Atatirkê we, li ser Fewzî Çaqmaq, li ser Îsmet Paşa, heta li ser te jî dikarim kilamekî derxim."*

Fermandar merivekî camêr bûye, li ser vê bersiva wî nerm dibe û bi zimanekî xweş weha dibêje;

*"Tu Atatirk û Fewzî Çaqmaq bide alîkî, hela li ser min kilamekî bibêje. Çika tu çawa dibêjî?"*

Fermandar zilamekî bejin dirêj û çeleng bûye, Mistefa dest pê dike, bi Tirkî distirê û dibêje;

*Lo lo fermandaro bejna te zirav e*

*Unîforma çiqas xweş lê hatîye*

*Bişkok û stêrk li ser dibiriqin mîna zêran*

Nizanim çi û çi...

Fermandar sitrana wî pir diecibîne û dibêje;

*"Herbijî, tu hozan î, êdî tu serbest î, tu çi dixwazî bike, tu çi dixwazî bêjî, bibêje!"*

Paşê digre kaxizekî dinivîsîne imzaya xwe lê dixe û dide Mistefa. Di kaxizê da dinivîsîne, *"Ev zilama hunermend e, hozanekî yekta ye, tu kes tekilî wî nebe."*

Mistefayê Xellê Heyran bi vî teherî pêsîra xwe ji dewletê xilas dike.

Ji bo ku şert û mercên wê demê baş bên qefilandin û ew kes û malbatên ku pêwendîyên wan û dewletê û pêwendîyên wan û serhildanê bên fêmkirin me bi firehî qala wan kir.

Bi vê sedemê me qala pêwendîyên malbata Fesihê Mihê Mîrze (Şewêşî) û malbata Ferzendê Silêmanê Ehmed (Emerî) kir. Şerê

navbera wan û kilama li ser wî şerî (Kilama Dêran) me hilda pirtûkê.

Dîsa jî ji bo vê yekê me qala kuştina Kor Husên Paşa û Medenîyê Hecî Musayê Xuweytî kir û kilama li ser Husên Paşa da. Xêncî vana me qala milîsên Sîpka kir.

Me çend bûyerên balkêş, yên ku di dema serhildanê da qawimîne, wekî anektot nivîsandin.

Li jorê me qala girîngîya vê serhildanê kir. Li gor fikra min di dîroka Kurdan da piştî serhildana Şêx Seîd Efendî vê serhildanê tesîra herî mezin li ser civaka Kurdî kirîye. Belgeyên devletê yên fermî jî vê rastîyê tînîn ziman. Di sala 1935an da Serokvezîr İsmet Paşa bi navê "Kürt Raporu" raporek tanzîm kirî ye.

Di raporê da İsmet Paşa dibêje: "Ew serhildanên* ku li deverên cuda cuda darketine mînanî cereyana pîlan ruh dane civata Kurda Li gorî ku çeteya Elîcan û Seyîdxan ji 80-100** kesî pêk hatîye, lê wana çandî çend salan dewlet kirine tengasîye. Her çawa ' Cıbranlı Xalît' , 'Bitlisli Yusuf Ziya', 'İhsan Nurî' , 'Hesenanlı Edo'*** her wusa jî Elîcan û Seyîdxan (yên mirî û zindî) iro di nav gel da (Kurd) weke leheng û qehremanan tên qebûlkirin"

Ya rastî eve ku her çiqas lehengên wê serhildanê çengek meriv bûne jî, wana himê dewletê hejandîye.

Pirsa dawî ez bêjim ku kilamên Kurdan ji bo Kurdan pir girîng in. Divê bi her awayî bên nirxandin, lewra ew bi tenê ne sitran in,

---

** Binerin; Saygı Öztürk "İsmet Paşa'nın Kürt Raporu", Doğan Kitap, 5. Baskı, , Sayfa 74-75, Şubat 2008*

*** Serî da hêjmara wana li dor 50 kesî bûye. Paşê ev kesên ku ji ber zulma dewletê firar dikin, direvin diçin xwe digîhînin Seyîtxan û Elîcan, bi vî teherî h3ejmara wana digihîje sed kesî. Lê ku paşêev firarên deverên din ji wana diqetin hêjmara wan a dadikeve çilî, sîyî heta bîstî...*

**** Edo Hesenî nîn e. Azîzî ye. Ji wê bonê gotine "Edoyê Azîzî"*

di eynî wextê da arşîva dîroka Kurdan in. Me ji sosyolojîya Kurdan jî hayîdar dikin, erf û edetên Kurdan, rewşa jîyana Kurdan ya dem û dewranên kevn nîşanî me didin.

Ew ferhenga ziman in jî. Ew hîmê çanda Kurdan in.

Ji bo alîkarîyê ez sipasî dengbêj Şakirê Kopê dikim.

Ji bo nivîsandin û rêzkirina vê xebata min ji dostê xwe Mehmet Zeynettîn Ûnay ra sipasîyên xwe dikim. Her hebî...

**Ahmet Aras**


Adar 2009

Îzmîr

# SERHILDANA BERAZAN Û SEYÎDAN

## MALBATA ELÎCAN

### Secera Malbata Elîcan



Elîcan Berazî ye, li gundê gelîyê Beraza Hespreş hatîye dinyayê. Berazîyên wê hêlê ji welatê jêr hatine, bi texmin 300 sal berê li vê derê bi cîh û war bûne. Di navbera welatê jêr (Dîyarbekir, Mêrdîn û Riha) û Serhedê da koçerîtîyeke pir gumrah hebûye. Eşîretên welatê jêr di serê biharan da pez û dewarên xwe hildidin tînin li zozanên Serhedê diçêrînin û payîzan jî vedigerin cîhê xwe. Berazîyên alîyê Rihayê û Deşta Sirûcê jî her sal hatine gelîyê Berazan. Di nava demê da li vê hêlê bi cîh û war bûne û mane. Ji Berazîyên gelîyê Berazan ra *"Berazîyên gawestîyayî"* , ji Berazîyên welatê jêr ra jî *"Berazîyên gamirî"* tê gotin.

Wê çaxê barbirên êl û eşîran bi piranî *"ga"* bûne. Ango gayên Berazîyên jorê westîyane loma venegerîyane. Gayên Berazîyên jêr jî mirine\ loma êdî nehatine zozanan.

Ji malbata Elîcan ra *"Mala Bişar"* dibêjin. Bişar kalkê Elîcan e. Bavê Elîcan Hecî Axa di alaya Fetula Begê Hesenî da yuzbaşî bûye. Wexta ku şerê cîhanê yê yekemîn derdikeve alaya Fetula Begê li Milazgirê bi artêşa Uris ra şer dike. Pey ra li ber Kara Sipî şerekî bêeman dibe, di wî şerî da nîvê alaya Fetulla Begê şehîd dikeve. Paşê alaya Fetula Begê belav dibe. Bavê Elîcan Hecî Axa jî şehîd dikeve. Fetula Beg tevî merivên malbata xwe dibe mihacir, diçe Siwêrekê. Elîcan jî tevî kurap û pismamên xwe dibin mihacir, diçin li başûrê Qeyserîyê li serfêza çîyayê Eledaxê li gundekî bicîh dibin. Demekî Pey ra ku Mistefa Kemal Paşa li Enqarê meclîsê top dike merivê xwe dişîne alîyê Riha, Mereş, Entab û Çiqûrovayê ku ji gel milîsan çêkin û bi Fransîyan ra şer bikin. Çimkî wê demê hêzên Fransîyan wan deveran zeft kiribûne. Merivên Kemal Paşa diçin Elîcan jî dibînin, pê ra xeber didin. Jê ra Dibêjin; *"Welatê me ji alîyê gawiran va hatîye dakirkirin, erz û eyalên me, namûsa me di bin lingên wan da mane. Ji bo merivên mînanî*

*te dînpolat û welatparêz ne roja sekanê ye. Eger ku tu dikarî merîyan li dora xwe bicivîne, milîsekî çêke, emê çek û silehan bidin te û bi wan ra şer bike."*

Li ser wê daxwaza wana Elîcan jî meriv û pismamên xwe û ji Kurdên mihacîr dused kesî li dora xwe kom dike û bi hêzên Fransî û lejyonên Ermenîyan ra dikeve şer. Milîsên Elîcan ji çil rojî bêhtir bê rawestan şer dikin, dawîyê da berdidin hêzên Fransîyan û lejyonên Ermenîyan û wan dibin li jêra Çiqurowayê asê dikin. Ew deverên dorhêla çemê Ceyhanê û gelîyên çîyayê Eledaxê ji yalê milîsên Elîcan va tên rizgarkirin. Elîcan bajarên wî alî Feke, Tefenî û Hacimê jî xilas dike. Paşê ku şer xilas dibe, Elîcan tevî merivên xwe careke dinê bar dike û tê welatê xwe.

Elîcan û Şêx Seîd Efendî dostên hev bûne. Di gundê Qereyazîyê Kosa da erazîyê Şêx Seîd hebûne, Şêx ji Elîcan ra xeberê dişîne dibêje; *"Ji bo min avahîyan bide çêkirin."*

Elîcan merivên xwe dişîne Kosa, ji Şêx ra avahîyan dide çêkirin. Di sala 1922yan da li ser erazî di nava Elîcan û pismamê wî Efendî da pevçûn derdikeve, Efendî tê kuştin. Pey ra Elîcan û birayên wî têne girtin û heta sala 1926an di girtîgeha Mûşê da dimînin. Wê çaxê gelîyê Berazan li ser Mûşê bûye. Birayê Elîcan yê biçûk Evdilbaqî sûc hildida ser xwe û Elîcan û Birayên wî yên din tên berdan. Çar-pênc mehan pey ra Evdilbaqî dişînin girtîgeha Bidlîsê. Demekê şûnda Evdilbaqî û hevalên wî dîwarê girtîgehê qul dikin û derdikevin diçin Kirrê Girîdaxê, cem Biroyê Heskê Têlîyê. Berya wî Edoyê Azîzî, Xalisê Evdilmecîd Begê û Ferzendê Silêmanê Ehmed jî çûne tevî serhildanê bûne. Evdilbaqî jî tevî desteya wan dibe. Deste, zeman zeman ji Kirr derdikeve diçe li cîyên dûr êrîşê dibe ser qereqolan, rîya esker dibire, talanan dibe û karwanan vedigerîne. Di nav gel da ew kirinên wana gişt li ser navê

Edoyê Azîzî tên xeberdan. Edoyê Azîzî ji gundê Intabê Hasûna bûye. Berê ew di alaya Kor Husen Paşa da sancaqdar bûye û di şerê Ûris û Ermenîya da bi mêrxasîya xwe hatîye naskirin. Piştî surgûnkirina Husên Paşa Edo êrişî qereqolan kirîye û gelek cendirme û berpirsîyarên dewletê kuştîye û Pey ra çuye tevî serhildana Kirrê Girîdaxê bûye. Her tişt ku li ser navê Edo tê xeberdan Ferzende diqehire, rojekî Xalis Beg ji Edo ra dibêje; *"Tu ji me biqete, here. Ferzendeyê li texe."*

Edo dibê; *"Ma min bavê Ferzende kuştîye, Ferzende wê çima li min xe. Ez heyfa bavê Ferzende hildidim."*

Xalis û Ferzende kurxal û kurmetê hevûdu bûne. Dîya Ferzende Asîya qîza Hecî Ûsiv Paşayê Sipkî bûye. Xuyaye ku Ferzende ji Xalis ra ev fikr û ramanên xwe gotîye, lê Xalis Beg razî nebûye ku tiştekî waha bibe. Lewra ji Edo ra gotîye ji me biqete û here!. Desteya wana rojekê li çîyayê Diharê bazirganekî Ecem dişelîne û qentirmê deveyên bazirgan hildidin, dibin çîyayê Mêrgemirê. Li wira barên deva datînin. Devê xurcan vedikin, lê dinihêrin.

Wê demê xeber didin, xeberên Ferzende û Edoyê Ezîzî ji hev derbas dibin. Ferzende lê dixe Edoyê Ezîzî dikûje. Kuştina Edo gel pir aciz dike, Evdilbaqî jî wê çaxê ji wana diqete û tê. Êdî naçe Kirr. Hukûmat ji çûyina Evdilbaqî ya Kirr hayîdar dibe lê zêde naçe ser Elîcan. Çend caran cendirma mendirma dişînin, gazî Elîcan dikin lê Elîcan guh nade cendirma, wana diqewitîne.


Wê demê fermandarê cendirmê wîlayeta Erzurumê ji Elîcan ra xeberê dişîne, dibêje; *"Bila were min bibîne."* Ew albay dostê bavê Elîcan Hecî Axa bûye. Di şerê Ûris da bi hev ra bûne dost. Elîcan, kurapê xwe Evdilezîzê Hido û merivekî xwe dişîne Erzurumê, li gor gotina nebîyê Elîcan Evdilqadir

(Ak) û kurê Evdilezîz Ferîd (Kamiş), Hecî Evdilezîz bi xwe ra du hogeçan hildide dibe wek dîyarî dide albay. Albay dibêje; *"Berya serhildanê Şêx Seîd ji Elîcan ra name şandîye, ew name ketîye destê dewletê. Dibe ku bi wê mahnê tiştekî bîne serê Elîcan. Bila hay ji xwe hebe."*

Elîcan jî êdî wekî ronîya çavê xwe zanibûye ku zû-dereng rojekî wê di ser wî da bigirin , ji ber wê yekê tevdîra xwe dibîne. Elîcan qirara xwe didê, dibê eger ku esker bişînin ser me, em teslîm nabin.

## MALBATA SEYIDXAN

### Secereya Malbata Seyîdxan



Seyîdxan Seyidî ye. Seyîdan çîqeke ji eşîreta Hesenan e. Seyîdan, di nav xwe da du qebîle ne: Îlyasîyan û Alîkan. Seyîdxan ji qebîla Îlyasîyan e. Fesihê Mihê Mîrze di serpêhatîya xwe da neqil dike û dibêje; *"Seyîdxan ji şerê navbera eşîret û qebîlan da pir bi gazin bû. Got, em Îlyasîyan û Alîkan bûne dujmin. Ev sed salin ku em ji hevûdu mêran dikûjin."*

Di wê demê da kîngê ku xileport çêdibe Alîkanan, her dem gilîyê Seyîdxan di hukûmatê da dikin.

Seyîdxan li gundê deşta Mûşê Qicix hatîye dinyayê. Ji mala wan ra Dibêjin; *"Mala Ûsivê Seydo"*. Di navbera malbata Ûsivê Seydo û Cibran û Xwêytîyan da gelek caran şer çêbûne û gelek meriv hatine kuştin.

Seyîdan û Cibran carekî şer kirine, serokeşîrê Cibran Seîdê Nado êrîş birîye ser Seyîdan. Şeş-heft gundên Seyîdan şewitandine û şeş-heft mêrên wan jî kuştine. Di wî şerî da birakî Seyîdxan jî hatîye kuştin.

Ji Cibran jî çend kes hatine kuştin. Sê-çar mehan piştî wî şerî rojekî Seyîdxan û merivên wî bi rê dikevin ku herin cîyekî, dema ku tên ber ava Mûradê hew dibînin ku birayê Seîdê Nado û çend merivên wî li ava Mûradê ketine derbasî alîyê din dibin. Merivên Seyîdxan hema tifingên xwe ji milên xwe tînin xwarê û Dibêjin; *"Tam fersenda me lê hatîye, em lêxin di nav avê da giştika bikûjin û heyfa xwe hildin."*

Seyîdxan xwe diavêje pêşîya merivên xwe û dibêje; *"Dev jê berdin, mala Seîdê Nado maleke heyf e, kêmfersendîyê nekin, bihêlin bila di rêya xwe da derbasbin herin!"*

Seyîdxan ku nahêle merivên wî li merivên mala Seîdê Nado bixin, ew jî difilitin diçin. Seîdê Nado ku paşê wê bûyerê dibihîze pir dilxweş dibe. Seîdê Nado wê demê di Serhedê da bi merdî û mêrxasîya xwe va hatîye naskirin. Demekî piştî vê

bûyerê di cimaeta Seîdê Nado da di derheqa camêrî û mêrxasîyê da xeberdanek dibe, yek dibêje;

*"Di vî welatî da ez di ser Seîdê Nado ra kesekî mêrxas nabînim."*

Seîdê Nado jî dijî vê pirsê derdikeve, dibêje;

*"Pirsa te ne rast e. Ji min mêrxastir gelek kes hene li vî welatî. Lê yek heye ji herkesî mêrxastir e."*

Dipirsin; *"Kî ye?"*

Dibêje; *"Seyîdxanê Ûsivê Seydo ye."*

Merivên di cimetê da îtiraz dikin û dibêjin;

*"Ka Seyîdxan li kîderê mêr kuştine?"*

Seîdê Nado dibêje; *"Ma lawo ji we wetrê nexşê mêrxasîyê mêrkuştin e? Esil mêrxasî ew e, wexta ku firsenda kuştina neyarên merîyan dikeve dest, meriv heyata neyarên xwe bibexşîne."*

Şeş meh an jî salek pey ra, birayê Hecî Mûsa Begê Xweytî Qasim Beg bi birrek sîyarî va êrîşê tîne ser gundê Seyîdxan. Wê demê kes li gund tune bûye. Seyîdxan, birayê wî Dewrêş û çend merivên wan li gund bûne. Ew li pêşîya şervanên Xweytîyan bi cesaret ber xwe didin. Wexta ku xeberê didin Seîdê Nado, li cem wî kesek tune bûye, ew jî hema tifinga xwe hildide, bi tena serê xwe dide ser rê. Li wan nêzîkan rastî naxirên du gundan tê. Seîd wan herdu naxiran dide pêşîya xwe û diajo. Ji gavanan ra dibêje *"Kuro bi lez biajon!"*

Ew ku wusa dilezînin û dewar dibezîn toz û dûman wusa bi ser serê naxiran dikeve û li ezman dibe mîna ewrekî reş. Şervanên Xweytîyan ku wê toz û dûmanê dibînin, dikevin nav panîkê. Dibêjin; *"Kuro birevin, xwe xilas kin. Seîdê Nado bi sêsid sîyarî va ser me da girt!"*

Ji wan wetrê ku Saîdê Nado bi sêsed sîyarên xwe tê ser

wan. Giş direvin, tenê Qasim Beg tevî du-sê merivên xwe li meydana şer dimînin . Seyîdxan deng li Qasim Begê dike û dibêje; *"Heyran! Wan merivên te, tu hiştin û revîyan, tu jî rabe lêbixe here mala xwe. Em têkilî te nabin."*

Qasim Beg hema radibe, li ser kervirê pêşîya kozika xwe rûdinê û dibêje; *"Lo welle ez naçim. Îro ji te û min, yekê bê kuştinê. De îja berê tu biavêje, bila dora te be. Paşê jî tu serê xwe ji min ra ji kozikê derbixe."*

Seyîdxan dibêje; *"De here loooo! Ez qet li te dixim... welle ez li te naxim, paşê xelkê bêje Qasim Beg bi tena serê xwe ma, Seyîdxan jî lê xist û ew kuşt. Rabe here mala xwe, ez têkilî te nabim."*

Qasim Beg jî mecbûr radibe diçe mala xwe.

Di şerê cîhanê yê yekemîn da artêşa Ûris ku wê hêlê zeft dike, Kop (Bilanix) jî dikeve destê Ûris. Wê çaxê li wê hêlê leşkerê Romê tunebûye. Kurdên wê deverê bi hêzên milîsan va şerê Ûris dikin. Seîdê Nado ji alîyê Qandilîsê, Dewrêşê Ûsivê Seydo jî ji alîyê başûr va êrişî Kopê dikin. Dewrêş, ji pismamên xwe nod û pênc sîyarî top dike, dikeve şer. Hêzên Seîdê Nado û Dewrêşê Ûsivê Seydo di Kopê da bi artêşa Ûris ra şerekî bêaman dikin û leşkerê Ûris ji Kopê derdixin, Kopê rizgar dikin. Piştî rizgarkirina Kopê alaya Mûsa Begê Xweytî û leşkerên artêşa Romê jî tên li alîyê Dêrikê dikevin şer. Piştî têkçûyina şerê Kopê artêşa Ûris leşkerekî pir gumrah dişîne Dêrikê, di şerê navbera Kopê û Dêrikê da, Seîdê Nado û milîsên Dewrêşê Ûsivê Seydo bi lehengî şer dikin. Di wî şerî da Seîdê Nado, Dewrêşê Ûsivê Seydo û du birayên wî şehîd dikevin. Seyîdxan di vî şerî da sax difilite. Milîsên Seyîdan peyra tevî alaya Evdilmecîd Begê Sipkî dibin. Hetanî şerê Çîyayê Qiliçgêdûgê şer dikin. Di şerê Qiliçgêdûgê da leşkerê Ûris dişkê û paş va wedikişe. Seyîdxan di van şeran da bi

lehengîya xwe va deng dide.

Paşê Resoyê Kopala li ser şerê Kopê û Dêrikê kilaman derdixe û di van kilaman da şahadeta Seîdê Nado tîne ziman. Şakiroyê Piçûk (Şakirê Kopê) wan kilaman pir xweş distirê.

Demekî piştî şerê cîhanê yê yekemîn di dawa mêrkuştinê da Seyîdxan tê girtin. Ew heta sala 1926an di girtîgeha Mûşê da dimîne. Şêx Seîd Efendî berya serhildanê jî wî ra jî namekî dişîne lê name nakeve destê wî. Piştî wexta hukûmat ji wê namê hayîdar dibe, lê zêde naçe ser Seyîdxan. Seyîdxan gava ku ji hepsê derdikeve diça Îranê cem Simko. Wî nîyeta dewletê ferq kirîye û ji bo çareserîyekî çûye Îranê. Simko bi rêz û hurmet ew ezimandîye. Wekî dîyarîyekê jî kumkê xwe jî dayê. Xwestîye ku Seyîdxan li cem wî bimîne lê Seyîdxan du meh pey ra vedigere tê. Berya wî Şêx Elî Riza Efendî (Kurê Şêx Seîd yê mezin), Xalid Begê Hesenî, Ferzendê Silêmanê Ehmed û hevalên wana jî çûne cem Simko û wî bi wan ra pir xirab muamele kirîye. Herhal Seyîdxan ji wê rewşê hayîdar bûye, loma li cem Simko nemaye.

Helbet hukûmat ji çûyina wî ya Îranê jî hayîdar dibe û ji bo ku tiştekî bîne serî wî li bahaneyekê digere. Li gor gotina nebîyê Seyîdxan Mistefa (Alçin) di sala 1927an da li wê hêlê yanzdeh leşker tên kuştin, Seyîdxan bi vê bahanê digirin û dibin gîrtîgeha Dîyarbekirê.

Dîsa li gor gotina Şêx Emînê Sîrongê li girtîgeha Dîyarbekirê yuzbaşîyekî pir zulmkar hebûye. Her roj tê li girtîyan îşkencê dike. Seyîdxan wî digre, diavêje erdê bi pehînan lê dixe, serê wî dihincirîne.

Ew kilama ku ji bo kuştina yuzbaşî û cendirman bi sitrana Sidîqoyê Qarlîovê weha ye;

## *AXAO AXAO**

*Axao axao axao*
*Min ji te ra nego awha neke*
*Bi gotin û galegale xelkê belekîya neke*
*Ew ji bav û kalê xwe da fesad in*
*Emê herin cem qaymeqamê kela Milazgirê*
*Bira li hal û ehwalê me mêzeke*
*Axao...*

*Axao axao axao*
*Dilê minî bi deman e*
*Bavê Silho sond xwarîye*
*Bi telaqê jinan e*
*Digo ezê îro li orta qereqolê bikûjim*
*Yuzbaşî tevî komê cendirma ne*
*Eva heft salê me qedîya*
*Emê li ser çolan û çîyan e*
*Ji destê papaxreşê cendirmane*
*Axao...*

*Min go axao...*
*Ezê di bextê te û xwedê da ketime*
*Îro tu nekûjî yuzbaşîyê Romê*

---

* Sidîqo ev kilama û ya li ser kuştina Seyidxan kiriye yek, wekî kilamekî distirê lê me ew ji hev qetandin.Tişte̊kî din jî Seyidxan li hêla Milazgirê deh - yanzdeh leşker kuştiye û ketiye hepsa Mûşê. Paşê ku ew şandine hepsa Diyarbekirê wî li wir jî efserek kuştiye. Min pirsî, kesî salix neda. Herhal wî li hêla Melazgirê bi wan cendirman ra jî yuzbaşiyek kuştiye.

*Welatê me Serhedê*
*Şeş meh dayim berf û baran û zivistan e*
*Tu bihêle hetanî biharê*
*Ji bo gilî û şikayetên me feqîr û fûqeran e*
*Axao...*

*Min go axao...*
*Min ji te ra nego*
*Ahwa nîn e ahwa neke*
*Bi gotin û galegale xelkê belekîya neke*
*Ew ji bav û kalê xwe da fesad in*
*Emê herin cem qeymeqamê kela Milazgirê*
*Bila li hal û ehwalê me mêzeke*
*Axao...*

Piştî wê bûyerê Seyîdxan dişînin girtîgeha Xarpêtê. Wê demê Cemîlê Çeto û serokeşîrê Bakiran Xelîlê Misto jî dişînin girtîgeha Xarpêtê. Demekî şûnda Xalid Begê Hesenî li alîyê Wartoyê digirin, wî jî tînin girtîgeha Xarpêtê. Hukûmet li wê derê deh sal ceza dide Seyîdxan û wî dişîne girtîgeha Bolu-Geredeyê.

Xalid Begê Hesenî, Cemîlê Çeto û Xelîlê Misto di sala 1929an da li Xarpêtê tên dardakirin. Wê wextê merivên Seyîdxan diçin bi Evdilmecîd Begê ra xeberdidin. Evdilmecîd Beg raporekî dinivîse, mor dike û ji hukûmetê ra dişîne. Evdilmecîd beg di raporê da dibêje; *"Ez şahadet dikim ku Seyîdxan û birayên wî bi min ra li pêşîya artêşa Ûris bi lehengî şer kirine û ji bo xilasîya welat fedakarî kirine. Di wan şeran da sê birayên Seyîdxan jî şehîd ketine. Lehengekî*

*mîna Seyîdxan divêt neyê cezakirin."*

Li ser vê rapora Evdilmecîd Begê Seyîdxan tê berdan.

Qîzikek birayê Seyixan yê mezin Dewrêş hebûye; Tîto. Nebîyê Seyîdxan Mistefa waha qala mesela Tîto kir:

"Tîto him keçeke mêranî him jî pir bedew bûye. Piştî şerê cîhanê yekemîn dewlet bi dostî bi malbata Ûsivê Seydo ra pêwendî girêdaye. Walîyê Mûşê di sala 1923, yan jî 1924an da gazî Tîto kirîye, birîye Mûşê. Ji bo lehengî û fedakarîya bavê wê bi merasim nîşanek dane wê. Walî bi xwe jî di wê civînê da xeberdanek kirîye û gotî ye:

*"Dewrêşê bavê te di rizgarkirina Kopê da waha lehengî kirîye, ji bo xilasîya welat waha şer kirîye, şehîd ketîye, em xizmeta wî tu car ji bîr nakin. Ji bo bîranînê, dewlet vê nîşanê (medalî) pêşkeşî te dike."*

Seyîdxan wê demê di girtîgehê da bûye. Paşê hukûmat di sala 1927an da Seyîdxan ku digre diavêje hepsê, Tîto jî ji bîr nake. Tîto û birayê wê Mistefa jî digirin diavêjin hepsê. Demekî şûnda Tîto û Mistefa ji girtîgehê direvin. Esker jî bi pêy wana dikeve, li serê Gola esker wana digrên. Destê Tîto û Mistefa li kelepçê dixin ku wan bibin, Fermandarê esker (yuzbaşî) ji Tîto ra dibêje, *"Ez dixwazim bi te ra bizewicim. Eger ku tu qebûl bikî ezê him te û him birayê te berdim, him jî hemû merivên malbata te bidim berdan."*

Tîto bi herdu destên xwe yên kelepçekirî ji erdê hîtekî hildide û li serê yuzbaşî dixe û wî dikûje. Esker jî li ser wê, Tîto û Mistefa gulebaran dikin û li wê derê wana dikûjin.

## ŞERÊ ÇEPÊ Û SERHILDANA ELÎCAN

Hetanî ku serhildana Kirrê Girîdaxê dom dike, hukûmat têkilî Elîcan nabe. Piştî têkçûyina Kirrê Girîdaxê êdî Elîcan zanîbûye ku hukûmat wê zû-dereng bi pêsîra wî bigirê. Ji ber wê yekê Elîcan êdî herdem di gundê xwe da namîne. Ew bi bîst merivên xwe yên bi çek û sîleh tevdîra xwe dike û herdem cîhê xwe diguherîne. Her carê diçe li gundekî şevê derbas dike. Salekî piştî komkûjîya Gelyê Zîlan hukûmat ji Hesenqelê alayek leşker radike û dişîne ser Elîcan. Wê şevê Elîcan û panzdeh merivên wî li Çepê bûne.

Kurê kurapê Elîcan Ferîdûn Qamiş di derheqa şerê Çepê û destpêka serhildanê da waha got:

- Piştî gilîyê Tofan alayak leşker di ser Çepê da digirê. Alayî ji sêsid û pêncî leşker pêk hatîye. Beşek pîyade yek jî sîyarî bûye. Apê mînê Elîcan bi tevdîr bûye. Texmîn kirîye ku yeqîn eskerê bê ser wî. Ji xwe wê salê daim cîh diguherandîye. Apê Elîcan wê şevê bi panzdeh-şanzdeh merivên xwe yên bi çek û sileh li Çepê bûne. Wê şevê bavê min Evdilezîzê Hido, apê minê Sulhedîn, apê minê Feyzula û Mihê Xelîfe çûne li Emeçûçikê mane. Serê sibê apê Elîcan ku radibe, bo destmêjê derdikeve ber derî dinihêre ku esker dor li gund girtîye. Vedigere xeberê dide hevalên xwe. Giş radihêlin silehên xwe û bi esker ra şer dikin. Şer demekî wusa dewam dike. Esker jî ji alîyekî çemberê li wan teng dike. Bi mitralyozan va gulan direşînin. Bomba diavêjin avahîyan, ji bo ku wana tevî xanîyan bişewitînin. Evana jî wê demê ji hundur da êrîşî esker dikin, çemberê diqelêşin û xwe diavêjin nav kela pêşîya gund. Dora kelê jî baxir e û xilxile ye. Li wê derê jî şer demekî dom dike. Demekî şûnda esker kelê jî hildide çemberê. Bavê min û

apê min jî ku li Emeçûçikê dengê silehan dibihîzin, dibêjin yeqîn esker di ser Elîcan da girtîye!

Ew jî hema li hespên xwe sîyar dibin û bi lez û bez diajon. Ew ku xwe digihînin Çepê, li pişt baxir hespên xwe girêdidin û ji paş va li esker direşînin. Ew ku ji paş va, ji rast û çep da direşînin, gelek esker û zabit tên kuştin û birîndar dibin. Esker bi vî karî dikeve nav panîkê. Dibêjin *"Gelîyê Berazan gişt hilşîyane ser me, birevin."*

Esker direve, li pey xwe cendekê diwazdeh esker û du başçawîşan dihêlin. Hîjdeh esker û zabît birîndar dibin, sîh esker, sê başçawîş û yuzbaşîyek dîl dikevin. Merivên me digirin silehên eskerên dîl jê distînin, cilên zabitan jê dikin, sîperên şewqên zabitan jê dikin, didin serê wan, zabitan bi tena kiras û derpê dikin û berdidin. Ji merivên me jî Sebrîyê Xuwarzî û Elîyê birayê wî birîndar dibin. Ew jî digirin wan hevalên xwe yê birîndar dibin li dûrî gund, di nav xilxilekî da vedişêrin û ji gund diqetin. Serhildana Elîcan bi wî karî dest pê dike.

Li gundê Beyro bi navê Mecîd merivek hebû. Min gelek caran ew dît. Me xeberda. Ewî herdem qal dikir. Li gundê wî başçawîşekî cendirma hebûye. Mecîd digot; *"Wî li xelkê pir heqaret dikir. Merivekî bi zirt û fort bû. Wexta ku ji Hesenqelê esker hat, çû ser Elîcan, di gundê me ra derbas bû. Ew başçawîş jî bi cendirmên qereqola xwe va tevî alayê bûn û çûn. Min jê ra got; "Çawîş, neçe. Zar û zêçê te hene..."* Çawîş got; *"Welle ezê herim, wî Elîcanê we bigirim, destê wî girêdim û bidim pêşîya xwe bînim."*

Piştî şerê Çepê esker ku vedigere dîsa di gundê wan ra derbas dibe. Li Çepê çi hatîye serê esker, helbet herkesî bihîstîye. Wî got;

*"Esker di gundê me ra derbas dibû û herkes sekinîbû li wan temaşe dikir. Eskerekî têkçûyî, şikestî!.. Fenanî birek pezê ku gur ketîye nav. Gelek birîndar hebûn di nav wan da. Hinek jê milên wan pêçayî, hinek jê serê wan!.. Cil û çekên hinekan jî bi xûn bûn. Ji zabitan jî beşek bi tena kiras û derpê bûn. Serê wan di ber wan da dimeşîyan. Ev çawişê me jî di nav wan da bû. Min deng li başçawîş kir. Veqetîya hat cem min. Min jê ra got;*

*"Çawîş, ev çi halê te ye. Ka te yê destê Elîcan girêda bida pêşîya xwe, bianîya?..."*

*Çawîş got; "Tu çi dibêjî?! Hemû gelîyê Berazan hilşîya ser me. Wexta me dor li Elîcan û merivên wî girt, ji nişka va ji her alî da gule li me barîyan. Ji paş û pêş da ji rast û çep da ji her alî da... heta ji ezmanan jî gule bi ser me da barîyan. Ew ne însan in, ji nesla cinan in cinan."*

Li gor gotina nebîyê Elîcan Evdilqadir (Ak) fermandarê wê alayê Delû Kemal bûye. Emê paşê qala wî bikin.

Hukûmatê bi bahana Kirrê Girîdaxê esker şandîye ser Elîcan. Gotîye: *"Me xeber hildaye ku tu yê herî tevî serhildana Kirrê Girîdaxê bibî. Tarîxa vê bûyerê Tîrmeha 1931ê ye. Tê zanîn ku serhildana Kirrê Girîdaxê salek-sal û nîvek berê xilas bûye."*

Wexta Elîcan serî hildaye sîh û pênc sîyarên wî hebûne. Ji wan sîyaran yên ku me tespîd kirin ev in: Elîcan, kurê wî Mihemed Reşîd, birayê wî Feyzula, Evdilhemîd û Evdilbaqî, kurapên wî Evdilezîz û Sulhedînê Hido û Mihê Xelîfe, Elîyê Feqî Silê, Seîdê Nemet, Mehmûdê Feqî Silê (birayê Elî), Evdillayê Qado, ji kutka Çaçê, Tahirê Hesen Paşê û kurê wî Şemso û ji alîyê Erzurumê Şewqî Beg û sê hevalên wî. Elîyê Gewrê û Fesihê Mihê Mîrze.

## EŞÎRETA HESENA Û FESIHÊ MIHÊ MÎRZE

Wexta ku Elîcan serî hildide, dibihîze ku Seyîdxan jî li alîyê Mûşê serî hildaye. Elîcan qirarê dide ku here deşta Mûşê û xwe bigihîne Seyîdxan. Ji bo vê yekê Elîcan berê xwe dide deşta Milazgirê. Wexta ku diçin di gundê Fesihê Mihê Mîrze Nazê ra derbas dibin, Fesîh jî tevlî wan dibe. Fesîh hetanî dawîyê di nav serhildanê da cîh girtîye û di wan şeran da bi mêrxasîya xwe va deng daye. Çil sal pey ra di salên 1975-76an da ewî serpêhatîya xwe jî nivîsandîye. Hukûmatê rewşa malbata wî (Şewêşî) û eşîreta wî (Hesenî) kirîye bahane û bi pêsîra wî girtîye. Ji ber wê yekê Fesîh tevî serhildanê bûye. Bi vê sedemê divê em qala eşîret û malbata wî jî bikin.

Eşîreta Hesena bi texmîn 250 - 300 sal berê ji welatê jêr, ji alîyê Şengalê hatîye, li deşta Mûşê, li alîyê Milazgirê, li gundên Kopê bi cîh bûye. Eşîret pênc beş in; Seyidî, Malbatî, Qereceyî, Şêxî û Tirokî. Torina Hesena jî çar bav in; Emerî, Eshedî, Şewêşî û Farizî. Wan çar bavên torinê, di vî 200 salên dawî da li Serhedê roleke mezin lîstine. Di hemû qewimandinê civakî û sîyasî da torina Hesenan xweyê roleke sereke ne. Her çar bavê torinê him gelek caran bi dewleta Osmanî ra şer kirine, him bi eşîretên din, him jî bi hev ra şer kirine. Ewil li ser Mexelên Dexda Emerîyan û Şewêşîyan bi hev ra şer kirine. Paşê di serê salên 1890î da Emerî, Eshedî û Farizî bûne yek ji bo Kejik çûne ser Şewêşîyan. Ew herdu cih jî milkê Şiwêşîyan bûne. Eshedê Xalid ku ji apê xwe Sofî Paşa dixeyide, diçe di Kejik da bi cîh dibe. Ji Şiwêşîyan Hesenê Ecem ji Eshed ra dibêje; *"Îlla tu yê mala xwe wekî ku te çawa*

*anîye tu yê wusa barkî û derkevî."*

Eshed dibêje; *"Bihêlin ez vê zivistanê li vir derbaskim, bi biharê ra ezê barkim û herim."*

Hesenê Ecem merivekî bîhnteng bûye. Daxwaza Eshed qebûl nake. Li ser wê birayê Eshed Fethulla û Riza tevî Eshedî û Farizîyan êrîşê tînin ser Kejik. Rizayê Xalid di serî da birîndar dibe, şer nake. Wanên din lê dixin Hesenê Ecem, birayê wî Huseyîn û kurê wî Hemzo dikûjin. Birayê Hesen Mîrze (Kalikê Fesîh) li cîhekî din bûye. Wexta ku xeberê didinê, ew jî diçe Kejik lê dixe ji Emerîyan Esed (Esedê Xalid), ji Farizîyan Metoyê Fariz, ji Eshedîyan jî du kurê Mistefayê Cindî dikûje. Şerê wana bi wî karî xilas dibe. Li gor gotina Mihemedê Qancîyan ji Berazan jî hinek kes çûne Kejik Şerê wana temaşe kirine. Şer gava ku kês û vês dibe, yekî Berazî ji para va gulleki berî Mîrze dide û wî dikûje.

Şerê Kejik di esasê xwe da şerê birakûjîyê ye. Çimkî wanê ku hevûdu kuştine di bavê duduyan yan jî di bavê sisîyan da digihêjin hev. Li ser wê bûyera trajîk, jina Esed (Esedê Xêlid) Gulê kilama Dêran derxistîye. Gulê dengbêjeke serdest bûye. Lê meriv tê derdixe ku di kilamê da mêldarîya Emerîyan û Esedîyan heye. Dîsa jî meriv dikare bibêje vê kilamê ew trajedîya baş anîye ziman.

Tiştekî din jî em dizanin ku bi navê Gulê qîzeke Esedê Xêlid jî hebûye. Bi texmîna min du jinên Esed hebûne û wî navê dêmarîya wê li keça xwe kirîye. Li ser Gula Esed jî dengbêjan kilamek derxistîye.

Bi sitrana Şakiro (Şakirê Bedîh) kilama Dêran weha ye:

## *DÊRAN*

*De werî Dêran werî Dêran werî Dêran hey wayê*
*Gulê Dêranê Kejikî wêran bişewite li zinêr e ha hey wayê*
*Ava Corawanî wêran Hesenava Delûelo*
*bi dozdeh tişa ser da şax veda ye*
*Îro ji êvar da himî xar e himî mêl e hey wayê*
*Min dî sê sîyar sîyar bûne ji Milazgira tew ra dijêrîne*
*Sîyarê paşîn Esedê Xêlîd e,*
*sîyarê pêş yê selefî sîyara Fetulla ye*
*Sîyarê li dawîyê dajo, çûyin çûyina Gêjo ye*
*Şêl û pêla têlî reşkal Riza ye*
*Sewta wî sewta kewî nêr e hey wayê*
*Hemzoyê Hesen bi sê denga bang dikirî*
*Digo Rizakê ez bi qurban çima tu nizanî*
*Kejik ji berê da mexelê pezê me yê nêr e hey wayê*
*Riza bi sê denga li Esed û Fetulla kire gazî*
*Go em ku îro ji ber koma Şewêşîyan bikişin*
*Mistefayê Cindî li Hesen Paşa Esedîye neyar e*
*Emê sibê li Milazgira jêrîn çi bidin*
*cewaba apê xwe yê reşkal Mistefa ye*
*Gera em erqa Şewêşîya biqelînin*
*Bûkên serbixêlî di ser malê bava da vegerînin*
*Herkes bila bi destê qîzê xwe bigire*
*Bibe ji xwe ra bide mêr e hey wayê*

*De Dêran Dêran Dêran Dêran*
*Ezê bi Dêrana Riza û Fetulla û Esed*
*Her sê sîyarê mala bavê xwe bi tenê me*
*Hêêêê hîîî, bê ho yo yooo....*

*Lê lê Gulê rebenê Kejikî wêran bişewite*
*Serejêr e ha serejêr e hey wayê*
*Ava Corovanî wêran, Girecin û Delîelo*
*Bi dozdeh tîşa di ber da şax vedaye*
*Min dî sê sîyar sîyar bûne*
*Ji Milazgira jêrîn têne fenanî ba ye hey wayê*
*Sîyarê pêşîn Esedê Xêlid e,*
*sîyarê selefî sîyaran Fetulla ye*
*Sîyarê li dawîyê diajo, çûyin çûyina Gêjo ye*
*Şêl û pêla têlî reşkal Riza ye reben ez im...*
*Ebakî li nava mila ye*
*Hustîyê ebê bi çar tilîyan kilda ye*
*Hemzoyê Hesen bi sê denga bang dikirî*
*Digo Rizakê ez qurban çima tu nizanî*
*Kejik ji berê da mexelê pezê bav û kala ye*
*Riza bi sê denga ba dikirî Esed û Fetulla ye*
*Digo em îro ku bikişin ji ber koma Şiwêşîya ye*
*Mistefayê Cindî li Hesen Paşayê Esedî ye neyar e*
*Emê sibê li Milazgira jêrîn*
*Çi bidin cewaba apê xwe yê reşkal Mistefa ye*
*Gera em erqa Şewêşîyan biqelînin*

*Bûkên ser bi xêlî bi ser malî bavan da vegerînîn*
*Herkes bila bi destê qîzên xwe bigire*
*Bibe ji xwe ra bide mêra ye hey wayê*
*Herê Gulê rebenê*
*Bila li me nehata surra sibê bîhna bayê Kejik*
*Bakî dîne hey wayê*
*Bila li bejna Esed û Fetulla û Riza*
*Hersê egîtê mala bavê min nexîne reben ez im...*
*Min dî sê sîyar sîyar bûne ji Milazgira tewra jêrîn e*
*Sîyarê pêşîn Eshedê Xêlid e, sîyarê selefî sîyara Fetulla ye*
*Sîyarê li paşîyê diajo, çûyin çûyina Gêjo ye*
*Şêl û pêla têlî reşkal Riza ye*
*Gêjo kefê derdixe, di hewadê xwe da direşîne*
*Tu bala xwe bidê kosteka seetê zêr û zîv e*
*Di ser qaşa zînê xwe da dihejîne hey wayê*
*Hemzoyê Hesen bi sê denga li koma Şiwêşîya kir qêrîn e*
*Go emê Fetulla û Riza bikûjin*
*Esedê Xêlid dîl bigirin*
*Bila ji dayê ra şewata sêlê bîne hey wayê*
*Bûka malê serê xwe bilind kir ji xewa şêrîn e*
*Go metê marûmê eyb e*
*Meriv di mala xwe da xeyba mêrê camêr nake*
*Egîtê mala bavê min bi dil-cîgerê xwe guvanîn*
*Ew peyayê ku ji dayê ra şewata sêlê bînin*
*Ji wan zilaman nînin hey wayê*

*Metê marûmê peyayê mala bavê min gulîbirê*
*Ew mêrê ku li meydanê berdî şêra*
*Xwe bidî dîyaran lê bikî guhdarî û sêra...*
*Tu bala xwe bidê*
*Herçî hespê ku ji meydanê têne nava mala*
*Ez ji te ra sond bixum zînî vala*
*Zenguyê wanî bi xwîn e hey wayê*
*Peyayê mala bavê min gulîkurê*
*Xêncî xulama kuştine peyayê bi nav û nîşan*
*Hesen û Husên, Elî û Mihemed*
*Hemzo zavayê teze dîl girtine*
*Daxistine Milazgira hera jerîne reben ez im*
*Dengbêjê sibê bikin kilam û meqam*
*Di civatê mîran û hakiman da rûnên*
*Êvara da ji xwe ra li hevdû vegerînin hey wayê*

*De Dêran Dêran Dêran Dêran*
*Ezê bi Dêrana Riza, Fetulla û Esed*
*Hersê sîyarên mala bavê xwe bi tenê me*
*Hêêêê hîîî, bê ho yo yooo...*
*Werî Dêran Dêran Dêran hey wayê*
*Gulê marûmê, sibe ye dilê min gulîkura xwedê*
*Donzdeh rêya heft newala hey wayê*
*Ezê bi destê hersê egîtê mala bavê xwe bigirim*
*Di ser ra derbaskim fenanî karê karxezala reben ez im*
*Bala xwe bidê metê marûmê*

*Egîtê mala bavê min navê xwe qeyd kirine*
*li dosyê hukûmatê*
*Derbas kirin nav duwela*
*Vê sibekê hela tu bala xwe bidê*
*Herçi hespên ku ji meydanê têne nava mala*
*Ez ji te ra sond bixum*
*Zengû bi xwîn e zînî vala hey wayê*
*Ax Dêran Dêran Dêran Dêran*

*Hedo digo Gulê rebenê tu rabe*
*Emê serê xwe kurkin*
*Bi heft guzana û duwazdeh kêran*
*Mala Emer û mala Şewêş li Kejikî wêran*
*Li hev anîne qirra şêra û mêra*
*Hewû bê ho yo yoooo...*

Şerê cîhanê yê yekemîn û mihacirîyê taximên axawatê jî perîşan kirîye û feqîr xistîye. Piştî şer, li wê hêlê tenê hal û wextê du kesan xweş bûye; Xalid Begê Hesenî û bavê Fesîh Mihê Mîrze. Erazîyên Mihê pir bûye, ew bi xwe jî merivekî bi tevdîr û xebatkar bûye. Berîya ku here mihacirîyê Mihê tîne genimên zevîyê xwe di cîhê cuda cuda da çal dike. Çil pêncî çal tijî dibin. Paşê ku ji mihacirîyê vedigerin tên, Mihê genimê xwe ji çalan derdixe û difiroşe. Pê pir dewlemend dibe. Ew komekê dide pismam û merivên xwe û ji der û dorên xwe ra yarmetîyê dike. Beşeke eşîretê mêla xwe dide ser wî, di nav gel da herkes qala Mihê û dewlemendîya wî dike. Ew taximên dinê pir diqehirin. Dibêjin; *"Kûzek zêrê*

*Mihê hene, jina wî Besra di nava zêr da digevize, du kemberên wê yên zêr hene. Hewqas zêr li serê wê, hewqas jî di hustuyê wê da ne. Nizanin çi û çi..."*

Paşê ew taximên din merivan top dikin, diçin bi Mihê ra şer dikin. Di şerê Mêrgekulavê da gellek kes tên kûştin.

Demekî pey ra jî Emerîyan Zubeyîr û Mihê li hev dixin û hevdû dikûjin. Fesih sêwî dimine. Wê demê Fesîh heft-heşt salî bû ye.

Piştî kûştina Mihê ku Besra bî dimîne, Ferzendeyê Silêmanê Ehmed bi Besrayê re dizevice. Paşê Ferzende tevî serhildana Şêx Said dibe û derbasî Îranê dibe û Besrayê jî bi xwe re dibe. Du salan piştî serhildanê, Ferzende wekî ku me li jor jî qal kir, beşdarî serhildana Kirrê Girîdaxê dibe. Li gor gotinê Besra jî bi Ferzende ra diçe Kirr, piştî têkçûyîna serhildanê jî ew herdu dîsa derbasî Îranê dibin, Ecem li Îranê wî diavêjin hepsê, lê îşkencê dikin, du sal sê sal Pey ra jî di hepsê da wefad dike.

Di dawîya Tîrmeha 1931ê da cendirme diçin Fesîh digrên. destên wî girêdidin û wî dibin Milazgirê. Di qereqola Milazgirê da wî diavêjin feleqê û îşkencê lê dikin. Di serpêhatîya xwe da Fesîh dibêje;

- Li Milazgirê yuzbaşîyekî zalimî bêînsaf hebû. Qe-dera însanên wê hêlê di destên wî da bûn. Li gorî dilxwestika xwe li xelkê îşkence dikir. Bê pirs, bê sual cendirma ez avêtim feleqê. Min zarî û fîgan dikir. Min digot hûn çima li min dixin? Sûc û gunehê min çi ye? Bersiva wan tenê îşkence bû. Dawîyê da gotin; "*Lê Ferzende li Kirrê Girîdaxê ye. Dîya te jî li cem wî ye. Me xeber hilda ye ku tu jî herî û bigihêjî wana!"*

Min got; *"Dunya alem dizane ku malbata min û ya Ferzende dujminê hev in. Ezê çawa herim cem dujminê xwe?... Hey hewar! Hey medet!"*

Bersiva wan tenê lêdan bû. Hetanî nîvê şevê li min îşkence kirin. Ez ji ser hişê xwe çûm. Wexta ku min çavê xwe vekirin, min nihêrî di qulika nezaretxanê da tîrêja rojê daye ser min. Ji dev û pozê min xwîn herikîye, li erdê gol girtîye. Îşlikê min qelişîbû û ez di xwînê da mewijî bûm. Ez rabûm ser pîyan, min di qulika nezaretxanê da li derva mêze kir. Min nihêrî dostên malbata me tahsîldar Ehmed Efendî derbas dibe. Min di qulikê da gazî kir û got;

*"Ehmed Efendî! Vana ez kuştim. Di bextê te dame, min xilaske!"*

Camêr ku hate ber qulikê min jê ra got hal û mersele waha waha ye. Camêr pir ber min ket. Çû bi yuzbaşî ra xeberda, bû kefîl, ez hildam birim mala xwe. Lingên min tîş tîşî bûbûn. Ez nekarîbûm bimeşîyam. Ehmed Efendî çû ji sûkê du kîlo kezeba dewaran kirî, anî kişande lingên min û birînên min derman kirin. Ez pênc rojan di mala Ehmed Efendî, di nav nivînan da mam. Lingên min ku pir hindik hinekî silamet bûn, Ehmed Efendî ji min ra got;

*"Kurê min, lêxe bireve here, ev zalimana yeqîn wê te bikûjin!"*

Min got :

*"Ka ezê çawa herim? De tu ji min ra bûyî kefîl, paşê wê bi pêsîra te bigirin."*

Ehmed Efendî got;

*"Kurê min, evana her roj bi hezaran merivan dikûjin. Gişt bê serî û berate diçin. Kesek newêre suwal jî bike. Lêxe*

*here xwe xilas ke wê te bikûjin. Ji bo min jî tu xem neke. Qet nikarin tiştekî bi min bikin. Ma min senet daye wana?"*

Piştî nîvê şevê ez bi dizî ji Milazgirê derketim û min da ser rê. Bi serê sibehê ra min xwe gîhande perê gund. Ez li wê derê rûniştim û ketim nava fikaran. Ev çi bela bû hatibû serê min. Minê ji vir û şûnva çi bikira. Rêyeke çawa ji xwe ra bidîta. Qedera min a reş ez hildabûm nava tarîyeke bêdawî. Bi van fikaran ez di xew ra çûbûm. Bi repe tepa lingên hespên sîyaran va ez hişyar bûm. Roj hatibû dema taştîyan. Ew sîyarên Elîcan bûn. Sîh û pênc sîyar, gişt bi çek û silehên têkûz bûn. Berbi gundê me diçûn. Ji min ra baş lê hatibû. Min ew rasthatin wekî xilasîya xwe dît. Min ji Elîcan ra got;

*"Apo, ezê jî tevî we bibim!"*

Elîcan got;

*"Ma em bi daxwazîya xwe va awha bi serê çîya û banîyan ketine, me ji ber zulmê, zar û zêçên xwe hiştine. Derdê te çi ye kurê min?"*

Min jê ra got;

*"Welle halê min jî mîna yê we ye."*

Min serpêhatîya xwe jê ra got.

Elîcan jî ji min ra got;

*"Ez çi bikim kurê min. Belkî xwedê vê zulmê qebûl neke!"*

*"Bi wan ra silehên zêde hebûn. Tifingek û hespek dane min, ez jî bi wan ra çûm."*

Fesîh di 31ê Tirmeha 1931ê da tevlî sîyarên Elîcan bûye û wê çaxê jî panzdeh salî bûye.

## MILÎSÊN SÎPKA

Piştî şerê Çepê alaya Nedayî Begê, ya Dewrêş Begê û ya Xûlusî Begê ji alîyê Ercîş û Qerekilîsê tê, dikeve Gelîyê Beraza. Ew alayên sîyarîyê di dema serhildana Kirrê Girîdaxê da hatine damezirandin û di komkûjîyên li wan deveran da gelek karên xirab kirine. Komkûjîya Gelyê Zîla bi destê wan alayan hatîye kirin. Wê demê ji eşîretên wan deran hukûmatê milîs şandine ser şervanên Kurdan. Wexta ku kurê Kor Husên Paşa Nadir Beg û birayê wî Memo ji Sûrîyê hatine di sala 1929 û 30î da li alîyê Patnos û Ercîşê şer berfireh kirine, milîsên axawata sîpka jî alîkarîya hêzên dewletê kirine. Berîya wî jî wana bi şervanên Girîdaðê ra şerkirine. Pey ra di komkûjîya Gelyê Zîla da jî rola xwe lîstine. Sidîqê Hecî Mistefa Begê Mahmud Beg û Musa Begê milîsê xwe li dora xwe civandine, pişta xwe kutane dewletê, axatîya xwe xurt kirine û li ser gel hukmê xwe saz kirine. Piştî şerê Çepê wexta ku hêzên dewletê di pêşengîya Dewrêş Begê da hatine Gelyê Beraza, Sidîqê Hecî Mistefa Begê û Mehmûd Beg jî jê ra bûne rehber. Hêzên Dewrêş Begê agir berî gundan dane, şewitandine. Hespreş û Çepê jî ji binî va şewitandine. Ji hevalên Elîcan du kes birîndar bûne (Sebrîyê Xwarzî û birayê wî Elî). Wana ew li nêzîkî Çepê di nav baxir da veşartine. Bi lêpirsîna milîsan va Dewrêş Begê cîhê wan herdu birîndaran tespît kirîye û serê wan bi saxî jêkirine.

Paşê li Cemalverdî ew û şervanên Seyîdan û Berazan rastî hevûdu tên. Emê paşê qala Cemalverdî bikin.

Di nav gel da hê tê gotin. Dibêjin Dewrêş Beg ji bo komkûjîyê hatîye gelîyê Berazan. Hukûmatê berê qerar daye ku eynî mîna Gelyê Zîla Gelîyê Berazan jî bibire, lê paşê qerara xwe guherandîye.

## SERHILDANA SEYÎDXAN

Seyîdxan heftekî-deh rojan pey Elîcan serîhildaye. Li gor gotinan kesên alîyê Qereyazîyê Elîcan çendekî piştî şerê Çepê serhildana Seyîdxan, xeber hildaye. Li gor gotina Fesîh* jî Elîcan li alîyê Milazgirê jê hayîdar bûye. Wexta Elîcan û birayên wî ketine girtîgeha Mûşê, Seyîdxan jî di wê hepsê da bûye. Elîcan û Seyîdxan di hepsê da hevnas dibin û bi hev ra dibin dost. Fesîh di derheqa serhildana Seyîdxan û hevdîtina Elîcan da weha dibêje;

- Roja ku ez tevî sîyarê Elîcan bûm, em çûne gundê Dignûgê. Ji wir jî çûne gundê Nordînê. Li wir me bihîst ku Seyîdxan jî firar kirîye. Elîcan em li dora xwe civandin û got; *"Ez Seyîdxan baş nas dikim. Werin em herin çîyayê Seyîdan, wî bibînin!"*

Em ketin rê û me berê xwe da çîyayê Seyîdan. Li ser rêya me nehîya Lîzê hebû. Tê da cendirme hebûn. Ji ber vê yekê me rêya xwe guherand. Em di serfêza wê ra derbas bûn. Lê dîsa jî mudurê nehîyê cendirme hildan, bi pêy me ketin. Cerdevan jî bi wan ra hatin ser me. Me demekî avête hev, cendirmak hate kuştin, mudur û cendirmên din gişt revîn. Me fermandarê cendirma û cendirmekî din dîl girtin. Elîcan ji Çawîş ra got; *"Me rêya xwe ji ser we dagerandibû hûn çima hatin ser me?"*

Çawîş got; *"Min nexwest ku werim pêşîya we lê mudur û cerdevanan em hildan anîn. Sûcê min tune ye!"*

Elîcan ew azad kirin. Me jî da ser rê û em meşîyan. Roja

---

* Fesîh Kaya, "Benîm Hayat Hîkayem", Daqtîlo.

duduyan me li çîyayê Seyîdan xwe gîhande gundê Heftmexelan. Ew gundê kurapê Seyîdxan Silêmanê Elî bû. *Roja din li çîyayê Seyîdan me Seyîdxan û merivên wî dîtin û bi wî karî em gîhîştin hev. Li cem Seyîdxan panzdeh kes hebûn. Yê ku tên bîra min; birayê Seyîdxan Tewfîq, kurapê wî Silêmanê Elî, birazîyê wî Mistefa, Xalid, Evdilbaqî, Seîd û çend kesên din hebûn."*

Li gor gotina nebîyê Seyîdxan Hecî Sulhedîn, yên din jî Qeremêşê zabitê ortê, ji mala Bûbê Şêx Baran û Xelîlê Malo bûne.

Fesîh gotina xwe weha didomîne:

Paşê kurapê Seyîdxan Silêmanê Hîl jî hat, tevî me bû. Ewî got; *"Ji ber ku ez kurapê Seyîdxan im, wê min jî bikûjin, loma ez hatim."*

Hukûmatê wê çaxê ji pismamên Seyîdxan çend kes biribûn û kuştibûn.

Ji pismamên Seyîdxan yên din kes nehatîbû, gişt di cîhê xwe de mabûn. Me ji Seyîdxan pirsî *"Derdê te çibû ku tu derketî çîyê?"*

Seyîdxan waha got; *"Hun jî dizanin em Seyîdan du ber in. Û belkî ev sed sal e ku em ji hev mêran dikûjin. Em bi vî karî bûne dujminê hevê xwînî. Bera me Elyazî ye,ya din jî Elîkan in. Mezinê Elîkan Cûma ye, pir dewlemend e. Ewî çûye li Mûşê Avukat Ehmedê Ano dîtîye, pere danê û li Enqerê gilîyê min kirîye. Gotîye Ferzendê Silêmanê Ehmed ji Kirrê Gilîdaxê hatîye mala Seyîdxan. Wî Ferzende kirîye mêvan û bûye hevkarê wî. Ez bi muqeddesata sond duxum ku ew ne rast e. Ferzende par bi heft sîyarên xwe va hatibû çîyayê gundê me, li çîyê birçî mabûn. Ji min ra xeber*

*şandibûn ku ji wan ra nan bişînim. Min Ferzende nedît û min ji wan ra nan jî neşand. Ji bo tiştên nebûyî aweha bi pêsîra min girtin."*

Di destên merivên Seyîdxan da tenê sê-çar sileh hebûn. Ew jî silehin kevn bûn. Ji şerê cîhanê yê yekemîn da mabûn. Bi sîyarên Elîcan ra silehên zêde hebûn. Ew dane wana. Bi wî teherî merivên Seyîdxan jî bûne xwedîyê silahên baş.

Du rojan piştî hevdîtina me em ketin Gelîyê Evdilbaharê. Me berbe deşta Mûşê rê qedand. Di rê da em rastî mifrezekî cendirmeyan hatin. Wexta ku cendirman em dîtin gişt revîyan, lê fermandarê wana Yûsif Çawîş dî cihê xwe da ma û gulle avêtin me. Birayê Elîcan Evdilhemîd deng lê kir got;

*"Çawîş! Were teslîm be, tu pêka me naynî. Tu dê bêyî kuştin!"*

Çawîş guh neda wî, dîsa gule avêtin. Evdilhemîd jî avêtê. Gulla ewil jê negirt, li çakêtê wî ketibû, bi gulla duduyan ra çawîş wergerîya erdê.

Em ji wir careke din paş da vegerîyan û çûne gundê Seyîdxan. Seyîdxan meriv û pismamên xwe topkirin û bi wan ra xeberda. Ji wan ra got; *"Hun waye dibînin ku hukûmat di rojekê da bi hezaran merivan dikûje. Miheqeq wê rojekê we giştan bikûje. Werin tevî me bibin, xwe xilas bikin."*

Wana ji Seyîdxan ra got; *"Tu tiştekî me tevî te tune ye. Em hemwelatîyên hukûmatê ne. Tu sûc û gunehên me jî tune ne. Hukûmat wê çima me bikûje? Em nayên!"*

Seyixan got; *"De min ji we ra got. Êdî hûn çawa dikin, hûn dizanin. Li gor bawerîya min hunê paşê poşman bibin. Gunehê we li situyê we!.."*

## ŞERÊ MELEXIDIRA
## Û WÊRANKIRINA GUNDÊN SEYÎDXAN

Fesîh ji bo wê bûyerê awha dinivîse:

- Em ji gundê Seyîdxan veqetîyan berbi deşta Kopê (Bilanixê) çûn. Pey ra em çûne Melexidira. Li wir bi navê Mehmûdê Rûkar merivek hebû. Mûxbirî dikir. Em çûn, me ew anî. Seyîdxan pê ra xeberda û got;

*"Me bihîstîye ku tu bûyî mûxbir û bi xelkê ra xirabîyê dikî. Tu jî ferdekî ji vî milletî yî. Vî karê xwe biterikîne, ez niha ji te ra dibêjim eger tu bi vî qaydeyî herî tu yê paşê poşman bibî!"*

Me ew meriv berda çû. Wextê nîvro bû, me firavîna xwe xwar. Nobedarê me ji derva gazî me kirin. Gotin esker dora gund girt.

Esker du mufreze bûn. Yek ji Mûşê, ya din jî ji Erzurumê hatibûn ser me. Gund di nav du çîyan da bû. Yek li alîyê qulbê yê din jî li alîyê rojhilat bû. Mufreza Mûşê çîyayê qilbê dorpêç kiribû, ya Erzurumê jî çîyayê rojhilat. Mufreza Mûşê bi qasî hezar û pêncsîd metrî durî me bû, lê ya Erzurumê nêzîk bû. Wana bi mîtralyozan gulle reşandin me. Wê demê hemû hevalên me hema hespên xwe ji hundur derxistin, qilî ser pişta hespa kirin û êrîş birin ser mufreza Erzurumê. Gava xwe gîhandin ber çîyê ji hespên xwe peya bûn û reşandin sêr esker. Li milê me jî xêncî min Evdîlhemîd, Seyîdxan, birayê wî Tewfîq, Mistefa û çar-pênc kesên din hebûn. Me jî ji alîyê xwe va êrîş kir. Esker şikest û revî. Di wê arê da ez jî ji ser milê xwe yê çepê da birîndar bûm. Esker ku têk çû û bi piranîya xwe revî, beşek jê dîl ket û beşek jî jê hate kuştin û

birîndar bûn.

Piştî şer em ji wê derê bi rê ketin çûn nehîya Tîllê (Korqut). Li wir me xeber hilda ku hêzên hukûmatê avêtine ser gundên Seyîdan, heft gund ji binî va şewitandine. Ji meriv û pismamên Seyîdxan çil û neh kes kuştine. Bi wê xeberê Seyîdxan pir xemgîn bû û demekê rûnişt û girîya. Pey ra got *"Ez çi bikim, min ji wan ra got, wana bi gotina min nekir."*

## LI SER ŞERÊ MELEXIDIRAN GOTINÊN QÎYASEDDÎN EMRE

Qîyasedîn Emre ji gundê deşta Mûşê Resûla ye. Gundê wan û gundê Seyîdxan nêzîkî hev bûne. Yanî ew û Seyîdxan cînarê hev bûne. Dema serhildana Beraza û Seyîdan da ew hefdeh-heştdeh salî bûye. Şêx Qîyasedîn di navbera 1954-1960î da parlamenterê Mûşê bûye û niha nod û heft salî ye. Berya şerê Melexidira Elîcan û Seyîdxan çûne gundê wan, pey ra çûne Melexidiran. Şêx Qîyasedîn di hevpeyvîna me da weha got;

- Gundê me û gundê Seyîdxan pir nêzîk bûn. Seyîdxan jî dostê bavê min bû. Daîma dihate mala me, bi bavê min ra xeberdida, bi minra jî xeberdida û ji min hez dikir.

Me serhildana Seyîdxan bihîstibû. Hayê me ji Elîcan tunebû. Lê me serhildana wî bihîstibû. Di wan rojan da carekê em di oda me da rûniştibûn. Cînar jî hatibûn. Cînarekî me di pencerê da mêze kir û got;

*"Wa ye birek sîyar ji alîyê Kanîcotkê da tên."* Dûrbînek me hebû. Apê min Şêx Qudbeddîn dûrbîn da ber çavên xwe

û li alîyê deştê mêze kir û got; *"Belê wa ye birek sîyarên bi sileh ji wê va tên. Herhal ew esker in."*

*Min got; "Apo Heger ku esker be, wê ji alîyê çîyê va bên. Ew ne esker in."*

Apê min carek din bi dûrbînê nihêrî, Pey ra got; *"Belê birek sîyarên bi sileh in, lê cilên eskerîyê ne li wan in."*

Demekî şûnda ew sîyarana hatin, li ber mizgefta Resûlan peyabûn. Rûsipîyan gotin; *"Ev Elîcan e."*

Apê min çû cem wan, xoşamadîyek (xêrhatin) da wana. Ji Elîcan ra gotin *"Ev Şêx Qudbeddîn e."*

Elîcan ji apê min ra got; *"Şêx, Seyîdxan ê ber êvarê were vira. Daxwaza me ev e, em tu tiştekî bê pere nastînin, gundî bila îro tenê nanê patî bidin me, wekî din çi lazim bin emê bi perê xwe bistînin."*

Bizineke me ya stewr û xurt hebû. Apê min şand ew bizin da anî û da wana û got; *"Ez ji we pere-mere nastînim. Eva ji we ra bê pere, êdî wekî din hûn ji gundîyan çi dikirin hûn dizanin!"*

Pey ra wana ji gundîyan çar bizin jî bi perê xwe sitandin, birin li ber mizgeftê serjêkirin.

Esra teng bû, me nihêrî waye Seyîdxan jî tevî sîyarên xwe we va hat. Li ber mizgeftê êzing pir bûn. Wana agir dada û ji xwe ra goşt biraşt. Wextê eşayê me nimêj kir. Elîcan, Seyîdxan û hinek hevalên wan li oda me rûniştin, bi apê min ra sohpet kirin. Demekî şûnda Elîcan deng li apê min kir û got;

*"Şêxê min, du mufreze di taqîbata me da ne. Ew mufrezeya ku li pey me ye aniha li Lîzê ye, ya ku li pey Seyîdxan jî tê, li Elûzerkê ye. (Elûzerk hema li tenişta Qicixê ye. Qicix jî ji gundê me lezekî dikişîne.) Sibê ew dê bên we*

*aciz bikin. Tu rabe du merivan bişîne cem wan, bila ji femandarê wan ra bibêjin firar hatine gundê me, wana bi darê zorê heywanên me, perê me, eşyayên me ji me sitandin. Bila wusa bêjin ku ew we paşê aciz nekin!"*

Apê min got; *"Ez çawa merivan dişînim xwedê ji te razî be!... Navbera me û Elûzerkê lezekê dikişîne an nakişîne. Îja ewê werin û gundê minê bibe meydana herbê..."*

Elîcan got; *"Bi navê xwedê, bi navê xwedê ew vê şevê nayên Şêxê min... Tu qet xem neke. Tu rabe merivên xwe bişîne, ew nayên!"*

Apê min rabû, gazî Suloyê Sînco kir, yek jî Evdilbaqî hebû, ev herdu şandin Elûzerkê. Ew merivin serwext bûn. Diçin Elûzerkê, qumandar dibînin, dibêjin hal û mesele waha waha ye. *"Firar hatine gundê me, bi darê zorê pezê me sitandin, serjêkirin. Perê me, eşyayên me jî ji me sitandin. Filan bêvan..."*

Qumandar dipirse; *"Gundê we ji vira çiqasî dikişîne?"*

Ew dibêjin; *"Seetekê dikişîne an nakişîne."*

Qumandar digre wana diavêje feleqê, wan dikute û dibêje;

*"Hun rast nabêjin. Rast bibêjin çiqasî dikişîne?"*

Di nav wan da başçawîşekî Kurmanc hebûye, bi Kurmancî dibêje;

*"Kuro zêde bêjin zêde!"*

Ew dibêjin; *"Çar-pênc seetan dikişîne."* Qumandar careke din li wan dixe. Ew jî Dibêjin; *"Deh-panzdeh seetan dikişîne!"*

Qumandar dibêje;

*"Hah! Weha rastîyê bibêjin ha! Hûn mexlûqên wusanin*

*ne, heta ku kotekan nexwin rastîyê nabêjin!"*

Qumandar wana wê şevê li wêderê dide sekinandin. Nahêle ku vegerin. Lê bi xwe jî, ji cîhê xwe naleqe.

Sibetirê sîyarên Elîcan û Seyîdxan rabûn, taştîya xwe xwarin, li hespên xwe sîyarbûn û çûne Çaqsorê. Ew ku çûn di newalê da winda bûn, demekê şûnda alaya esker jî, ji alîyê din da derket hat. Qumandar li hespê xwe sîyar e, li pêşîyê bi tire-tir û zire-zir tê. Deng li şênî kir, *"Nereye gîttîler? Nereye kaçtilar? Bîz şîmdî onlara gosterîrîz... sîz nîye ekmek verdînîz?"*

Şûdir-budir nizanim çi... ez dibêm qey navê wî Xurşîd bû. Gundîyan gotin: *"De me xeber da we, me çi dikarîbû bikira? Mêrikên fîrar in."*

Qomandar got; *"Neyse fark etmez, ben onlarin îcabina bakarim!"*

Paşê ketin rîya Çaqsorê, çûn ser Melexidira. Alaya din jî ji Lîzê, di alîyê din ra diçin ser Melexidiran. Herdu alayî bi wî teherî tên Melexidiran dorpêç dikin.

Li Melexidira Reşîdê Weşê hebû. Birayê Elîcan Feyzulla mêvanê wî bûye wê demê. Êdî ji vir û şûnda ezê wê bûyerê ji devê wî neqil bikim. Ewî ji min ra çawa gotibû ezê wusa bibêjim. Reşîdê Weşê ji min ra weha got;

- Dema nîvro bû. Me sifre danîbû ku em firavîna xwe bixwin.Dema kû Feyzulla kevçîyê xwe bir lengerîya bul-gur. nobedarê wî ji banê xanî da hate xar, got; *"Beg, esker dora gund girt!"*

Feyzula qîrîya û got; *"Zû hespê min bînin!"*

Me hesp anî. Wî qîlî ser pişta hespê kir û berbe Sêgira ajot. Ji mala me wê da ber bi Sêgira kevir û zinarên wusa asê

henin, xwedê rayî kesî nede. Feyzula di wî hevzazî da di nav wan kevir û zinaran da mînanî bobelîskekî wusa ajot û çû. Esker jî bi tifing û mitralyozan mînanî teyroka biharê gule direşandê. Wî malmîratî mînanî teyrê baz ajot ser esker û bi bayê bezê ra reşande wan. Ji alîyê jêrîn da jî Tewfîq reqînî jê anî û êrîşî esker kir. Wana mînanî efrîtan erîş kir û gule reşandin, laşê çend zabitan totî ser erdî kirin, panîk kete nava esker. Peyayên Seyîdxan û Elîcan hetanî mecbûr nebûyana li neferan nedixistin. Esker jî ev dizanîbû. Hema ku nefer hindikekî diketin tengasîyê dest bi revê dikirin. Di demeke kurt da esker şikest û revîya. Min hew dît ku fermandarê alayê hespê xwe daye ber qarmeçîyan û di serfêza Feyzula da direve. Feyzula bi bayê bezê ra avêtê, qumandar û hespê wî serobinî hevûdu bûn û ketin erdê. Di nava toz û dûmanê da man. Min bala xwe dayê, fermandar ji nav toz û dûmanê derket û revî. Hesp li erdê ma. Gule li hespê ketibû. Qumandar revî, çû xwe avête Bostankendê. Ew herdu alayî mîna elokên ji teyran direvin, bela-bela bûn. Her yek di alîkî da revîyan. Çar başçawîş, du yuzbaşî û çend heb jî nefer hatibûn kuştin. Beşek sûbay û esker jî dîl ketibûn.

Ji vir şûnda jî ez ji devê Qutoyê Bostankendê neqil dikim. Qumandar direve, diçe Bostankendê, xwe diavêje mala Quto.

Quto ji min ra weha got;

- Qumandar revî, hat xwe avête mala min. Çimkî berê jî hati-bû mala min. Firaran jî dabûn pêy ku wî bigirên. Qumandar ji min ra got; *"Eman Quto axa, ez ketime ber bextê te, min xilaske!"*

Quto dibêje; *"Ka ez dê te çawa xilas bikim, welle qelax heye. Hezdikî te bikim qelaxê?"*

Qumandar got; *"Min xilaske, tu min dikî kûderê bikê."*

Di hundirê qelaxê da hinek valahî hebû, min ew kire wir. Min bi çend sergînan va jî devê qelaxê xitimand. Demekê şûnda firar hatin nav gund. Çend esker hebûn, ew girtin birin. Vir da wê da pirsa qumandar kirin, me got em nizanin. Demek şûnda lêxistin û çûn. Piştî çûyina firaran ez çûm, min qumandar ji qelaxê derxist. Pir tirsîyabû. Reng-meng lê nemabû. Paşê min nihêrî ku binê xwe jî pîs kirîye. Min pir şerm kir, ez xecil bûm. Wî dît ku ez xecil bûme, dest pê kir kenîya û weha got;

*"Xemgîn nebe Quto Axa, eva şuxulê elbek av e, tiştek nîn e... Me ruhê xwe xilas kir, eva muhîm nîn e."*

# ŞERÊ WARTAXÊ Û KUŞTINA ELÎCAN

Piştî şerê Melexidira ew ji wir bi rê dikevin, diçin Tîlê (Korkût). Fesîh di derheqê şerê Wartaxê û kuştina Elîcan da weha dibêje;

- Em li nehîya Tîlê bûn. Piştî xebera kuştina Pismamên Seyîdxan, ji eşîreta Bidirîyan Çûkan Axa bi merivekî xwe va hat, gîhîşte me. Ew bi xwe jî firarê berê bû. Seyîdxan demekî bi wî ra xeberda û pey ra weha got; *"Wa ye hûn dibînin xêra gel tune ye. Hukûmat bi vî teherî wê gel bi tomarî qir bike û wê welatê me ji binî va bişewitîne."*

Pey ra vegerîya ser Çûkan Axa û got; *"Emê îşev herin gundê Wartaxê, hûn jî herin çîyayê Sasonê. Bi gel ra xeberde, ji wan ra vê rewşê îzah bike. Mêze bike ka çi dibêjin. Eger ku bi ya min bikin, emê biavêjin ser Mûşê. Li Mûşê zêde esker tune ye. Emê Mûşê zeft bikin. Ji depoyên dewletê çek û silehan hildin û herin çîyayê Sasonê. Wê demê rewşa me yê baş bibe. Êdî emê bikaribin bi hêsanî ber xwe bidin."*

Pey ra Çûkan Axa dide ser rê û diçe. Ew jî ji Tîle bi rê dikevin diçin Wartaxê. Êdî çawa dewlet jê hayîdar dibe nayê zanîn, ji Bitlîsê alayek esker bi rê dixe û dişîne hewarîya Mûşê.

Fesîh Beg di derheqê vê qewimandinê da weha dibêje;

-Em ku çûne wî gundî, hukûmat di fermandarîya albayekî da sed neferî li qemyonan dike û dişîne hewarîya Mûşê. Alay ku bi rê dikeve, tê binya gundê Medenîyê Hecî Mûsa Begê, Medenî tevî merivên xwe diçine pêşîya alayê. Medenî ji albayî ra dibêje; *"Hun bi kû da diçin?"*

Albay dibêje; *"Me xeber hildaye ku Seyîdxan û şervanên*

*wî dê êrişî Mûşê bikin. Em diçin hewarîya Mûşê."*

Medenî dibêje; *"Hun qet neçin Mûşê, Seyîdxan û hevalên wî aha wa ye li wî gundê hanê ne. Baş lê hat, em erdê van deran baş dizanin. Ez tevî milîsên xwe bi we ra werim, em tev herin dora gund bigirin û hemûya di gund da bikûjin."*

Alay û milîsên medenî tên, dora gund digirin. Hayê me ji wê rewşê tunebû. Medenî casûsê hukûmatê yê di herêmê da bi qîmet û rûmet bû. Wî Medenî di sala 1928an da li Iraqê serê Husên Paşayê Heyderî û du kurên wî bi qelaşî jêdike, dibe dide mufettîşê umûmî yê Wanê. Hukûmat jî wekî muhafat afûya wî derdixe*.

Gund li cîhekî asê bû. Sê alîyên wî çîya bûn. Tenê ji alîyê bakur da li deştê dinihêrî. Derîyên hemû malên gund li Girê Zîyaretê mêze dikir. Esker û milîsan dora gund ji her alî da pêçabû. Silehên otomatîk li cîhên bilind bi cîh kiribûn. Li me gule direşandin. Tu kes ji me nekarîbû ji cîhê xwe bilipite. Ew mala ku Feyzulla û Tewfîq têda bûn, ew ji yalê başûr da hildabûn nav xwe. Ew mal li rojhilata gund bû û di ber da ava Çemê Reş diherikî. Lê derîyê malê li mêşe mêze dikir. Feyzulla, Tewfîq û hevalên din ji wê rewşê îstifade dikin. Gûrûba me jî tenê ji bo xweparastinê di perê derîyan û penceran da gule diavêtin esker. Desteya Feyzulla û Tewfîq yazdeh kes bûn. Ew bi hêz ji xênî derdikevin xwe berî nav mêşe didin û ji milê çepê da êrişî esker dikin. Wê hêlê ji esker distînin. Paşê êrişî eskerên alîyê din dikin û wana didine ber gulan. Me hew dît ku esker direve. Hayê me ji wan tunebû, hevalekî me deng li me kir û got;

*"Olo! Ewên ku ji malikê derdiketin, ew esker nebûn."* Wê

* Fesîh Begê herhal baş bi bîr neaniye. Medenî ne li Iraqê li Îranê serê Husên Paşa, kurê wî û neviyê wî jêkiribûye.

demê me ferq kir ku esker têk çûye.

Me jî ji firsendê îstifade kir û ji alîyê xwe da erişî esker kir. Esker bûbûn du şeqa. Şeqek di nava mêşe ra berbe gundê Zirkitê direvî, şeqa din jî di alîyê Deştê da direvî.

Zabitek hatibû kuştin, bîst nefer jî teslîm bibûn. Albay jî tevî deh neferan revîya çû, xwe avête gundê Sêgira. Em bi pey albay ketin, çûn Sêgira. Gundîyan albay veşartibûn. Em lê gerîyan, me albay nedît. Paşê me ew deh nefer dîl girtin û em vegerîyan. Ji me jî gulle li hevalê me Tahir ketibû. Paşê me silahên wî zabitî û wan neferên dîlketî ji wan sitand û ew serbest berdan. Wexta ku em ji Sêgira ve-gerîyan hatin, li ser rê di nava mêşe da me dengê gullan bihîstin. Me hew dît ku çar nefer di nava mêşe da direvin. Hevalên me ku bi nîşan avêtinê, ew her çar nefer jî hatine kuştin. Em çûn ser esker-an, dema ku me silehên wan hildane destê xwe me hew dît ku yek ji wan silehan ya Elîcan e. Wê demê em pê hisîyan ku wana Elîcan kuştîye.

Êdî êvar bû. Em di nav daran da li cinazê Elîcan gerîyan. Me ancax di dema eşayê da cenazê wî dît. Elîcan bi tek gullekî va hatibû kuştin. Gule ji para va li nav milê wî ketibû û di sîngê wî ra derketibû. Birayên wî li ser cinazê wî demekê girîyan, em pir xemgîn bûn. Nêzîkî nîvê şevê me di navbera Wartax û Dêrxas (Haskoy) da mezelê wî kola û me ew li wê derê defin kir. Me ew tevî cilên wî kire qebrê. Me qapûtê wî avêt ser wî û me wusa ax avête ser.

Piştî definkirina Elîcan em ketin rê û me berê xwe da çîyayê Girîdaxê. Roja din bi serê sibehê ra alayek esker tê wê hêlê li cenazê Elîcan digere. Cenazê Tahir dibînin lê yê Elîcan nabînin. Fermandar ji gundîyan dipirse, gundî dibêjin;

*"Belê, em pê hesîyan Elîcan hatîye kuştin, lê em cîhê*

*mezelê wî nizanin. Bira û merivên wî ew bi şev defin kirine, me nedît."*

Yekî dujminê eşîreta Bidrîyan çûye, fesadî kirîye ji fermandar ra gotîye; *"Ji eşîreta Bidrîyan, ji heft gundan meriv hatine, heft qat kefen li Elîcan kirine û ew defin kirine."*

Fermandar fortan li gundîyan dike dibêje; *"Hun ku cîhê merzelê Elîcan nîşan didin bidin, heger ku hûn nîşan nedin ez dê we giştika gulebaran bikim!"*

Rûsipîyekî gund ji fermandar ra dibêje; *"Begê min, em cîhê Elîcan nizanin. Merivên wî ew li van deran cîhekî defin kirine. Em gişt bi hevra lê bigerin emê bibînin. Heger pirsa wî muxbirî rast derkeve qetla me giştika li te helal be, êdî tu bi me çi dikî bike."*

Giştika bi hevûdu ra li merzelê Elîcan digerin. merzelê wî di newalekî da dibînin, gundî ancax pêsîra xwe ji destê qumandar xilas dikin.

Li gor gotina merivên malbata Elîcan piştî wan şerên ewilî birayên Elîcan pê ra xeberdidin jê ra dibêjin; "Ji vir û şûnva êdî tu nekevî şeran. Wexta ku şer derdikevin tu di cîhê xwe da bimînî, tekilî tiştekî nebî.

Elîcan ewilî qebûl nake. Dibêje; *"Ma ez ji we ne çêtir im, gava ku hûn hatin kuştin bila ez jî bêm kuştin! Kuştin û mayîn bi ketina û neketina şeran va ne girêdayî ye, di qedera merivan da çi hebe wê ew bibe."*

Merivên wî dibêjin; *"Na!... Tunebûna te û ya me ne yek e. Gava ku tu bêyî kuştin emê bêserî bimînin."*

Elîcan jî li Vartaxê wê daxwaza wan qebûl dike û nakeve şer. Gava ku ew bi esker ra şer dikin, berdidin esker, dû ra ku ew pey eskerê firar dikevin Elîcan jî ji cîhê xwe radibe, tifin-

ga xwe diavêje milê xwe û hêdî hêdî bi tena serê xwe li pey hevalên xwe diçe.

Wexta ku esker dibe du şaxan û direve çar nefer xwe nagihînin hevalên xwe, li paş dimînin û hema li wê derê xwe di nava mêşe da vedişêrin. Demekê şûnda lê dinihêrin ku firarek bi tena serê xwe di ber wan ra derbas dibe, diçe. Yek ji wan gullekî berî wî dide û dikûje. Diçin ser meytê wî, tifinga wî hildidin û carek din xwe di nava mêşe da vedişêrin. Wana nizanibûne ku ew Elîcan e.

Gelek caran milîs jî bi esker ra diçin ser şervanên Seyîdan û Berazan û bi wan ra şer dikin. Ji wan jî meriv têne kuştin, birîndar dibin û dîl dikevin. Lê ew ji milîsên dîlketî ra dengê xwe nakin û mînanî eskerên dîlketî çek û silehên wan ji wan distînin û serbest berdidin.

Li gor salixên salixdaran di şerê Wartaxê da Medenîyê Hecî Mûsa Begê jî tevî çend milîsên wî dîl dikevin. Medenî û milîsên wî dema ku diçin ser şervanên Seyîdxan û Elîcan cilên neferan (unîforma) li xwe dikin û bi wan ra şer dikin. Piştî têkçûyinê û reva esker şervan silehên eskerên dîlketî jê distînin û wana didine alîkî. Demekî şûnda hew dibînin ku ji nav wan eskeran yekî totî-dirêj hema qilî ser pişta hepsê kir, ajot û revî. Li gor gotina nebîyê Seyîdxan Mistefa, Seyîdxan dibêje; *"Kuro yeqîn ew Medenî ye. Bi pey kevin wî bigirin."*

Bi pey dikevin lê ew xilas dibe.

Seyîdxan dibêje; *"Ew nefer nebû. Çimkî nefer dizanin ku em têkilî wana nabin û nefer culhed jî nakin ku birevin. Bejn û bala wî jî dişihibî Medenî. Ew tirsîya û loma wusa cesaret kir û revîya."*

Paşê pê dihîsin kû ew Medenî bûye.

## KUŞTINA HUSÊN PAŞA Û MEDENÎ

Ezê li vira bi kurtayî qala kuştina Husên Paşa û Medenî bikim. Piştî serhildana Şêx Seîd Efendî dewlet Husên Paşa surgûnî Qeyserîyê dike. Salekî yan jî sal û nîvekê piştî surgûnê ew û Hecî Mûsa Begê Xuweytî digihîjin hev, tevî merivên xwe firar dikin û derbasî Sûrîyê dibin. Li wir bi maqûlên Kurdan ra pêwendî çêdikin û dest bi çalakîyên sîyasî dikin û paşê dikevin nava Xoybûnê. Li gor salixan herdu dibin hîmdarê Xoybûnê. Wê demê Mûsa Beg nexweş dikeve û li Sûrîyê wefat dike. Piştî wefata Mûsa Begê, Husên Paşa kurê wî yê Edo (Evdula), kurekî xuşka wî Zero Xatûnê, birayê Mûsa Begê Nuh Beg û Kurê Mûsa Begê Medenî gişt bi hevûdu ra derbasî Kurdistana Iraqê dibin. Diçine cem Şêx Ehmed Berzanî. Kurê Mûsa Begê Izzed Beg jî zavayê Husên Paşa bûye. Piştî demekî Husên Paşa qirara xwe dide ku di ser Îranê ra derbas bibe, here Kirrê Girîdaxê, tevî serhildanê bibe. Nuh Beg jî ji Husên Paşa ra dibêje;

*"Bila birazîyê min Medenî jî bi te ra bê."*

Husên Paşa dibêje; *"Ku dixwaze bila bê."*

Husên Paşa, kurê wî Edo, xwarzîyê wî Ehmedê Zero Xatûnê , Medenî û du merivên Medenî di Hezîrana 1929an da bi rê dikevin, derbasî Îranê dibin.

Birayê Şêx Ehmed Şêx Mihemed Sidîq wana li cîpekî sîyar dike û derbasî Îranê dike.

Ew ku tên nêzîkî sînorê Tûrkîyê, li ber çemekî disekinin. Husên Paşa destmêj digre, nimêj dike. Kurê wî û xwarzîyê wî jî cilên xwe ji xwe dikin, dikevin avê. Medenî li ser nimêjê

gulekî berî Husên Paşa dide û wî dikûje. Pey ra jî wanên di nav avê da dikûje. Serê wan hersêkan jêdike, dike tûrekî, derbasî Tûrkîyê dibe û diçe cem umûm mufetîşê Wanê. Ew ku serê Husên Paşa, yên kurê wî û xwarzîyê wî teslîmî mufetîş dike, dewlet bi vê xizmeta wî pir dilxweş dibe û wekî mukafat efûya wî derdixe.

Şêx Ehmed ku kuştina Husên Paşa dibihîze birayê xwe Şêx Mihemed Sidîq dişîne Îranê. Meselê dide pirskirin. Piştî lêpirsînê tê zanîn ku Husên Paşa bi pîlana Nuh Begê hatîye kuştin. Şêx Ehmed jî Nuh Begê îdam dike.

Dengbêjan li ser kuştina Husên Paşa kilamek derxistine. Ev kilam di salên 1960an da di radyoya Erîwanê da dihate gotin. Qasî ku di bîra min da maye Reşîtê Baso ew kilama digot.

***WERE WÎ LO LO***

*Were wî lo lo wî lo lo wî lo lo*

*Were wî lo lo wî lo lo wî lo lo*

*Lo lo bavo, li me vê germê lo germistanê*

*Hey lo keko, li me vê germê lo germistanê*

*Heyla ça berxeybetî gulekî berî bedena bavê Edo dane*

*Li Girê Xebxebê li tuxûbê vê Îranê*

*Her çi gava li ser bavê Edo dibû xelaya mêra*

*Bila hewarîyê biçûna xortên eşîrê Kurdistanê*

*Were nemînim nemînim nemînim*
*Nemînim maqûlo li dinyayê*

*Heyla bavê Edo sîyarê bozekî yekta ye*
*Heyla keko bavê Edo sîyarê bozekî yekta ye*
*Boz di bin bavê Edo da diçe mîna ba ye*
*gelek şane şûn3e Bavê edo hene*
*Ewî hîmê olkê Romê xirab kirîye*
*Ji bo namûs û qîreta Kurda ye*

*Were nemînim nemînim nemînim*
*Nemînim maqûlo li dinyayê*

Paşê di sala 1961î da nebîyê Îsmaîlê Sultan Begê Mihemed bi tena serê xwe tebanca xwe hildide, diçe Mûşê. Medenî di nav Mûşê da dikûje û heyfa Husên Paşa hildide. Sultan Beg birayê Husên Paşa yê mezin bûye. Nebîyê Husên Paşa Kemalê Nadir Begê (Subhandağ) di pirtûka xwe ya bi navê "*Ağri Îsyaninda Haydaranlar*" da qala kuştina Medenî dike.

## BEŞEK PISMAMÊN MEDENÎ LI WARTAXÊ BI ELÎCAN Û SEYÎDXAN RA BÛNE

Ji gundê Modka Korswakê Emerê Perê û Emînê Mistefa, tevî çend pismamên xwe berya şerê Wartaxê xwe digihînin Elîcan û Seyîdxan. Çîroka firarîya Emerê Perê gelek balkêş e. Emer ji qebîla Parsingîyan e. Persingîyan şaxeke eşîreta Xuwêtîyan e. Yanî ew û Medenî pismamên hev in. Eşîreta Xuwêtîyan çar qebîle ne; Pasingî, Tapî, Şêgo û Bidirî. Qebîleyên Şêgoyan û Tapîyan li alîyê dewletê bûne, lê Persingan û Bidirîyan jî li dijî dewletê bûne. Sedem serhildana Modka ye. Berya Elîcan û Seyîdxan li alîyê Modka serhildanek bûye. Piştî wê serhildanê hêzên dewletê li wan deveran gelek kes kuştine.

Kurê Emerê Perê Fîrar Alabay mesela firarîya bavê xwe ji min ra weha neqil kir;

- Piştî serhildana Modka hêzên dewletê li wê hêlê tiştên nebûyî û nebihîstî dikin. Davêjin ser gundan, hemû xanî avayîyan tevî terş û heywanên wan dişewitînin. Kî ku bi destên wana dikevin, dikûjin û diçin. Ji her gundekî deh, bîst, sîh merivî top dikin, dibin û wana dikûjin. Rojekî esker êrîşê tînin ser gundê me jî. Hîjdeh kesî hildidin dibin, di navbera gundê me û gundê kêleka me da wana gullebaran dikin. Ji wana huvdeh kes têne kuştin. Yek (Tahirê Ûsiv) di bin cenazê wan da sax dimîne. Esker dikevin nava cenazan bi pozê potînan va li laşê wan dixin, dinihêrin ku di nav wan da çiqa kesek sax maye an nemaye. Eskerek bi pozê potîna xwe va li serê Tahir jî dixe. Çend diranên wî dişkên, lê ew xwe li mirîtîyê diavêje. Xwe nalibitîne. Piştî ku esker ji wê derê

diçe, Tahir jî hema ji cîhê xwe radibe, berbe gund dibeze. Ji serî hetanî pîyan ew di xûna kuştîyan da dimîne. Tahir dibe mînanî rewilekî sorî gewez. Bi xwe jî merivekî totî dirêjî bilind bûye. Ew bi wî halê xwe va dibe mîna gordîganekî.

Du qîzên Tahir yên piçûk li perê gund li ber berxan bûne. Tahir ku tê tanga qîzên xwe zarok jê ditirsin, berbe mala xwe direvin. Tahir li pey wan gazî dike û dibêje; *"Lawo netirsin!.. Ez bavê we meee! Ez bavê we meee!.."*

Herdu keçik direvin, xwe diavêjin malê. Dêya wan derdikeve dibêje; *"Çi bû lawo? Çibû?"*

Keçik ji dîya xwe ra Dibêjin; *"Yekî sorî mor bi pey me ketîye, dibêje ez bavê we me."*

Jinik meseleyê fahm dike, diçe dinihêre ku mêrê wê Tahir e.

Piştî wê komkûjîyê bavê min diçe, bi pismamê xwe ra xeberdide û dibêje; *"Waye hûn dibînin hêzên dewletê we, me giştika qir dikin. Werin em herin tevî Elîcan û Seyîdxan bibin."*

Bavê min diçe ji Şênê bi Mecîdê Îso ra jî xeberdide. Mecîd ji bavê min ra dibêje *"Welle heyran ez li pişta hukûmatê me. Tu here pişta Elîcan û Seyîdxan, em dê di dawîyê da bibînin ka kî ji me qezenc dike! Em dê bibînin!"*

Paşê Mecîdê Îso muxbirîyê dike û bi gelek kesan ra xirabîyê dike. Carekê jî diçe muxbirîya Emerê Silo (hevalê bavê min) dike, wî dide kuştin.

Çend pismamên me daxwaza bavê min qebûl dikin. Ji xêncî Emînê Mistefa, ji pismamên me Mihemedê Farê, Çetoyê Ristem û Emerê Silo bi bavê min ra firar dikin û diçin

digihijin Elîcan û Seyîdxan. Tevlêbûna wan hemûyan berya şerê Wartaxê bûye. Li Wartaxê pismamê me hebûne. Ew bi wê sêdemê çûne wira. Bavê min got; *"Wexta esker girt ser me, ez li cem Seyîdxan bûm. Seyîdxan ruyê xwe kur dikir.* `

Di wî şerî da ku Elîcan tê kuştin, bavê min û hevalên wî ji wan diqetin û diçin li çîyê di nava mêşe da erdê dikolin, ji xwe ra cîh çêdikin û wê zivistanê bi wî teherî li wir diborînin. Paşê bi biharê ra ji wir derdikevin, diçin xwe digihînin Seyîdxan. Ew wê havînê bi şervanên Berazan û Seyîdan ra diçin li alîyê Qerayazîyê, Bilanixê û Milazgirê jî çend caran şer dikin. Dawîyê da Seyîdxan qirarê dide ku here Sûrîyê, bavê min û Merdanê Lorê wekî rêber bi wan ra diçin hetanî hêla Mêrdînê. Çimkî bavê min û Merdanê Lorê bi wan deran beled bûne. Seyîdxan ku tê kuştin, bavê min û Merdan vedigerin têne Hewranê gundê Şerîfê Xursê. Ew çar salan li cem Şerîf dimînin. Paşê tên girtin. Wê çaxê ji mezinê eşîreta me çend kes diçin bi Medenî ra xeberdidin. Fortan li Medenî dikin û dibêjin; *"Dewlet ku wana dardake emê hesabê wê bi te ra bibînin."*

Medenî bavê min ji îdamê xilas dike. Lê ew heft salan di hepsê da dimîne. Piştî hepsê jî bavê min dibe *"ûsad"*. Wan kesên ku dewlet wan ji bo xwe talûke dibîne û dayîm wana di bin çavan da dihêle, ji wan ra tê gotin; ûsad. Merivên ûsad her tim ji çendekî carê diçin qereqolê îmze didin. Bavê min dema ku wê biçûya cîhekî baş tê bîra min, berê diçû qereqolê îmze dida û paşê bi rêya xwe da diçû. Ew îmzedayina wî heta sala 1960î dom kir.

Li ser kuştina Elîcan du kilam hene. Bi sitrana Mihêmedê Canşa kilama ewil waha ye;

## *WERE LI MIN WAYÊ*

*Were li mi wayê, li mi wayê, li mi wayê, li mi wayê*
*Mi dî Xecê bi sê denga dikire gazî*
*Go lêlê Muhbetê, Seltenetê, Keserê, Seherê*
*Rebenê Cemîlê xwengê, Zelêxa daye*
*Navê bavê mi derketye ji qeydê*
*Zerfa bavê mi ji kunyayê*
*Lawo bavê mi çû*
*Hayfa bavê mi hilnayê*
*Ezê pey bavê xwe nemama li dinyayê*
*Xudê agah û besile*
*Mêrekî mîna bavê mi tunebû*
*Hetanî qal û belayê...*

*Were li mi wayê, li mi wayê*
*Li mi wayê, li mi wayê*

*De sibe ye, mi di Xecê bi sê denga dikire gazî*
*Go lêlê Muhbetê rebenê da dayê*
*Şerekê li me çêbû li çîyayê Mûşa şewitî*
*Li Melexidiranê, li Bostankendê li hembere*
*Mêzeke ji siba xwedê da*
*Teqîbata pey Bavê Sulêman hezar û pênsid esker e*
*Hezarê wî la-dîne, pênsidê wî qecer e*
*Kesekê xwedanê xêra tune*
*Cabekî bide Kirrê Girîdaxê*
*Evdilbaqî sîyarê Eşqer e*

*Bira bibêje mala te mirat be, nesekine*
*Di wextê da di hewarya me tu were*
*Seyîdxan şer dike li milê rastê*
*Mînanî şerê Hezretî Omer e*
*Feyzula bawê Îpegê, kekê Çîçegê*
*Mînanî Betalê Gazî*
*Eba Muslîm kişya ser e*
*De lêxin bavê mino lêxin*
*Bira erqa mala Bişar û Seydo*
*Bi carê li min were*
*Dengê tekbir û selewatê berxê mala Bişar*
*Xwe dane Erşê Ekber e*
*Bi xwedê va agah û besîl e*
*Eva ji bo dînê pexember e*

*Were li mi wayê li wayê*
*Li mi wayê li mi wayê*

*De sibe ye Xecê bi sê denga dikire gazî*
*Digo lêlê Muhbetê rebenê de dayê*
*Şerekê li me çêbû li çîyayê Mûşa şewitî*
*Li Melexidiranê li Bostankendê li berî Bata*
*Mêzeke ji siba xwedê da*
*Li pey bavê Sulêman hezar û pênsid erker e*
*Xêncî mudur û teqîbata*
*Kesekê xwedanê xêra tune*
*Cabekê bide Kirrê Girîdaxê*
*Evdilbaqî birayê piçûk Gula Xorta*

*Bibêje bira di wextê da*
*Di hewarî û gaziga me bihata*
*Mêzeke ji siba xwedê da*
*Li kêleka rastê tê dengê Çareka*
*Na welle xelkê Bota*
*De lêxin bavê bavê mino de lêxin*
*Ji siba xwedê da tê dengê berxê mala Bişar*
*Na welle dengê dînpolata*

*Were li mi wayê li wayê*
*Li mi wayê li min wayê*

*De sibe ye Xecê bi sê denga dikire gazî*
*Go Muhbetê rebenê da dayê*
*Şerekê li me çêbû li çîyayê Mûşa şewitî*
*Li Melexidiranê, li Bostankendê*
*Ji kula dilê mi ra extirme da*
*Mêzeke ji siba xwedê da*
*Tomatîk ketine rê têne ji yalê Mûşê da*
*Reben ez im ji siba xwedê da, gawirên ladîna*
*Devê tomatîka û sîstema li kozika bavê mi girêda*
*Heyfa mi nayê bi kuştina şêran û mêra*
*Heyfa mi tê bi wê heyfê*
*Cînazê bê serî, bê xweyî*
*Li wê rastê ma ye bin berfê da*

*Were li mi wayê li wayê*
*Li mi wayê li mi wayê*

*Xecê bi sê denga dikire gazî*
*Digo lêlê Muhbetê, Seherê, Seltenetê, Keserê*
*Rebenê Cemîle xwengê, Zelêxa dayê*
*Navê bavê mi derket ji qeyda*
*Zerfa bavê mi ji kunyayê*
*De lawo bavê mi çû*
*Heyfa bavê mi hilnayê*
*Ezê li pey bavê xwe nemînim li dinyayê*
*Bi xwedê va agah û besîle*
*Mêrekî mîna bavê mi tunebû*
*Ji îro hetanî qal û belayê...*

Di vê kilamê da hinek xalên balkêş henin.

Dengbêj şerê şervanên Berazan û Seyîdan dişihîbîne Şerê Eba Muslîm, Betal Gazî û Hezretî Omer. Tekbîr û selawatên *"dîn polata"* tîne ziman.

Piştî damezirandina Komara Tûrkîyê, desthilatdarên dewletê ku hebûna Kurdan înkar kirine û li Kurdan zûlmeke bê sînor kirine, Kurdan bi çavê kesên *"bê dîn, bê xwedê"* li wana mêze kirine. Yanê ew musluman qebûl nekirine, loma jargoneke wusa derketîye holê. Di zimanê Kurdan da peyvika *"Contirk"* jî bi wê manê tê bikaranîn. Wexta ku Kurd Dibêjin; *"Contirk"* qesta nijadperestî, bêxudêtî û zulmê dikin. Çimkî berya erka îttîhatçîyan û damezirandina komarê, desthilatdarên dewletê yên musluman ne hebûna muslumanûn din înkar kirine, ne jî bi mêjûyên nîjadperestîyê va li musulmanên din wusa zordestî kirine.

Kilama din bi sitrana Şakîroyê Kopê waha ye;

## *WAYÊ WAYÊ WAYÊ*

*Didarê dikire gazî*
*Digo lêlê Têllo-Besê lawo*
*Heft xwazila mi bi sala di ewilî*
*Sîyarê Beraza û Seyida sîyarbûn ji Gaza Mêrdînê*
*Bavê Sulhedîn selefê sîyara*
*Dabû pêşyê mînanî sîyarê dewetê dixemilî*
*Wê çaxê çerxa mala Bişar û mala Seydo*
*Lawo ji yalê xwedê da rast diziviri*
*Kesek tune xeberekî bîne welatê Serhedê*
*Na welle bide Qereyazyê, li Mûşa şewitî pozê Anzûtê*
*Bêje mala we şewityo*
*Derbekî berî bedena bavê Mihemed Reşîd**
*sîyarê kulik dane*
*Wê çaxê mi dizanibû çerqa mala Bişar û mala Seydo*
*Ji yalê xwedê da çep zivirî*

*Wayê wayê wayê wayê*
*De wayê wayê wayê wayê*
*De wayê wayê wayê wayê*
*De wayê wayê wayê fanî dunyayê...*

*Didarê dikire gazî*
*Digo lê lê Têllo-Besê lawo*

* Bavê Mihemed Reşît, Elîcan e.

*Dilê mi rebena xwedê ji bona peyayê mala bavê mi*
*Bi kul e, bi keder e, bi derde lawo bi birîn e*
*Mi bala xwe dayê Nedayî Beg rûniştîye li Mûşê*
*Têlê li ser têlê ji Mistefa Kemal Paşa ra dişîne*
*Dibê mala te şewityo derbekî berî Bavê Mihemed Reşîd*
*sîyarê Kulik dane*
*Mizgînya mi ji te ra êdî kesek tune*
*Keleka mala Bişar-mala Seydo li dunyayê bigerîne*
*Mistefa Kemal rûniştîye li Enqera şewitî*
*Têlê li ser têlê ji Nedayî Begê ra dişîne*
*Dibê mala te şewityo*
*Heyfa mi bi kuştina bavê Mihemed Reşîd sîyarê Kulik nîn*
*e*
*Heyfa mi tê li wê heyfê*
*Heta Seyîdxanê Usivê Seydo bavê Sulhedîn*
*Evdilhemîd şêrê hustû bi gulî berxê mala Hecî Axa*
*Ew xweşmêran heta li dunyayê sax bigerin*
*De yeqînya te ji xwedê be*
*Hizûra dewleta cumhûryetê ji destê wan tu nîn e*

*De wayê wayê wayê wayê*
*De wayê wayê wayê wayê*
*De wayê wayê wayê wayê*
*Ax de wayê wayê wayê wayê*

Piştî kuştina Elîcan şervanên Seyîdan û Berazan diçin deverên cuda cuda. Di nav wan û esker da çend caran şer derdikeve lê ew hetanî payîzê xwe diparêzin. Tiştek bi kesî nabe. Payîzê hinek hevalên wan ji wan diqetin diçin cîhên nepenî yên dûr. Kurapê Elîcan Sulhedînê Hido wê çaxê birîndar bûye. Birayê wî Evdilezîz wî hildide, dibe Şûşara Tekmanê, cem dostekî xwe. Evdilezîz birayê xwe li wir dihêle, bi xwe jî diçe, derbasî alîyê Qaqizmanê dibe. Berya serhildanê Evdilezîz di medresê da xwendîbûye, bi wê zanîna xwe ew diçe li gundekî Qaqizmanê dibe mele, wê zivistanê li wir derbas dike. Paşê di serê bihara 1932yan da diçe ji Şûşarê birayê xwe hildide, diçin digihijin hevalên xwe.

Li gor gotina Fesihê Mihê Mîrze di dawîya havîna 1931ê da birayên Elîcan Evdilhemîd, Feyzula, Evdilbaqî, kurê Elîcan Mihemed Reşîd û merivên wanên din tevî Fesîh diçine alîyê Batmanê nav eşîreta Xîyan. Ew wê zivistanê li cem serokê eşîra Xîyan Emerê Mihê derbas dikin. Fesîh qal nake lê li gor gotina Şêx Emînê Sîrongê Seyîdxan, birayê wî Tewfîq, kurê wî Sulhaddîn û merivên wî yên din jî wê zivistanê di nav eşîreta Xîyan da derbas dikin. .

Di bihara 1932yan da firarên Seyîdan û Berazan tên digihêjin hev, diçin alîyê Xinûsê. Di pey ra jî derbasî alîyê Qerayazîyê dibin. Dewlet gava ku bi wan dihise mufrezên eskerîyê derdixe şopgerîna wan. Wexta kû ew bi serê sibehê ra nêzîkî gundê Gulo dibin, esker pêşîya wana dibirre. Fermandarê wê mufrezê Dewrêş Beg bûye. Fesihê Mihê Mîrze, waha qala wê bûyerê dike:

- Hejmara eskerên Dewrêş Begê şesid sîyar bûn. Em jî sî û pênc-çil sîyar bûn. Roja 15ê Nîsana 1932yan bû. Di nav

esker da milîs jî hebûn. Dewrêş Beg du kes şandin cem me. Ew ji Şêxên Avbirîyê bûn. Dêwrêş Begê gotîye; *"Bila teslîmbin, ew ji destên me xilas nabin. Xêra wana tune, ez naxwazim xwîn bê rijandin."*

Seyîdxan bi me ra xeberda, fikra me pirsî û got *"Cebilxana me kêm e. Em pêka wan naynin. Ezê bêjim erê, emê teslîm bibin. Ezê bêjim çar-pênc seet muhlet bidin me, êmê bi hevra xeberdin û hevûdu îkna bikin. Belkî ew jî muhlet bidin me, em bi vî karî wana bixapînin, em êvarê bi ser xwe da bînin û di tarîyê da xwe xilas bikin."*

Me jî jê ra got; *"Baş e, ka em wusa bikin."*

Seyîdxan ji şêxên Avbirîyê ra got;

*"Ji Dewrêş Begê ra bêjin, bila çar-pênc seetan muhlet bidin me, emê bi hevra xeberdin. Em hevûdu îkna bikin emê teslîm bibin."*

Şêx ku vegerîya çû, demekî pey ra hîkmetê xwedê berf û baran û zîpik barîya. Ba û bahoz û zîpik wusa li hev ket, merîyan digot qey qeyamet rabû. Ezman li nav hev ket, bû tarî, çav çavan nedidît. Me ji wê rewşa hewayê îstifade kir û xwe ji çembera esker bi rehetî xilas kir. Em daketin Gelîyê Berazan (Elmalîdere), di gundê Sînê ra derbas bûn û çûne zozanên Dexda. Em li wir zêde nesekinîn. Paşê me berê xwe da deşta Intabê.

## MILÎSÊN SÎPKA Û ŞERÊ CEMALVERDÎ

Me li jor gotibû, ji axawata Sîbka Mehmûd Beg, Mûsa Beg û Sidîqê Hecî Mistefa Begê çawa bûne milîs, çawa bi leşker ra çûne Gelîyê Berazan, çawa xirabî kirine, di nava gel da ev tev jî baş têne zanîn. Ji ber vê yekê gelek kes dibêjin ku firarên Seyîdan û Berazan bi meqseda tolhildanê çûne Cemalverdî û bi wana ra şer kirine. Li gor fikra min ew bi qesta tolhildanê neçûne wê hêlê. Esker ku pêy wana ketîye, ji bo ku xwe ji teqîbatê xilaskin mecbûr mane ji ava Mûradê derbasbin û herin wî alî.

Berê em guh bidin birazîyê Elîcan Ferîd Qamîş. Pey ra jî em dê gotinên Fesihê Mihê Mîrze neqil bikin..

Ferîd Qamîş waha got;

- Wexta ku berbe Intabê (Tûtaxê) diçin, mufrezeke giran li pey wan bûye. Bavê min ji min ra gotibû sedemê çûyina wan ew bûye ku herin di ava Mûradê ra derbasbin û xwe ji şopgerînê xilaskin. Paşê jî herin xwe biavêjin çîyayê Qetewîn. Berya wê ew û esker li du-sê cîhan rastî hev tên û li hev dixin. Wexta ku xwe digihînin perê Mûradê dinihêrin ku av pir rabûye. Hespên wan jî qels bûne. Dibêjin em çend hespên xurt peydakin, bi wana ji avê derbasbin. Bavê min unîforma yuzbaşîtîyê li xwe dike. Cilên neferan jî li du hevalên xwe dike, diçin gundekî. Bi muxtar ra xeber didin. Bavê min ji muxtar ra dibêje; *"Emê ji avê derbasî wî alî bibin, ji me ra hesp lazim in."*

Ji gundîyan wetrê ew zabit û neferên dewletê ne. Çend hespan didine wan. Ew ku diçine devê Mûradê, mufreze jî nêzîkîyê li wan dike. Milîsên Sibka jî bi mufrezê ra bûne.

Gişk bi silametî ji Mûradê derbas dibin. Du sandiq cebirxana wana li pişta hêstirekê bûye. Hêstir jî di destê apê min Sulhedîn da bûye. Apê min Sulhedîn ku hêstirê li avê dixe, hêstir li ber pêlên avê xwe nagire, dikeve. Ew û apê min serobinî hevûdu dibin. Poçika hêstirê ji destê wî difilite. Hêstir bi cebilxana ser pişta xwe va li ber avê diçe.

Lê apê min axirê bi zor û zehmed xwe xilas dike. Pey ra diçine gundê Zekî Begê birayê Xalis Begê. Li mala Zekî Begê ser û guhên xwe zuha dikin. Demekê bêhna xwe berdidin, pey ra ji Zekî Begê xatirê xwe dixwazin û diçin. Wê demê bi Zekî Begê ra suhbet dikin. Ji bo milîsên pismamên wî gazinên xwe bi wî dikin. Seyîdxan dibêje *"Pismamên we bûne milîs. Bi hukûmatê ra şerê me dikin."*

Zekî Beg dibêje; *"Welle em jî ne razî ne, ji kirên wan aciz in. Lê tiştek ji destên me nayê."*

Ew ku ji gundê Zekî Begê bi rê dikevin, berbe Cemalverdî da diçin. Bavê min got; 'Ez, birayê min Sulhedîn, birayê Seyîdxan Tewfîq, Evdilhemîd, Mihê Xelîfe û Elîyê Feqî Silê... Em li pêşîyê diçûn. Em hinekî ketibûn pêşîya hevalên xwe. Me nêzîkî li Cemalvêrdî kir. Me bala xwe dayê ku wa ye sî-çil esker ji alîyê din da berbe gund tên. Me kefîyên xwe derxistin û ji bo ku hayên hevalên xwe ji hatina esker bikin, berbe hevalên xwe hejandin û me bi lez hespên xwe berbe gund ajotin. Me xwe gîhand zinarên binya gund. Em ji hespên xwe peyabûn û me xwe avêt nav zinaran. Wana gule li me barandin, me jî bersîva wan da.

Me demekê wusa li hevûdu xist. Piştî demekî hevalên me yên din jî xwe gîhandin gund û ketin şer. Şer demekî dirêj dom kir. Di wî şerî da me Mahmûd Beg, Mûsa Beg, Sidîqê Hecî Mistefa Begê û çend xulamên wan kuştin. Û me wanên

din jî gişt hêsîr girtin. Di nav hêsîran da xortekî bi selah hebû. Hevalekî me berê tifingê da wî û kir ku lêxe. Ewî kire zarezar û xwe avête pişt min û got; *"Ez ketime bextê te!"*

Min deng li wî hevalî kir û ew da sekinandin. Min jê pirsî:

*"Tu kî yî?"*

Wî got; *"Ez ji Ercîşê, kurê Evdilê Îbrahîmê Têlîyê me. Mûsa Beg zavayê me ye. Ez hatibûm cem Mûsa Begê, hukûmatê merivên malbata me birin û kûştin!"*

Min got; *"De hûn jî Kurd in. Hukûmatê ew felaketa anî serê we, îja tu çawa tifingê hildidi û tevî milîsan bi me ra şer dikî?"*

Xortî got; *"Tu rast dibêjî. Mûsa Beg zavayê me bû, me got ew zilamê hukûmatê ye, de me got qey wê me biparêze. Dawîyê da wî em anîn kirin vê tomikê."*

Me ew xort û wanên din berdan. Silehên wan hildan, bi rê ketin çûn çîyayê Qetewîn.

Li vir em dora pirsê bidin Fesîh Begê;

- Em kû ji zonanên Dexda bi rê ketin, em bi berbanga sibehê ra gihîştin gundê Intabê (Tûtax) Qereaxacê. Mufreze jî li pey me bû. Gund nêzîkî Mûradê bû. Me ji gundîyan pirsî;

*"Li van nêzîkan ji bona derbasîya avê delav li ku ye?"*

Gundîyan got; *"Ava Mûradê li van deran rê nade."*

Me ji bo rêberîyê merivek bi xwe ra hilda û em berjêr çûn. Navê wî merivî Axa bû. Wî em birin ber delavekî lê got; *"Li vir jî îmakana derbasbûnê tune, lê dîsa jî hûn dizanin."*

Mufrezê nêzîkî li me kiribû. Lê li wir cîhekî wusa munasib jî tunebû ku em bi esker ra bikevin şer. Divêd ku em der-

basî wî alîyê avê bûbûna. Me gemên hespan ji devê wan derxis, bi dêlla wan girt û hesp ajotin nav avê. Em gişt bi silametî derbas bûn. Em di tarîyê da derbas bûn, çûne gundê Zekîyê Evdilmecîd Begê. Me li mala Zekî Begê bêhna xwe berda, cilên xwe zuha kirin. Seydixan û Zekî Begê demekê suhbet kirin. Zekî Begê got; *"Hûn dizanin pismamên min milîs in. Ez hêvî dikim ku hûn belapêşkarî hevûdu nebin."*

Seyîdxan got;*"Em li kuştina kesî nagerin. Lê ku ew qesta kuştina me bikin, em hazir in."*

Em ji Melehesen jî bi rê ketin û berbe Cemalvêrdî çûn. Nêzîkî gund mêrgek hebû. Em li wê mêrgê ji hespên xwe peyabûn û me bi hevûdu ra nimêja nîvro kir. Li Cemalvêrdî nasekî Seyîdxan hebû. Piştî nimêjê Seyîdxan ji Tewfîq û Feyzula ra got; *"Hûn rabin herin gund, ji wî nasê min ra bêjin, bila ji me ra nan hazir bike. "Emê nanê xwe bixun û derbasbin, herin."*

Tewfîq û Feyzula berbe gund çûn. Me jî cixarên xwe vêxistin û xwe li ser hêşnaya mêrgê dirêj kir û xwe hinekî rehed kir. Di ser çûyina wan ra bîstek derbas bû an nebû, me hew dît bû teqîn û reqîna silehan. Tu nebê Mûsa Beg hema berya hatina me bi panzdeh sîyarên xwe va hatîye gund. Kurapê wî jî tevî heft-heyşt sîyarên xwe va ji gundê Lîsorê bi rê ketîye ku here Cemalvêrdî. Ew û hevalên me li perê gund seqe-seq rastî hev tên. Herdu serî jî dest diavêjin silehan û bi hev da diteqînin. Gava ku me dengê silehan bihîst, em jî hema rabûn, li hespên xwe sîyar bûn û me berbe gund ajot. Em ku nêzîkî gund bûn, wana ji gund reşandin me. Mînanî teyroka biharê ji her derê gule li me dibarîyan. Gund bi giştî di destê wana da bû. Tu nebê Sidîqê Hecî Mistefa Begê jî tevî merivên xwe di wê navberê da hatîye li gund peya bûye.

Tewfîq û Feyzula li alîyê din ketibûn ber qefa zinaran. Bi wî teherî şer dikirin. Em li rastê bûn û tiştek jî tunebû ku em bikevin paş û xwe biparêzin. Em paş va vekişîyan. Wê demê Seyîdxan li me hêrs ket û got; *"Olo! Hûn çawa ji gulên Sîbkan ditirsin û direvin?... Eger ku em îro ji ber Sîbkan birevin, emê rezîl û ruswayî dunya û alemê bibin."*

Bi wê pirsa Seyîdxan va me serê xwe xist nav bijûyên hespan û me berbe gund ajot. Gule mîna baranê bi ser me da dihatin. Bi bayê bezê ra me xwe li ser pişta hespan dirêj kiribû. Her yek ji me, ji alîyekî va xwe gîhand nava gund. Em ji hev belav bûn. xebera kesî ji kesî tunebû. Bi rasthatin ez li pêşîya Seyîdxan bûm. Ew û kurê wî Sulhedîn li dû min dihatin. Sulhedîn wê çaxê şanzdeh-huvdeh salî bû. Seyîdxan destvala bû. Tifinga wî di destê Sulhedîn da bû. Ez li ber dîwarekî peya bûm, min nihêrî li pêşberî min di pişt şargê sergînan da şeş serî dixuyên. Seyîdxan û Sulhedîn jî hatin cem min. Sidîqê Hiso jî hat, xwe gîhande me. Sidîq deng li gede kir û got; *"Tifinga Seyîdxan bidê!"* Seyîdxan ku tifing da destê xwe ji min pirsî, *"Te kozikên neyaran kifş kir? Rayî min bide!"*

Min jî kozikên neyaran yek bi yek jê ra got.

Seyîdxan got; *"Li vir nabe. Ya baş ew e ku ez derkevim ser banê xênî, ji wira biavêjim wana."*

Dema ku xwest derkeve ser xênî, min xwe avêt pêşîyê û nehişt. Min jê ra got; *"Nabe apo. Tu ku derkevî ser xênî, tuyê yeqîn bê kuştin."*

Di nava gund da şer germ bûbû. Reqîna silehan bû. Kî hatîye kuştin, kî maye hayê me jê tune bû. Me demekî wusa li ber dîwêr da şer kir. Seyîdxan deng li min kir, got; *"Derkeve ser xênî."*

Min qîl kir û ez derketin ser xênî. Bi derketina min ra wana reşande min. Belkî sed gule berî min dan. Dêmek ecelê min nehatibû. Teqdîra xwedê gula ji min negirt. Kevirên derdora min ji derbeyên guleyan parçe perçeyî bûn û hatin xwarê.

Di navbera min û wan da xirbek hebû. Min xwe avête xirbe. Ji hevalên me Sidîqê Heso û Hemo jî li pey min hatin ketin xirbe. Li pêşberî me Mûsa Beg û Mehmûd Beg û xulamên wan bi me ra şer dikirin. Me çend derb avêtine wan, Mûsa Beg hat kuştin. Mahmûd Beg jî ji milê xwe va birîndar bû. Mahmûd Beg deng li me kir û got; *"Em sulh bibin."*

Me ew hêsîr girt, xulamên wan jî teslîm bûn. Me çekên Mehmûd Begê, rext û kemberên wî jê sitand û danî alîkî. Mahmûd Begê ji min ra got,:

*"Seyîdxan kîjan ji we ye? Ray min de, ez dixwazim pê ra xeberdim."*

Bi xeberdana wî ra Seyîdxan jî hate cem me. Min ji Seyîdxan ra got;

*"Apo, eva dixwaze bi te ra xeberde."*

Seyîdxan jê pirsî; "Tu kî yî?"

Wî got; *"Ez Mahmûd Begê kurê Ûsiv Begê me."*

Seyîdxan jê ra got; *"Hela hukûmat li me bûye dujmin, dixwaze me ji ortê rake, serê me û zar û zêçê me jêke. Hûn dewa çi li me dikin. We çîyê xwe li ortê winda kirîye? Te ev welata rûxand, wêran kir Mehmûd Beg!... Zulma ku we li gelê me yê belengaz kir, êdî nayê hesaban. Ji vî gelê belangaz ra xizmeta te ev bû Mehmûd Beg?..."*

Seyîdxan vegerîya ser min û got;

*"Fesîh! De êdî firsend ketîye destê te. Lêxe, wî bikûje û*

*heyfa apê xweyê Xelîl jî jê derxe."*

Min lê nexist. Bi wê pirsê Mehmûd Begê ez nas kirim û hema xwe avête pişt min. Seyîdxan dît ku ez lê naxim, çav kire hevalekî me yê din û ewî gule berî Mehmûd Begê da û ew kuşt. Ji kuştina Mûsa Begê û Mehmûd Begê bi kurtedemekê şûnda li alîyê din jî dengên silehan hate birîn û şer xilas bû.

Di derheqê meseleya Cemalvêrdî û pêwendîyên pêşdehatîyên Sîpkan da Hecî Mihemed Sadê (Mihemedê Selbîyê) zanîna xwe ji min ra got.

- Berê ez bi kurtî Hecî Mihemed bidim naskirin. Ew salekî yan jî du sala berya şerê cîhanê yê yekemîm li gundê Sarîqamîşê Orteqelê hatîye dunyayê. Wê demê gundê wan di nav sînorê Ûris da bûyc. Piştî têkçûyina artêşa Osmanî ya êrîşa Sarîqamîşê, bavê wî û apê wî (Îbo û Mihê) raporên artêşa Ûris ya enîşka Sarîqamîşê bi dest dixin û dibin digihînin, qolordîya Qerekilîsê. Pey ra dewleta Ûris pê dihese û wana digre, dibe li Qersê dardadike. Dîya wî Selbî Xanim bî dimîne. Piştî şer, Evdilmecîd bi wê ra dizewice. Ew jî bi dîya xwe ra diçe cem Evdilmecîd begê. Paşê ku Evdilmecîd Beg ji nefîyê vedigere, tê li Qereaxacê bi cîh dibe. Piştî wefata Evdilmecîd Begê ew jî tevî dîya xwe du-sê salan li Qereaxacê dimîne û paşê diçin gundê xwe yê berê. Ew niha li heyatê ye.

Hecî Mihemed awha got;

- Wê çaxê mala me li Qereaxacê bû. Firarên Seyîdan û Berazan hatin gund. Mufreze jî li dû wan bû. Wana ancax ji Mûradê derbas bûbûna wê xwe xilas bikirana. Ava Mûradê rê nedida. Birayê Elîcan Feyzula hate cem dîya min, got;

"Selbî Xanim, tu dizanî ku em ji Evdilmecîd Begê ra pir bi hurmet bûn. Beledan bide me, bila delava rayî me bidin û

em derbasbin. Dîya min berê hinekî li wana hêrs ket, paşê gazî gundîyên me Axa û Mûhemed kir, wekî beled bi wan ra şand û ew derbas bûn çûn. Ez vê jî bêjim; di navbera Xalis Begê û pismamên wan Mehmûd Beg, Mûsa Beg û Sidîqê Hecî Mûstefa da hinekî sarî hebû.

Piştî ku hukûmatê Evdilmecîd Begê şand nefîyê ew jî Dibêjin; *"Ji me ra baş lê hat. Êdî mezintîya eşîretê kete destên me."*

Bi vê fikrê ew milîsan li dora xwe dicivînin, pişta xwe dikutin hukûmatê û şûrê xwe rasto-çep dihejînin.

Xalis Beg gava ku ji Xana Delal ji destê esker revî û çû Kirre Girîdaxê, zeman zeman bi merivên xwe va ji Kirr derdiket, diçûn li cîhê cuda cuda bi esker ra şer dikirin. Êrîş dibir ser qereqolan û rê dibirîn. Carekê tevî hevalên xwe tê alîyê Intabê. Rojekî li ber gundê Banê esker û milîs dora wana digirin û şerekî bêeman derdikeve. Di wî şerî da Emoyê Dilxêrî û başçawîşek tên kuştin û Xalis Beg jî ji milekî xwe da birîndar dibe.

Di vî şerî da Mûsa Beg jî tevî panzdeh milîsên xwe hatîye şerê Xalis. Xalis Begê mêldarîya firarên Seyîdan û Berazan dikir. Lê têkilî tiştekî nedibû. Ji wan pismamên xwe dev-tel bû. Lê dujmintîya wana jî nedikir. Yanî mînanî hinekan ku paşê digot tu têkilîya Xalis Begê û kuştina pismamên wî bi hev tunebû. Ji xwe Xalis Beg çar-pênc roj berya wê bûyerê ji Iraqê hatibû. Çûbû cem Şêxê Borezan (Şêx Ehmed Berzanî) û teze hatibû.

Îja piştî şerê Cemalvêrdî û kuştina Mûsa Begê, Mahmûd Begê û Sidîqê Hecî Mistefa Begê qîyamet rabû. Mufetîşê umûmî, walî û paşayên dewletê gişt hatin Tûtaxê.

Merivên wan ji kuştina van, Xalis Beg mesûl didîtin.

Cenaze anîn li Xirbesorikê danîn û gotin; *"Em hetanî sê merivan nekûjin neynin li ber van cenazan dirêj nekin, em wan defin nakin."*

Bi kuştina sê merivan va Xalis Beg, Zekî Beg û Evdila Beg qest dikirin. Xalis çû Meleşemdîn, bi mufetîşê umûmî ra xeber-da. Mufetîşê umûmî jî ji Xalis Begê ra dibêje; *"Ev merivana him alîkarê dewletê ne, him jî kesin muhîm in. Çawa firar tên di tenişta we da vana dikûjin û hayê we jê nabe."*

Xalis Beg berpirsîyarê dewletê îkna dike ku hayê wî jê tuneye. Mufetîşê umûmî ji merivên Mûsa Beg Mahmûd Begê û Sidîqê Hecî Mustefa Begê ra dibêje; *"Elaqa Xalis bi vê bûyerê ra tune. Heger ku hukûmat tiştekî wusa lê tesbît bike ewê wî û merivên malbata wî giştika topke bişîne dadgeha îstiklala Dîyarbekirê."*

Bi wî teherî ew bawer bûn ku têkilîya Xalîs Begê bi wê bûyerê tune.

Kilama Şerê Cemalwerdî, bi sitrana Şakiro waha ye;

***LO AXAO EZ BI DÎYARÊ CEMALVÊRDÎ KETIM***

*Looo axao... axao... axao...*
*Lo mîrooo...*
*Ez bi diharî Cemalvêrdî ketim ba-avêje*
*Tu bala xwe bidê*
*Hela-hela lawî bava*
*Qirçînîyê çapilîya û martêlîya*
*Tivinga destê Seyîdxan malê Romê ye*
*Barûda dirêje*
*Gulla xweş diavêje*

*Herçi dîvanê ku egîdê mala bavê min tê da rûniştî be*
*Bira kes rûnenê, xeberê kin û dirêj nebêje...*

*Tewfîq bi sê denga bang dikirî*
*Digo Seyîdxan mala te xirab be*
*Hel-hel e*
*Ez ku he me*
*Bavê Salih,*
*Berxê mala Ûsivê Seydo*
*Peyayê xerîb*
*Mêrê mêrxas*
*Kewê ribat*
*Ne ez birayê te me*
*Minê bi telaqê jinberdanê sond xwarîye*
*Li devê Mûradê fîşeng avêtîye devê çapilîyê*
*Gera îro li Cemalvêrdî mêra bikûjim*
*Fenanî mîya ku berxa xwe winda ke*
*Dê weledê xwe bavêje...*

*Helan danê helan danê*
*Egîtê mala bavê mi gulîkurê helan danê*
*Ezê ji te ra sond bixum*
*Bi qesemê bi navê qur'an ê*
*Egîtê mala bavê mi bîna barûdê hildane*
*Sond xwarine bi telaqê jinberdanê*
*Heya mêra nekûjin*
*Bi silametî venagerin*
*Ji herasa vê meydanê...*

*Lo axayooo.. axao, axao, axao...*
*Lo lo maqûlo sibe bû*
*Ezê bi diharî Cemalvêrdî diketim bi darî-ter e*
*Seyîdxan derketî banê qesrê*
*Bi sê denga ba dikirî*
*Sidîqê Hecî Mistefa Begê*
*Ezê di bextê gora bavê te ketime*
*Pêşya firarê me berde*
*Firar gune ne, bira derbas be here*
*Hey malmîrat*
*Çima tu nizanî, çendî çen salê me temam bû*
*Hukûmeta cûmhûryetê*
*Li sirgûna çolix çocixê me*
*Li birrîna serê me digere*

*Sidîqê Hecî Mistefa Begê*
*Digo welle nabe bille nabe*
*Minê bi serê Şêx Badînê Dignûgê sond xwarîye*
*Heya ez li dinyayê sax bim*
*Firarê Seyîdan û Berazan*
*Tu car di ser min ra derbas nabe*

*Ay de rabe... rabe rabe rabe..*
*Tewfîq bi sê denga ba dikir*
*Digo Seyîdxan mala te xirab be*

*Hel-hel e*
*Ez ku heme*
*Bavê Salih*
*Berxê mala Ûsivê Seydo*
*Peyayê xerîb*
*Mêrê mêrxas*
*Kewê ribat*
*Ne ez birayê te me*
*Minê bi telaqê jinberdanê sond xwarîye*
*Li devê Mûradê fîşeng avêtîye devê çapilîyê*
*Îro li Cemalvêrdî mêra bikûjim*
*Minani mîya ku berxa xwe winda ke*
*Dê li weledê milê xwe bigire*

*Hey malmîrat*
*Ji şerefa mala me ra eyb e*
*Li ber xelkê tu negere*
*Çima tu nizanî*
*Peyayê ku bikeve kozika birayê te bi tenê*
*Bi saxî û silametî*
*Bi ser çolix û çocixê xwe da venagere*

*Helan danê, helan danê*
*Egîtê mala bavê min gulîkurê helan danê*
*Ezê ji te ra sond bixum*
*Bi qesemê bi qur'anê*
*Egîtê mala bavê min bîna barûdê hildane*

*Sond xwarine bi telaqê jinberdanê*
*Heya mêra nekûjin bi selametê venagerin*
*Ji herasa vê meydanê*

*Lo axayooo... axao axao axao*
*Sibe ye lo maqulo*
*Ezê bi diharî Cemalvêrdî diketim bi çem û kanî*
*Mûsa Beg derketîye banê qesrê*
*Bi sê denga ba dikirî*
*Digo Sidîqê Hecî Mistefa Begê*
*Ez bextê te ketime*
*Serê xwe ji xewa şirîn bilîndke*
*Hela bala xwe bidê*
*Hela-hela lawê bava*
*Qirçînîya çapilya û martêlîya*
*Firarê Seyida û Beraza*
*Bi sibê ra gund hilanî*

*Ca agirê kulê bikeve mala bavê xelkê Intabê*
*Li ser serê egîtê mala bavê mi nemayê*
*Ji êvar da agir dadan kirin kafirstanî*

*Ay de rebeee... rabe, rabe, rebeee...*
*Tevfîq bi sê denga ba dikirî*
*Digo Seyîdxan mala te xerab be*
*Hel-hele*
*ku ez heme*

*Bavê Salih*
*Berxa mala Ûsivê Seydo*
*Peyayê xerîb*
*Mêrê mêrxas*
*Kewê ribat*
*Ne ez birayê te me*
*Minê bi telaqe jinberdanê sond xwarîye*
*Li devê Mûradê fîşeng avêtîye devê çapilîyê*
*Gera îro li Cemalvêrdî*
*Sidîqê Hecî Mistafa Begê*
*Mûsa Begê û Mahmûd Begê*
*Tevî komê xulama bi temamî bikûjin*
*Li qarşî çolix û çocixê wana*
*Çek û silehên wana ji destê wan bitsînin bi mêranî*
*Bira xelk bizanibe lawê bava hebûn*
*Li piştî xirabîya xelkê ji bîr nekir*
*Heyfa xwe hilanî*

*Helan danê helan danê...*
*Egîtê mala bavê min gulîkurê helan danê*
*Ezê ji te ra sond bixum bi xesemê bi navê qur'anê*
*Egîtê mala bavê mi bîna barûdê hildane*
*Sond xwarine bi telaqê jinberdanê*
*Heya mêran nekûjin bi selametî venagerin*
*Ji herara vê meydanê...*

## PIŞTÎ ŞERÊ CEMALVÊRDÎ ŞERÊ BÎLECANÊ

Piştî şerê Cemalvêrdî, Fesîh rewşa firaran awha neqil dike;

- Em li çîyayê Qetewîn wê rojê man. Êvarê em ji çîyê qetîyan û berbe Milazgirê meşîyan. Şeva 24-25ê Nîsana 1932yan bû. Demekî şûnda baranek wusa barî meriv digot qey ezman qul bûne, avê dirijîne. Şevreşeke wusa bû, çav çavan nedidît. Piştî nîvê şevê em hatin nêzîkî Milazgirê. Li ber çemê Badîşanê me nihêrî, av wusa rabûye, bûye behr, gamêş nikare lêkeve. Seyîdxan ji min ra got|

*"Fesîh! Van deran muhîtê te ne. Tu dizanî emê di kîderê ra derbas bibin?"*

Min jî got *"Apo, delav ev der e. Lê av wusa rabûye ku meriv nikare derbasbe. Em dîsa hespan biajon avê, bi dêla wan bigirin û derbasbin."*

Heval gişk top bûn, me li seetê mêze kir, ji şeveqê ra du seet mabû. Me qirar dabû ku em hespan li avê xin. Me gemên hespan ji devê wan derxistin û em yeko yeko daketin nava avê. Avê di ser pişta hespan ra diavêt, simê wan ji erdê dibirî. Hesp mîna kelekan li avê sîyar bûbûn. Gava ku ez ketim nava avê pêlan li min xist, ez û hespê xwe tev biroda çûn. Pêlan mînanî ejderha li min dixist,û ez dibirim, hayê kesî ji kesî tunebû. Herkes ketibû tatêla ruhê xwe. Min mecal dît û ez berbi qiraxê avê çûm. Hindik mabû ku ez bigihêjim perê avê, min hew dît ku hevalekî me ji hespê xwe qetîyaye û bi çîqilê darekî va girtîye. Lê kifş bû ku çiqilê darê dikira ji destê wî bifilitîya. Ew gundîyê me bû. Min gazî kirê û got;

*"Tu şaş nebî, ezê hespê xwe ber bi te biajom. Gava ku em hatin cem te tu bi dêla hespê min bigirî. Hespê min wê me*

*herdukan jî xilas bike."*

Em çûne cem wî. Ewî bi dêla hespê girt û hespê em herdu jî derxistin perê avê. Bi kurtî bêjim em gişt bi silametî derbasî wî alî bûn. Gava ku em li hev civîyan, gundîyê me Çaçan got;

*"Hespê min li wî alî ma, ezê bê hesp perîşan bibim."*

Gunê min pê hat, min jê ra got;

*"Xem neke, ez dê herim hespê ji te ra bînim."*

Serxweşîya xortanîyê... Mînanî caran ku meriv serxweş dibe, çavê merivan tiştekî nabîne. Ez ku li avê ketim, hinekî çûm, ez û hesp bi hevûdu ra noqî avê bûn. Dema ku ez derketim ruyê avê, min ferq kir ku kulikê min di ber avê ra çûye. Du tifing bi min ra bûn. Yek di qayîşa zîn da yek jî di hustuyê min da bû. Ez ji hespê xwe qetîyabûm lê hesp nêzîkî min bû. Min xwe gîhande hespê, bi hustîyê wê girt. Hespa min qefilîbû, ji taqed ketibû. Avê ez û hespê min tev berjêr kişandin. Mûrad nêzîk bû. Av tevî Mûradê dibû. Heger ku em hinekî din biçûna, emê biketana Mûradê û xilasîya me jî mûcîze bû. Wê demê ez qîrîyam;

*"Ez fetisîm! Ji bo riza xwedê kes tune min xilas bike?"*

Ji wan hevalên me yêkî li min vegerand; *"Kê ji te ra got here? Kî dikare xwe biavêje vê behrê?"*

Qeder temam nebûbû. Pêla li me xist, ez û hespê tev avêtin wî alî. Ez li alîyê din mabûm. Pey ra pismamê min Celalê Balê li hespekî zexim sîyar bû, hat ez derbasî cem hevalan kirim.

Ji şeveqê ra seet û nîvek mabû. Li pêşîya me ava aşê Adê hebû. Lê peravên avê gişt zinar û kendal bûn. Meriv nekarîbû derbas bibe. Pire hebû. Em çûn di ser pirê ra derbasbûn. Pire

jî bi qasî kîlometrekî nêzîkî Milazgirê bû. li Milazgirê esker hebûn. Ber vê çendê divêd ku em gavek berê ji Milazgirê bi dûr ketana. Bi vê sedemê me hesp rakirin çargavîyan û ajotin. Demekî şûnda dengê teqîna tifingekî hat. Me nihêrî ku Sidîqê Seyîdî di nav me da nîn e. Me got;

*"Yeqîn Sidîq winda bûye. Ji bo ku em wî bibînin wî gule teqand."*

Pey ra dengê teqîneke din jî ku hat, Tewfîq û hevalekî din vegerîyan, berbe teqîna gulê ajotin. Wana çûn Sidîq dîtin. Tu nebê Sidîq li ser pişta hespê razaye, ji hespê ketîye, hesp jî berbe Milazgirê revîyaye çûye. Gava ku hesp diçe Milazgirê esker hespê dibînin, bi me dihesin û bi pey me dikevin. Em çûn li gundê Pûlarê peyabûn. Hayê me ji esker tunebû. Demekî şûnda nobedarên me xeber dane me, gotin *"Esker hat!"*

Mufreza Dewrêş Begê dîsa li pey me bû. Hejmara eskerên mufrezê şeşsed sîyar bûn. Rojeke dirêj û dijwar li pêşîya me bû. Ji serman û ji zehmetan qudûmê me nema dişuxulîn û emê ji mecbûrî bi mufrezê ra biketana şer. Ji bo vê yekê em li hespên xwe sîyar bûn û çûne çîyayê Bîlêcanê. Li wê derê me cîyên kozikên xwe çêkirin. Ji bo ku em xwe baş biparêzin me kozikên xwe zexm kirin. Li çîyê esker êrişî me kir. Cîhê me ji bo parastinê baş bû. Gava ku me li wan reşand esker paşda vekişîya. Me nehişt gavekî pêş va bên. Heta êvarê me bi wan ra şer kir. Piştî ku tarî kete erdê, em li hespên xwe sîyar bûn û bi rehetî em ji çîyê veqetîyan û me berê xwe da çîyayên Mûşê. Ji me tiştek bi kesî nehatî-bû; ne kuştî, ne birîndar. Lê ji esker çend kes birîndar bûbûn an jî hatibûn kuştin me nizanîbû.

# ŞERÊ QAZÎCELALÊ Û KUŞTINA MIHÊ XELÎFE

Piştî şerê çîyayê Bîlecanê taqîbata bi giştî rewşa firarên Seyîdxan û Berazan dijwar dike. Xêncî şeş-heft alayên sîyarî yên seyar ji her derê eskerên reş û bi sedan jî cerdevan şopa wan digerînin. Wan jî ji bo ku şopa xwe winda bikin her dem cîh diguherînin. Firar ji çîyayên Mûşê bi rê dikevin, di alîyê Wartoyê ra derbasî Qarliowayê dibin. Û ji vir jî diçin alîyê Tekmanê. Di pey ra diçine Parsînê (Hesenqele-Xorasan). Ji vir jî derbas dibine alîyê Xaylazê. Ez alîyê Xaylazê tarîf bikim; li bakurê Qereyazîyê çîyayê Mêrgemirê heye. Hesenqele, Xorasan û Elaşgir jî dikevin bakurê vî çîyayî. Ji wan gundên dorhêla çîyayê Mêrgemirê ra "*Xaylaz*" dibêjin. Beşek gundê Qereyazîyê, beşek gundê Elaşgirê, beşek gundê Xorasan û çend gundên Hesenqelê dikevin tixûbê Xaylazê.

Firar li wê hêlê diçin gundê Qazîcelalê. Li wê derê du mufreze esker di ser wan da digirin . Ji wan mufrezan yek alaya Delû Kemal bûye. Ezê paşê qala Delû Kemal bikim. Fesihê Mihê Mîrze di serpêhatîya xwe da zêde qala wê bûyerê nake. Ew û esker çar seetan şer dikin. Eynî mînanî şerê Melexidiran û şerê Wartaxê ew lê dixin wan herdu mufrezan bela-belayî dikin. Çend esker tên kuştin û birîndar dibin û gelekî wan jî hêsîr dikevin. Delû Kemal û fermandarê mufreza din jî direvin. Bi lingên hespan bi zorê canê xwe xilas dikin. Ji wan jî tenê Şamilê Heydê tê kuştin. Wekî din tiştek bi kesî nabe.

Wexta ku firar ji Qazîcelalê bi rê dikevin û berbe çîyayê Mêrgemirê dimeşin, lingê Mihê Xelîfe (Kurapê Elîcan) dişikê. Ew tînin Mihê di cîhekî asê da, di şikeftekî da bi cîh dikin. Hevalekî xwe li cem wî dihêlin û dîsa berê xwe didin deşta Mûşê. Paşê jina Mihê diçe, di şikeftê da li mêrê xwe

mêze dike. Wê demê li wê hêlê hekîm hebûne. Ew tên lingê Mihê girêdidin, demekê şûn da hukûmat pê dihese, esker diçin Mihê tevî hevalê wî Baran digirin û wan dibin Qerekilîsê. Wê çaxê Gelîyê Berazan li ser Qerekilîsê bûye. Paşê wan dişînin hepsa Tûtaxê. Piştî du sê mehan wana ji hepsê derdixin, dibin li gundê Birûsko dikûjin.

Ew kilama li ser Mihê hatîye gotin bi sitrana Reso; Weha ye.

***HÊ BIRA***

*De hêêêê bira*
*Dîdarê digo lê lê Têlo rebenê*
*Felekê îro sutîyê min xwar kirîye*
*Îro çerxekê li min lêda*
*Xwedê xira bike mala toxtorê Erzurumê*
*Lingê bavê Mamê xwar girêda*.*
*Heyfa min nayê li afata çîyayê Mûşê*
*Rapora bavê min girtin di yekê şevê da*
*Şandin Qerekosê di firqê da*
*Kesek tune cewabekê bide Binê Xetê*
*Berxê mala Ûsivê Seydo*
*Bavê Sulhedîn*
*Evdilhemîd şêrê bi gulî*
*Bigota mala we mîrat bûyo*
*Xwe bigihînin pêşîyê di wextê da*
*Bavê Mamê ji we ra piştmêrî ye*
*Rojê û oxirmê giran da*
*Mînanî gamêşekî di herbê da*
*Hêêê bira...*

---

**Mamê Mahmud e.*

*Dîdarê digo lê lê Têlo rebenê*
*Felekê hustîyê min xwar kirîye*
*Çerxa min lê daye*

*Îsal çendî û çend sal e*
*Ez digerim nagerim*
*Min nedî çerxa vê felekê*
*Xwedê xirab bike*
*Mala xelk û însanên vî zemanê xerab*
*Qeyayê mezin, çîyayê bilind, çilê zivistanê*
*Kevir sitarîyê li mala Bişar û Seydo nakin*
*Lawo min dizanibû*
*Qedera bavê min jî ji yalê xwedê temam bûye*
*Gemîya bavê min ji êvar da hatîye sekinîye li ber kelekê*

*Bira di gazîya bavê min da bihata*
*Berxê mala Ûsibê Seydo bavê Sulhedîn*
*Evdilhemîd şêrê bi gulî*
*Şevgerê şevê*
*Feyzo birayê biçûk zengilê şer*
*Ca îro bavê Îpegê*
*Hêêêê bira...*

*De hêêê bira...*
*Bira welle tu piştmêrîyê biran î lo bira*
*Tu tekê şêran î lo bira*
*Li dunyayê miletê me xayin e*
*Ez çi bikim lo bira*

## DELÛ KEMAL DIKEVE XAYLAZÊ

Me li jorê ji qal kirîbû, di dema serhildana Kirrê Girîdaxê da çend alayên sîyarî yên seyar (gerok) hatine damizirandin. Wexta serhildana Berazan û Seyîdan dest pê dike, çar-pênc alayên din jî tên damezirandin û tevî wan alayên din pey firaran dikevin. Piştî şerê Çepê alaya Dewrêş Begê tê, dikeve Gelîyê Berazan û wê hêlê dirûxîne. Dewrêş Beg bi zulma xwe va deng daye. Gelyê Zîla wî birrîye.

Di nav wan alayên ku paşê hatine damezirandin ya Delû Kemal bi xirabîyên xwe va hatîye naskirin. Navê fermandarê alayê Elî Kemal bûye. Rutba wî albay bûye. Ewî zulmeke wusa li xelkê kirîye, metodên îşkencê yên wusa ecêb derxistîye ku kesî tiştên wusa ne dîtîye û ne jî bihîstîye. Ji ber vê yekê jê ra gotine; *"Delû Kemal."*

Selahîyeta fermandarên wan alayan jî bêsînor bûye. Girtin, berdan û kuştin di destê wan da bûye. Fermandar di derbekî da hezar kesî jî bikûje (Mînanî komkûjîya Gelyê Zîla) pirs û suwal tunebûye.

Piştî şerê Qazîcelalê Delû Kemal tê, dikeve Xaylazê. Wan gundên wê hêlê dirûxîne. Bilûbaşî gundê Xaylazê yê herî mezin e. Delû Kemal diçe li merivên wî gundî jî îşkencê dike. Ji Cambegayê jorîn xezûrê birayê min Elî xalê Ishaq ji min ra qala serpêhatîya xwe ya Delû Kemal weha kir.

- Ez deh-yazdeh salî bûm. Bavê min ga xist bin nîrê erebê, çû Bulûbaşîyê (Bölükbaşî). De tu dizanî Bilûbaşî nêzîkî gundê me ye. Seetekê dikişîne nakişîne. Min jî xwest ku bi bavê xwe ra herim. Bavê min nexwest. Ez ku bi pey erebê ketim, bavê min razî bû û ez li erebê sîyar kirim. Me ku

xwe gîhande Bulûbaşîyê, me dît ku gundekî bêdeng û bê însan e. Kesek li alangê tunebû. Merîyan digot qey herkesî warê xwe terk kirîye. Me li ber derê qonaxa xwe ga ji erebê berdan û em çûne hundur. Bavê min pirsî;

*"Ev çi hal e? Çi bûye? Çi çiryaye?"*

Ji bavê min ra gotin;

*"Delû Kemal hatîye, hemû mêrên gund top kirin, birin ber derê mala Xwedêda li wan îşkence dike."*

Di ser çûyina me da bîstek derbas bû nebû, du esker hatin bavê min hildan birin. Ez jî bi pey bavê xwe ketim. Wexta ku me xwe gîhande ber mala Xwedêda min nihêrî ku ecêbeke reşe giran, hemû mêrên gund li rasta pêşîya mala Xwedêda vezelandine, zare zara wan e. Ça ku meriv pez li guherê dike mexel, eynê wisa. Min hew dît ku Xelîlê Xwedêda jî li erdê ye û îşkence lê hatîye kirin. De tu dizanî mala Xwedêda ji berê da maleke qedîm bûye. Maleke bi sîyanet, bi rêz û hurmet e. Maleke pir dewlemend bû. Wexta ku şerê Ûris derketîye eyarekî ga tijî zêrên wan hebûne. Xelîlê Xwedêda bi xwe jî di alaya Şadîyan da zabit bûye. Di wexta şer da ewî ji bo dewletê fedekarîyên pir mezin kirine. Ewî mehekî eskerên ordîya wê hêlê bi qelî û qawirmê xwedî kirîye. Du bir pez serjê kirîye, daye esker. Piranîya serweta xwe di oxira dewletê da xerc kirîye.

Delû Kemal wexta ku diçe cîhekî, berê pêştahatîyên wira merivên bi rêz û hurmet dibir davête feleqê. Bi vî awayî mesajek wusa dida xelkê; şahê we be jî li cem min bi xasî mêşekî qîmeta wî tune û selahîyeta min bêsînor e. Ewî ji bo ku guza çavên xelkê bişkêne wusa dikir. Min bala xwe dayê ku waye li pêşîya mala Xwedêda jê ra mase û kursîyek danîne, gîzma sor di lingan da ye, qamçî di destên wî da ye,

Delû Kemal li ber masê rûniştîye. Qamçî di destê xwe da dibe-tîne, hey li kefa destê xwe, hey li gîzma xwe dixe. Emir dide wan zabit û eskerên dora xwe û mînanî ezraîlê kulê awira diavêje derdora xwe. De wê çaxê mase û kursî li mala kê hebûn. De zozanên warê Bulûbbaşê çiqas xweş in,tu dizanî. Piştî şer walî û paşayên Erzurumê, mîr û hakimên dewletê tên li wara dibin mêvanê Xelîlê Xwedêda. Qelî û qawirme, goştê kar û berxan dixun. Şûşên araqê û şerabê bi ser xwe da dadikin, kêf dikin û vedigerin. Qencîyên ku mala Xwedê da bi dewletê ra kiribûn, tu kesî nekarîbûn riba wî bikira. De îja mukafata qencîya wan jî ew bû.

De tu dizanî avek di nav gund ra dikişe, mala Xwedêda li perê avê bû. Wê derê cîna şilek û hezek bû. Du eskeran bavê min li ser wê şilekê avêtin erdê û bi çoyan va danê. Destên wî girêdayî bûn. Demekî wusa bavê min kutan. Pey ra lingên wî tîk kirin û avêtin feleqê. Bê pirs û bê suwal wusa lêxistin. Hanê bêjin tu kî yî, ji ku da teyî, ku da diçî, tiştekî wusa tunebû. Eskeran wusa li bavê min xist, mest kirin.

Di vê îşkencê û feleqê da bavê min ne mînanî wanên dinê feryad û fîgan kir, ne jî dengê xwe derxist. Wê rewşa wî bala Delû Kemal kişandibû. Car caran berbe bavê min zûr dibû û mêze dikir. Herhal wî hetanî wê çaxê tiştekî wusa nedîtibû. Eskeran demekê şûnda dev ji bavê min berda. Ser û guhê bavê min tev bûbûn herî.

Di wê navberê da di seheneki da sêvên şuştî anîn li ber Delû Kemal danîn. Delû Kemal hêrs ket, da çîrran got;

*"Min di nava sêvên we da...!"*

Bi pozê cîzma xwe li sênîkê xist. Sênîk wergerîya. Ew sêv gindor bûn, her yek bi alîyekî da çûn. Dema ku wî xwe wusa piz kiribû, xwe wusa şidandibû heger ku sêv bixwara

wê nerm bûbûya. Loma hêrs ketibû.

Ji wan sêvan yek jî gindor bû, çû li ber serê bavê min sekinî. Sêv tev bûbû herî. Bavê min hêdî hêdî xwe berbe sêvê kişand, serê xwe anî tanga sêvê, wê demê wî devê xwe avêt sêvê, gezek lê xist, tevî herîyê ew sêv xwar. Delû Kemal jî di bin çavan da lê mêze dikir. Bavê min ku sêva xwe xwar, Delû Kemal hema ji cîhê xwe rabû û hat li ber bavê min sekinî û got;

*"Ev kî ye? Kesî wî li vira ye? Bila zû bê!"*

Jê ra gotin; *"Ev ji Canbegayîyên jorîn e."*

Delû Kemal got; *"Erebeyekî bînin!"*

Gundîyan çûn ereba me qoş kirin anîn.

Delû Kemal got; *"Wîyayî li erebê bikin."*

Gundîyan bavê min li erebê kir. Bi xwe nekarîbû rabûya, ji lêdanan bûbû mîna cenaze.

Delû Kemal got;

*"Hûnê nuha vî merivî bibin mala wî, pezekî serjêkin, postkin, lingê wî bikin nav wî postî. Wê zû sax bibe."*

Peyra vegerîya ser bavê min û got;

*"Ûlan aferîn sana. Gözum senî tûttû. Haydî yalla!*

(Kuro aferin ji te ra. Tu ketî çavê min, haydê here yallah)".

Me jî ereba xwe ajot û em hatin malê. Me bizinek serjêkir, lingên wî xistin postê bizinê. Lingê wî di hefteyekî da ancax pak bûn.

A de welle min ew zalima wusa dît.

## ŞERÊN LI ÇÎYAYÊN BATMANÊ Û MÊRDÎNÊ Û KUŞTINA SEYÎDXAN

Firarên Berazan û Seyîdan piştî şêrê Qazîcelalê di gelîyê Berazan ra derbasî alîyê Bilanixê dibin. Li wê derê mufrezeke eskerîyê ya mezin tevî milîsan dîsa bi pey wan dikeve. Berêvarekî li çîyayê Qazanayê li hev dixin û şer çar-pênc seetan dom dike. Dawîyê da firar esker û milîsan têk dibin û xwe ji çembera wan xilas dikin. Ji esker û milîsan gelek kes têne kuştin, gelek jî birîndar dibin. Ji fıraran jî çend kes tên kuştin û çend kes jî birînda dibin. Birayê Seyîdxan Tewfîq jî ji milê xwe da birîndar dibe.

Firar ji wê derê derbasî alîyê Milazgirê dibin û ji wir jî derbasî çîyayê Mûşê dibin. Esker û milîs dîsa dikevin pey wan û gav bi gav şopa wan digerînin. Qîyameteke wusa li serê wan radibe ku êdî ew jî ji canê xwe bêzar dibin. Li vê derê em dîsa dora pirsê bidin Fesihê Mihê Mîrze;

- Em êdî ji canê xwe bêzar bibûn. Li çîyayê Mûşê me bi hevra xeberda. Em li ser çareserîyekî fikirîn. Ji xeynî çûyina Sûrîyê me tu çare nedît. Dawîyê da me qerara çûyina Sûrîyê da û em berbe çîyayê Talorîkê bi rê ketin. Me xwe gîhande çîyayê Talorîkê, hekîmên gundî hatin birînên birîndarên me derman kirin. Panzdeh roj şûnda gava ku birîndarên me hinekî pak bûn em ji wir bi rê ketin û berbe Batmanê çûn. Ew devera hetanî Batmanê gişt çîyayekî pir asê bû. Em jî di nava çîyan ra derbasbûn. Em şevekî piştî nîvê şevê di mintîqa eşîra Bekira û Reşkotan ra buhurîn û me xwe gîhande perê şetê Dîyarbekirê. Li wir me şivanek ji xwe ra kir rêber, wî em birin cîhekî delav.

Em bi zor û zehmet di ava Dîcleyê ra derbasbûn. Em demekî meşîyan, pey ra me xeber hilda ku hukûmat ji me hayî-

dar bûye. Û qolordîya Dîyarbekirê, alaya Sêrtê û eskerê Midyatê kişandine çîyayê Mêrdînê. Ji alîyê Ruha û Swêregê jî esker şandine wira. Em ku bê rawest meşîyan, bi sibehê ra em ketin nav eşîreta Silîva. Gundîyên wê hêlê jî çek û silehên xwe hildabûn û bi esker ra derketibûn pêşîya me. Me him şer kir, him jî rê diqedand. Şer hetanî êvarê bi wî avayî dom kir. Ji me tiştek bi kesekî nebibû. Lê ji esker û gundîyan zêde zêde kes hatibûn kuştin û birîndar bibûn. Berêvarê em ketin nav eşîreta Baravan. Gundîyên wê derê tevî mudûrê nehîyê û qomitanê qereqolê û esker reşandin me. Me demeke dirêj bi wan ra jî şer kir. Eşîreta Baravan jî sitarî li me nekiribû. Me berbe çîyayê Mêrdînê meşa xwe domand. Berî serê sibê me xwe gîhande çîyayê gundê Cilînê. Panzdeh-bîstê Tirmeha 1932yan bû, li çîyê jî dilopek av tunebû. Hewa pir germ bû û tîbûnê em ji qudûm da xistibûn. Çend roj bûn ku xew jî neketibû çavên me. Ji ber tunebûna avê me qerara xwe guhert ku emê berbi başûr da herin. Em ku bi qasî seetekê meşîyan, em rastî pala hatin. Wê demê me hew dît ku teyarên eskerîyê hatin ser me. Teyare ewqasî nizm difirîyan, me eskerê di hundirê teyaran da didîtin. Li cem palan du kuzên avê hebûn. Wana kuz dane me. Em lê xebitîn ku avê vexun, kuzik di destê me da şikîyan, ava wan jî rijîya erdê. Pala li alîyê jêr cîhek nîşanî me dan û gotin;

*"Li wir av heye. Herin li wir avê vexun. Him ji bo avê, him jî ji bo ku hûn xwe ji wan teyaran xelaskin xwe berdin nav mêşe."*

Em çûn wira, me ji bîrê av kişand, me têr av vexwar pey ra me hespên xwe avdan. Hê avdana hespan xilas nebibû, me hew dît ku bi qasî panzdeh esker û sivîlek berbe me tên. Bi qasî dused metreyî nêzîkî bîrê bûn, sekinîn. Ji hevalên me çend kesan cilên esker li xwe kiribûn. Ji me yên bi cilên sivîl, me xwe di nav mêşe da veşart. Yên bi çekên esker li ser bîrê man.

Ew ku hatin nêzîk, deng li hevalên me kirin;

*"Hûn kî ne? Bi ku va diçin?"*

Ji hevalên me Evdilezîzê Hido cilên zabitan li xwe kiribû û pir baş jî bi Tirkî xeberdida. Ewê ku deng li wan kiribû başçawîş bû. Evdilezîz bi hêrs jê ra da çîra got;

*"Olo kurê kerê tu çawîş î, ez zabit im. Tu çawa pirsan ji min dikî?"*

Evdilezîz ku wusa got, çawîş jî tivinga xwe avêt ser milê xwe û berbe me hat. Gava ku hinekî din nêzîk bû wê demê wî fêhm kir ku em esker nînin, hema tivinga xwe ji milê xwe anî xwarê ku gulle berde me. Me gazî kirê;

*"Teslîm be, xelasîya te tune, tuyê bê kuştin!"*

Guh neda me û ew hate kuştin. Me deng li wanê din kir. Di nava wan da tivingek otomatîk di destê yekî da bû. Ewî hema xwe avêt erdê û berê otomatîkê da me. Şirît avêtê ku bireşîne me, kurê Elîcan Mihemed Reşîd firsend nedayê, Çawa ku avêtê bi derbekî da ew wergerand. Lê nehatibû kuştin. Gule li çoka wî ketibû. Li ser wê ew panzdeh esker teslîm bûn. Bi her eskerekî ra sed û pêncî fîşek hebûn. Hezar û şeşsed fîşek jî li ser otomatîkê bûn. Me çek û silehên eskeran jê sitand û em li hespên wan yên ne westîyayî û zexm sîyarbûn û em ji wir qetîyan. Me esker jî gişt serbest berdan. Em hinekî di nava çîyê da çûn, me bala xwe dayê ku di nava mêşe da eskeran mînanî lêmiştê li pêşîya me kozik girtine. Li wan çîyan û banîyan, me berê xwe da kîjan alî, ji wî alî li me reşandin. Eskeran mînanî teyroka biharê gule bi ser me da dibarandin. Li tu alî cîyekî ku em pê da herin tunebû. Em jî mecbûr ketin musademê. Şev kete ser me. Hinek hevalên me birîndarbûn. Em bûne sê beş; beşek li pêşîyê, yek li pey, me birîndar jî hildabûn nav xwe. Beşa paşîyê jî ya pêşîyê

diparast. Piranîya hespên me hatibûn kuştin. Ji alîyê din da jî germê emana me biribû. Ji xwîhdanê me nekarîbû çavên xwe vekira. Devên me zuha bûbûn, zimanên me di devên me da bibûn mîna kulav, nema digerîya. Qîyamet li serê me rabibû. Evaya çi zulm bû ya rebbî?...

Lê me bi mêranî şer dikir. Dibû ku em gişt bihatana kuştin lê meyê postê xwe jî erzan nedaya. Hetanî wê demê ji wana gelek kes hatibûn kuştin. Me him şer dikir, him jî rê dikuta. Hetanî piştî nîvro me bi wî teherî şer kir û em dimeşîyan. Piştî nîvro, me xwe gîhande perê ava Şêxan. Çemê Şêxan çemekî piçûk bû, li derdora wî tev darên sipîndarê hebûn. Li serfêza avê zinar û xilxile hebûn. Li wê hêlê em dîsa bibûn sê beş, me şer dikir. Li milekî Seyîdxan û çend kes, li milekî ez û Evdilhemîd û Evdilbaqî û Mehmûdê Elî, li milê din jî hevalên din bûn. Me demekî li wir jî şer kir, lê em ji hev qetîyabûn. Em ku hatin cîhekî, gotin;

*"Silêmanê Elî hatîye kuştin!"*

Em çûn ser cenazeyê wî ku em wî defin bikin. Me bala xwe dayê ku Silêman xedar birîndar bûye lê hê nemirîye. Silêman gazî Evdilhemîd kir û got;

*"Di bextê te da me ku tu min li vir nehêlî!"*

Evdilhemîd got;

*"Xem neke, em te li vir nahêlin!"*

Me seetekê li ser Silêman şer kir. Dawîyê da min ji Evdilhemîd ra got *"Heyran, ji bo merivekî emê gişt bên kuştin. Em herin!"*

Birayê wî jî got; *"Em herin!"*

Evdilhemîd got; *"Hûn diçin herin. Ez nayêm!"*

Di dawîyê da Evdilhemîd got; *"Ezê bikevim bin milê wî,*

*wî bibim, bila Fesîh jî li pey min bê."*

Evdilhemîd ket bin milê Silêman û min jî da pey. Me ew daxist devê avê. Hespên me bi piranî hatibûn kuştin, yên mayî jî westîyayî bûn. Me êdî nema karîbû ew bibira cîhekî din. Me birîndar di nav zinaran da vêşart, ji çem hinek av vexwar û em di nav çîyê da berbe başûr meşîyan. Li serê çîyê em rastî Seyîdxan û hevalên din hatin. Ji êvarê ra hê seet û nîvek zeman hebû û wana li wir hê şer dikir. Ji hevalên me sê kes hatibûn kuştin. Birazîyê Seyîdxan Mistefa, Sidîqê Heso û Mihemedê Hesê winda bûbûn.

Em ji wir berbe Mêrdînê meşîyan. Tarîyê hê erd negirtibû. Em li nêzîkî gundê Keferderê ketin kemînê. Alayek esker rêya me birîbû û em ketibûn nav esker. Ji her alî da direşandin me. Sê hespên me bi wê reşandinê hatin kuştin. Hew me dît ku Elîyê Malîwarê jî birîndar bûye. Elî deng li Seyîdxan kir û got;

*"Ez di bextê we da me, min li vir nehêlin."*

Esker bê rawest direşande me. Seyîdxan kir ku berbe wî biçe, min gazî kirê;

"*Eman apo raweste. Tuyê bê kuştin.*"

Seyîdxan guh neda min û hespê xwe berbe Elî ajot, çû. Ew ku çû, min jî hespê xwe ajot û da pey wî. Esker him bi mawzeran him jî bi silehên otomatîk va direşande me. Wê demê min hespê xwe ajote bin dareke mezin. Gulleyên otomatîkan çiqîlên darê tev birîn û bi ser min da hatin xwarê. Min hew dît ku hespê Seyîdxan zengûvala hat, di ber min ra derbasbû çû. Min tê derxist ku Seyîdxan hatîye kuştin. Min deng li hevalan kir;

*"Werin! Seyîdxan hate kuştin."*

Birayên Elîcan Evdilhemîd û Feyzula kurapên wî Evdilezîz û Sulhedîn, Elîyê Feqî Silê, birayê Seyîdxan Tefîq û Şêxoyê Seyidî vegerîyan, hatin. Em çûn ser Seyîdxan. Seyîdxan xedar birîndar bibû. Gulle ji alîyê rastê da li kêleka wî ketibû, di alîyê çepê ra derketibû. Ji birîna wî qet xwîn nedihat. Xwîn diherikî hundirê wî. Demekî şûnda Mihemed Reşîdê kurê Elîcan jî hat cem me. Tewfîq birîndar bû, nekarîbû şer bikira. Wê demê Evdilhemîd wezîfa şerkirinê da min. Mihemed Reşîd, Evdilezîz û Sulhadîn û got;

*"Hûn bi esker ra şer bikin, emê jî bi Seyîdxan ra mijûl bibin."*

Me bîstekî şer kir, Evdilhemîd û wanên din jî Seyîdxan birin. Gava ku wana Seyîdxan ji wir bi dûr xist. Dem ji nîvê şevê derbas bibû. Seet dihate duduyan. Êdî deng ji esker jî birîyabû. Şer jî sekinîbû. Em ji cîhê xwe rabûn, çûn cem hevalên xwe. Hevalan Seyîdxan anîbûn bin dareke mezin danîbûn. Seyîdxan ji ber birîna xwe gelekî diêşîya, digot; *"Avê bidine min!"*

Digot û dinalîya. Serê sibehê min ji wan ra hespek girtibû, anîbû. Heqîbek li ser pişta hespê bû, lê min qet lê mêze nekiribû. Gava hespê xwe loqand min nihêrî ji heqîbê dengê loqe loqa avê tê. Min heqîb vekir lê nihêrî ku di heqîbê da cewdikek av heye. Min cewdik ji heqîbê derxist û da Seyîdxan.

Seyîdxan piştî ku ava xwe vexwar, ji min pirsî; *"Te ev av ji ku anî?"*

Min çawa anîyê, jê ra got. Paşê Evdilhamîd ji Seydxan ra got *"Emê te bibin cîhekî munasib, emê li ser te şer bikin heta ku dawî li me werê."*

Seyîdxan got;

*"Ji bo merivekî mirî, meriv xwe nade kuştinê. Ez hema waye mirî me. Xêra min ji we ra tune. Heger ku ji destê we tê, hûn xwe û birayê minê birîndar xilas bikin. Bila zurîyeta me neqele, ji ortê ranebe. Em pênc bira bûn, sê hebên wî di ber Romê da di şerê Ûris da hatin kuştin. Êdî kes ji me nema. Ez çi bêjim, xwedê vê zulmê qebûl neke. Xwedê heqê me ji wan zaliman ra nehêle!"*

Pey ra yek bi yek li me giştika helal kir û Kelîmeî şahadeta xwe anî û got;

*"Hûn êdî herin, nesekinin!"*

Me du hevalên bê hesp, Elî û Hamoyê Heftmexela li ser Seyîdxan hişt. Me pênc tiving jî dane cem wan, me got; *"Sibetirê Seyîdxan bibin gundekî, tivinga bidin wan bila li Seyîdxan mêze kin, herge ku silamet bû, bila ji me ra xeberê bişînin. Emê paşê ji Sûrîyê werin wî hildin bibin."*

Kurê Elîcan yê piçûk Hecî Sulêman jî ji min ra qala kuştina Seyîdxan kiribû. Gotinên wî û yên Fesîh wekî hev in. Lê Fesîh qal nake, ewî gotibû, *"Apê minê Evdihemîd bi xwe çûye bi gundîyan ra xeberda ye."*

Li gor gotina Şêx Qîyasedîn (Emre) Seyîdxan li gundekî nêzîkî Sultan Şêxmûs wefat kirîye. Gundîyan ew li wê derê defin kirîye. Nebyê Seyîdxan Hecî Sulhedîn jî got *"Mezelê Seyîdxan nêzîkî Sultan Şêxmûs e. Em hertim diçin ser."*

Kilama ku li ser kuştina Seyîdxan hatîye gotin, bi sitrana Sidiqo awha ye;

***AXAO AXAO***

*Axao axao axao axao...*
*Sibe ye dilê minê bi kul e*

*Bi xem e, bi birîn e*
*Ji bona Bavê Silho*
*Maqulê Seyîdan*
*Îro dîsa daye pêşyê*
*Hela rabe*
*Darê dûrbînê ji malê bîne*
*Ezê bi çîyayê Talorîkê*
*Bi Kêlê Qijika*
*Bi Kurtika Mûşê*
*Bi Girê Resûla*
*Bi neqebê Seyida diketim*
*Li ber çavê mi îro*
*Bi temamî kire reş e...*

*Min di sîyarekî seklavî*
*Devê Alemanê kutaye nava guhê seklavî*
*Xwe daye selefê sîyara*
*Ewî xweşmêrê hanê*
*Mînanî gamêşekî boxe*
*Bîhna barûtê bi ser ketîye*
*Daîm hicûmê dajo pêşyê...*

*Ezê li êrişa wî mêze dikim*
*Seîdê Nado ye*
*Bi timtêlê*
*Cindîyê Dirbo ye*

*Bi girêdanê*
*Hecî Mihemedê birê Mihê Kûzo ye*
*Bi qama çûyinê*
*Gula mala Emer, bavê Koroxlî kekê Fetê ye...*

*Ezê dîsa bi darê dûrbînê meze dikim*
*Welle ev êrişa hanê*
*Erişa Seyîdxan bavê Silho apê Dewrêşê min e axao...*

*Axao axao axao...*
*Wê sibengê ezê bi Kurtika Mûşê diketim*
*Min dî li Girê Resûla welle şer e*
*Tu bala xwe bidê*
*Eskerê Romê lê dikişe li hev digere*
*Min di sîyarekî seklavî*
*Devê Alemanê kutaye nava guhê seklavî*
*Xwe daye selefê sîyara*
*Mînanî gamêşê boxe*
*Bîhna barûtê bi ser ketye*
*Daîm êrişê dibe pêş dixwaze şer e...*

*Ezê li êrişa wî mêze dikim*
*Seîdê Nado ye*
*Bi timtêlê*
*Cindîyê Dirbo ye*
*Bi girêdanê*

*Rizayê Xalit gula mala Emer*
*Bavê Koroxlî kekê Feto ye*
*Bi xudê kim ew êrişa hanê*
*Ya apê Dewrêş bavê Silho Seyîdxanê Kerr e axao...*

*Heyla axao axao axao...*
*Te şalvar şîno*
*Şalê Midyatê li ser berdao*
*Heyfa çavê reş û belek*
*Di axa sar da mao*
*Kul û keserê welatê Serhedê*
*Dîsa di dilê te da şax û reh berdao...*

Derheqê derbasbûna wana Binxetê da Fesîh waha dibêje;

- Em ku ji Seyîdxan qetyan û meşîyan, me nizanîbû ku em ku da diçin. Me rê dernedixist û me nizanîbû ku em li kîderê ne. Em ku hatin ber avekî, me dengê merîyan bihîst. Pey ra me nihêrî wa ye du meriv, 5- 6 ker li pêşya wan in, ji wê da tên. Beşek hevalên me ku cilên esker li xwe kiribûn, me bi wana ra bi Tirkî xeberda. Me wekî cendirmê dewletê xwe nîşan da. Me got; *"Yek ji we bi me ra were hetanî Mêrdînê, rê nîşanî me de!"*

Ji me ra gotin; "Em mêrkê rêncber in, karê me heye, ev rêya hanê rasterast diçe Mêrdînê, hûn bi serê xwe dikarin herin"

Em (wekî karmenden dewletê) li wan hêrs ketin, me bi Tirkî got; *"Haydê bidne pêşya me, zêde xeber nedin!"*

Yekî deng li hevalê xwe kir, bi Kurmancî got ;

*"Tu keran bajo here, ez rê rayî van bênamûsan bidim û werêm."*

Pey ra kete pêşya me û meşîya. Em ku demekî çûn, me got;

*"Em rastîyê ji vî zilamî ra bêjin. Em ku nebêjin wê paşê rasterast me bibe nav Mêrdînê."*

Me deng lê kir û got;

*"Raweste... emê tiştekî ji te ra bêjin."*

Mêrik ku sekinî, me got;

*"Hal û mesele awha awha... em firar in û diçin Binxetê. Tu hetanî sînor me bibe, emê heqê rêberya te bidin. Lê bi me ra pere tune, tivingên zêde henin, em tiving bidin te."*

Mêrik got; *"Hunê du tivingan bidne min."*

Me got; *"Temam."*

Wî got; *"Hûnê tivingekî niha bidin, ezê wê li vir veşêrim, ya dinê jî li ber sînor."*

Me tivingek anî dayê. Bi qasî dused gav ji wêda got;

*"Ezê vê bibim di nav wê xermanê da veşêrim, paşê ku hatim derxim bibim."*

Wî tiving da destê xwe û berbe xermanê meşîya. Ez jî pê ra çûm. Em ku çûne ber têca xermanê, wî nemerdî hema ji nişkê va tiving rastî ser min nekir? Min yeqîn bawer kir ku ewê berî min de. Ez li ser hespê bûm. Min jî tivinga xwe rastî ser wî kir, serê xwe kire nav bijûyê hespê û serkinîm. Min di dilê xwe da got;

*"Hetanî ew neteqîne ez bernadimê. Paşê hevalên bêjin tirsîya û ji tirsa xwe lê xist, rêber kuşt."*

Ez ku wusa sekinîm, wî dest avête mekanîzma tivingê,

zivirand ku fîşengê bavêje namlîyê. Ewî dît ku xizna tivingê vala ye, fîşeng tê da tune, ew di cî da miçiqî û ma. Min mînanî ezraîlê kullê awir avêtinê û deng lê kir;

*"Bikeve pêşya min alçax!"*

Ewî tivinga destê xwe avête nav têca xermanê, da pêşya min. Em ku hatin cem hevalan, min ji Evdilhemîd ra got;

*"Hal-mesele waha!.. Herge ku fîşeng di tivingê da hebûya vî dê ez bikuştama!"*

Evdilhemîd got;

*"Na lo! Te xelet fem kirîye, bi lêxistina te çîyê biketa destê wî?"*

Min got;

*"De ez bêjim, paşê nebêjin te negotîye. Eva merivekî seqet e, wê tiştekî bîne serê me."*

Hevalan ku rewşa wî girîng nedîtin, ew dane pêşyê û em meşîyan. Ewî em kûda dibirin, kivş nebû. Em êpê meşyan, li cîhkî me nihêrî dengê ewte ewta kûçikan tê. Rêber got; *"Li vira mixare henin, havînan gundî ku derdikevin waran, tên dikevin wan mixaran. Sînor hê dûr e, em îşev xwe nagihînine. Ew gundîyên ku di mixaran da ne, nas û dostên min in. Em îşev li cem wan bimînin. Îstirehet bikin, sibehê herin Sûrîyê. Ez berê herim mêze bikim, paşê werim we bibim."*

Em pê bawer bûn û me ew şand. Du hevalên me jî pê ra çûn. Ew ku çûn, em jî ji hespên xwe peyabûn û me xwe dirêj kir. Em ku wusa westîyabûn, di xew ra çûbûn. Demekî şûnda hevalên me hatin em hişyar kirin û gotin *"Kurê kerê revî."*

Wan deran mêşe bûn. Rêber li pêşya wana di nav mêşe da xwe wunda kirîbû û lê xistîbû û çûbû. Wê demê Evdilhemîd got; *"Me neheqî kir, guh neda te. Dême ku fîşeng di tivingê da*

*hebûyana wî kurê kerê wê tu bikuştaya."*

Li binya me newalek hebû. Em rabûn daketin newalê û meşîyan. Me nizanibû ku em li kîderê ne û ku da diçin. Em westîyayî û perîşan bûn. Me qerar dayê ku wê şevê li wir bimînin û westa xwe daynin. Em ji hespan peya bûn, me hespên xwe girêdan û em razan. Bi zirîqandina tavê ra em hişyar bûn. Em rabûn û berbe başûr meşîyan. Em ku hatin perê gundekî, li nava baxên gund peya bûn. Navê gund Kabala bû, 2 seet nêzîkî Mêrdînê bû. Li wir em rastî du zilaman hatin. Yek şêst-heftê salî bû, yek jî bîst û pênc salî. Ji ber ku cilên eskeran li me bûn, ji wan wetrê em esker in. Me ji wana ra bi Tirkî got;

*"Rêberya me bikin û me bibin Mêrdînê."*

Ji me ra gotin *"Pozê Kela Mêrdînê wa ye ji vir dixuyê. Bikevin vê rêya hanê, wê rasterast we bibe Mêrdînê."*

Me di nav xwe da xeberda û qerar dayê ku rastîyê ji wan ra bibêjin, belkî me bibin Sûrîyê. Me ji wan ra rewşa xwe got; *"Em firar in, ji ber zulma hukûmatê me zar û zêrçên xwe terikandine, em bi serê çîya û banya ketine. Em dixwazin ku derbasî Sûryê bin. Ji bo riza xwedî alîkarîya me bikin."*

Ew jî li me şaş û matel man, wana got;

*"Dozdeh hezar esker ji bo we li van çîyan û banyan hewirî bû, hûn çawa xilas bûn. Xilasya we mûcîze ye."*

Me ji wan ra got;

*"Erge hûn alîkarîya me bikin, emê du tivingan bidin we."*

Ewê ciwan got;

*"Çi dide bila bibe, mirin jî tê da be ezê alîkarîya we bikim. Hûn tivingekî bidin apê min bila ew here, ezê bi we ra werêm."*

Me girt tivingek da apê wî, yek jî tevî pêncî fîşengî da wî

û da ser rê.

Ew lawik meriwekî bi culet bû. Ewî em birin gundê Tuxupê. Li wir me dîsa xwe wekî eskerê dewletê da nasîn. Wana hema ji me ra sifre danîn, me bi têra xwe nanê xwe xwar û em ji wir bi rê ketin. Ji dûr va elektirîkên bajarokekî dişixulîn. Xort got;

*"Ewa Amûd e."*

Em sê-çar seetan meşyan, hatin li ber sînor li perê gundekî sekinîn. Navê gund Zîdî bû. Em pir tî bûbûn. Hinek hevalan gotin;

*"Em herin nava gund avê vexwin."*

Şêx Baran got;

*"Sebir kin, em derbasî Sûryê bin, li wir avê vexwin. Li van gundên ber sînor herkes bi silah in."*

Tam li perê gund, merivên bi sileh derketin pêşya me, pirs kirin;

*"Hûn kî ne?"*

Me got;

*"Em esker in."*

Wana bawer nekir, gotin; *"Hûn ne esker in."* Û gulle reşandin me. Bi reşandina wan va du hespên me û hevalekî me birîndar bûn. Mecbûr me jî gulle berî wana dan. Me ku şer kir, ew li ber me zêde tamîş nebûn. Me berî wana da û ew kirin nav gund. Pey ra jî me erişî nav gund kir û ew ji gund derxistin. Gişt revîn çûn, me nihêrî du kes jî ji wan birîndar bûne. Axayên gund Ferhanê Ezîz û yekî din bû. Em êdî têkilî wan nebûn. Me lez kir ku zûtirê em ji sînor derbas bin û ji wê hêlê dûr kevin. Çimkî divîyabû ku li yalê din jî merivên wana hebûn.

## LI SÛRÎYÊ

"Em ku ji sînor derbas bûn, çûne cem serokê eşîreta Milan Îsa Axa. Îsa Axa çû Qamîşloyê bi Firansîyan ra xeberda. Pey ra karmendên Firansîyan hatin û em birin Qamîşloyê û wekî multecî em qebûl kirin. Sîlehên me ji me girtin. Heftekî pey ra firansîyan em serbest berdan. Birayê Seyîdxan Tewfîq û merivên wî çûne gundê Talikê cem meryên mala Cemîl Paşa. Berazan li cem Îsa Axa man, ez jî li gundê Sincaqê li cem Mele Fetula mam. Kurapê Elîcan Evdilezîz û Sulhadîn jî li cem min man.

Ew sê hevalên me yên ku di dema şerê çîyayê Mêrdînê ji me qetyabûn û winda bûbûn, ji wana Mistefa jî paşê hate Sûrîyê cem me. Ew ku ji me diqetin û winda dibin, diçin gundê Avrihanê. Gundî wana li wir digrên û dibin teslîmî hukûmatê dikin. Mistefa ku mecalê dibîne, direve xwe xilas dike. Cendirme Sidîq û Mihemed dikûjin.

Min qala birîndarbûna Sulêmanê Elî kiribû. Wexta Seyîdxan hatibû kuştin, ew jî xedar birîndar bûbû, me ew li ber çemê şêxan veşartibû. Esker wî nabînin, ew bi wî halê xwe yê birîndar va panzdeh rojan li wir dimîne. Wusa dibe, kurm dikevin birîna wî. Rojekî xortekî ku pezê xwe li wêderê diçêrîne, rastî wî tê. Lawik diçe xeberê dide bavê xwe. Bavê wî tê Sulêman dibe mala xwe, bedena wî, birîna wî dişo, pak dike û hetanî ku Sulêman hinekî pak dibe lê mêze dike. Sulêman dibêje;

*"Gelo kes tune min derbasî Sûrîyê bike, bibe bighîne hevalên min?"*

Ji firarên alîyê Mêrdînê, firarekî bi nav û deng Elyê mala Bêzarê dibêje;

*"Ezê wî bibim."*

Ew Sulêman hildide tîne Sûrîyê cem Tewfîqê birayê Seyîdxan. Kurm ketibûn birîna wî û bîhn jê dihat. Hevalan Sulêman li texsîyekî sîyar kirin, birine Şamê. Sulêman di nexweşxana Firansîyan ya eskeryê da emelyat kirin. Gulle ku li pişika wî ketibû, nîvê pişika wî hildidin. Sulêman piştî demekî silamet bû, lê duwazdeh sal pey ra ji ber wê birînê wî jîyana xwe wunda kir.

Çendekî şûnda ew herdu hevalên me yên ku me li ser Seyîdxan hiştibûn, Hamo û Elî, ew jî hatin Sûrîyê. Wana ji me ra qal kir. Seyîdxan ku wê şevê wefat dike, sibetirê esker rastî cinazê wî tên. Fermandarê mufrezê gazî muxtar û melayên gundê Zonê* dike, dibêje;

*"Seyîdxan defin bikin!"*

Ew jî cinazê Seyîdxan dibine gund, dişon û kefen dikin û li wêderê defin dikin.

Ew herdu hevalên me jî tivingên xwe vedişêrin, dikevin dilqê feqîran û bi wî karî tên derbasî Sûryê dibin.

Berya hatina me, Seyîdxan kulfeta xwe û ya birayê xwe Tewfîq anîbûn li çîyayê Talorîkê li mala Şêx Fexrî hiştibûn ku şêx paşê wana bişîne Sûrîyê. Piştî hatina me, Şêx Fexrî kulfetên Seyîdxan û Tewfîq jî şandin Sûrîyê.

---

** Seyîdxan, nêzikî gundê Zonê hatîye kuştin û merzelê wî sê kîlometre ji Sultanşêxmus dur e.*

## VEGERA TURKÎYÊ

Di Tirmeha sala 1933yan da firarên Berazan û Seyîdan kom dibin û qerara vegerandinê hildidin. Di bîraninên xwe da Fesîh dibêje; *"Em li Sûrîyê bi sedemên aborî perîşan bibûn. Loma me qerara vegerandinê hilda."*

Ji wana 24 kes vedigerin. Birayên Elîcan Evdilbaqî, kurapê wî Evdilezîz û Sulhedînê Hido û çend kesên din li Sûrîyê dimînin. Firar di alîyê Mêrdînê û Batmanê ra derbasî çîyayê Talorîkê dibin. Ji wîr jî diçin alîyê Mûşê. Rêwîtîya wana gelek bi zehmet dibe. Li çîyayê Talorîkê diçin mala serokê eşîreta Xîyan Emerê Mihê. Li gor gotina Fesîh, kurên Emerê Mihê wana bi rêz û hurmet pêşwazî dikin û ji wana ra pez serjêdikin. Kurên Emerê Mihê ji Evdilhamîd û Tewfîq ra Dibêjin; *"Hûn sala pêrar hatin me hûn xweyî kirin. Êdî neyên van deran. Hukûmatê bihîstîye û zor tedayê li me dike. Hûn ku careke din werin, serê me yê bikeve belayê. Herge hûn werin, emê ji tirsa xwe, ji hewla rihê xwe li we xin. Neyên!"*

Firar westîyayî û bê hesp, têne alîyê Dêrxas. Di dema vegerê da dîsa esker û milîs pey wan dikevin û hespên wana gişt têne kuştin. Li vir em dîsa guh bidin gotinên Fesîh;

- Em ketin nav wan gundan, me ji xwe ra çend hesp peyda kirin. Pey ra em li çîyayê Seyîdan çûne zozanên Qeremêşê, li wê derê em çûn li konê tucarekî bûn mêvan. Camêr ji me ra bi hurmet xizmet kir. Pezek serjêkir, nan da me. Li wê derê me xeber hilda ku ji eşîreta Bilka gundîyên

Çolesorê bûne milîs. Hukûmatê çek û sileh dane wana, ew jî li der û dorên xwe tedayê dikin. Em ji wir bi rê ketin, çûne gundê Çaqsorê. Ew jî bûbûn milîs. Li perê gund ez, Elî, Sebrî û Edo ji hevalan qetîyan, çûne nava gund. Cilên eskeran li me bûn. Li ber mala pêştahatîyê gund me ji wana ra got,

*"Çeta Seyîdxan ji Sûrîyê hatîye vê hêlê, yuzbaşî gazî we dike. Lê gera hûn bi çek û silehên xwe va werin."*

Gundîyan çûn çar mawzer hildan, anîn. Wê demê hevalên me yên li perê gund jî bi êrîş ketin nava gund. Me nehişt kes ji cîhê xwe bilipite. Bê şer me çek û silehên wana sitandin û em ji wir bi rê ketin, çûne gundê Koxakê. Wê êvarê em li wir man. Berbe serê sibehê em ji wir rabûn, çûne gundê Boyikçapxûnê û wê şevê jî li wir man. Li wê derê me xeber hilda ku gundîyên Elûcarê bûne milîs û di gund da esker xweyî dikin. Elûcar gundê herî dewlemendê wê hêlê bû û gelek ji hespên wana hebûn. Me qerar dayê ku em herin êrişî gund bikin û hespên wana bi zorê hildin, bibin. Wê şevê em ji wir bi rê ketin û me berê xwe da Elûcarê. Bi qasî sê seetan em meşîyan û me xwe gîhande gund. Em ku hatin perê gund, gundîyan gazî me kir, gotin;

*"Neyên gundê me!"*

Wê demê esker û milîsan bi hevra reşandine me. Me jî reşande wana û êrişî gund kir. Şer zêde dom nekir. Sidîqê Arif ku ji alîyê Evdilhemîd va hate kuştin, esker û milîsan çare di revê da dîtin. Çawîşê qereqolê jî tevî çend neferên xwe revîn çûn. Me çatereîsê milîsan û mudûr jî dîl girtin. Me ku gund zeft kir, piranya hespên wan hildan û em ji wir qetyan.

## RÊWÎTÎYA SARÎQAMÎŞÊ Û ŞERÊ KOSEDAXÊ

Firarên Berazan û Seyîdan piştî Elûcarê, diçine Gelyê Berazan. Li wêderê qerara xwe didinê ku herin alîyê Sarîqamîşê, tîrana postê bişêlînin. Ew ji Gelî derbasî deşta Parsînê dibin, ji wir jî diçin alîyê Sarîqamîşê. Disa Fesîh vaha dibêje;

- Aborîya me ne baş bû. Em têkilî xelkê belengaz nedibûn û me tu kes nedişêland. Ya baş, em tîrana dewletê ya postê bişêlînin û aborîya xwe baş bikin. Meyê nêzîkî Sarîqamîşê di nav mêşe da xeta tîranê xirabkira. Tîren bida sekinandin û bişêlanda. Wexta ku em di nav mêşe da çûn ber xeta tîranê, yekten memûrên mêşe û milîs derketin pêşîya me û em dane ber gulla. Me jî ku reşande wan, ji wana Bayramê Çerkez hate kuştin û ewên din jî revîn. Bi wê qevimandinê va êdî herkes bi me hisîya û me dev ji şelandina tîranê berda. Em paş da vegerîyan. Emê dîsa derbasî alîyê Milazgirê bûbûna.

Em bi lez û bez êpê meşyan û hatin gundekî. Navê gund Gom bû. Em pir westîyabûn û birçî bûn. Me li wir nanê xwe xwar û hetanî êvarê li wir man û westa xwe danî. Wê êvarê em ji wir bi rê ketin û me berê xwe da Çîyayê Kosedaxê. Bi serê sibê ra me xwe gîhande quntara çîyayê Kosedaxê. Em rûniştin, me hinekî bîhna xwe da. Pey ra me bi dûrbînê li der û dorê xwe mêze kir. Me hew dît ku eskerekî gumrah berbe çîyê tê. Tu nebê piştî wê bûyera di mêşê Sariqamîşê da hukûmatê alaya Sarîqamîşê ya bi navê *"Mizrakli Alayi"* pey me xistîye. Emê mecbûr bi alayê ra biketana şer. Ji bo şer me Girê Şehîd ji xwe ra kivş kir û em ketin kozikan. Berya nîvro şerê me dest pê kir. Em bûne du birra. Birra me ez, Mihemed Reşîdê Elîcan, Elyê

Feqî Silê û çend hevalên me yên din bûn. Beşa din jî Tewfîq, Evdilhemîd û 10 hevalên me bûn. Şerê me demekî dom kir û hingî çû giran bû. Bi eskerên li milê me ra du mitralyoz, du-sê heb jî *"makînelî"* hebûn. Mîtralyoz û makînelîyan emana me biribûn. Qîyameteke wusa rabûbû her xwedê bizanibe. Şer ku giran bû, hevalekî me yê ji Qaxizmanê li cem min bi gulekî va welgerya ser erdê û hate kuştin. Gule li serê wî ketibû. Evdilhamîd li yalê me yê çepê tevî 10 kesan şerê parastinê dikir. Nizanim çawa bû, Evdilhemîd ji kozika xwe derket û erişî esker kir. Wê demê Mihemedreşîdê Elîcan jî ku ji kozika xwe rabû, gule lê ket û kete erdê. Mihemed reşîd di milê xwe da birîndar bû. Elyê Feqî Silê deng li min kir û got;

*"Gera Evdilhemîd êriş nekira, wextê erişê nebû, ewî xeletî kir. Lê ku rewş awha bû, gera em jî bi wî ra erişî esker kin!"*

Bi wê pirsa wî ra ez û Elyê Feqî Silê, em ji kozikên xwe derketin û me jî êriş bire ser esker. Li serfêza eskeran zinarekî sipî hebû. Me herduyan xwe avête pişt zinêr û reşande esker. Ji yalê din da jî ku Evdilhemîd û hevalên din di eynî demê de gulle reşandin, pênc-şeş esker hatin kuştin. Gelek ji wan jî birîndar bûn. Esker şikîya û dest bi revê kir. Esker ku wusa bi tomarî revî, me jî da pey. Di ber çîyê da newaleke kûr hebû. Ji bo ku em xwe ji agirê mitralyozê biparêzin, ez, Evdilhemîd, Elyê Feqî Silê û Ehmedê Mamo me xwe avête wê newalê. Me hew dît ku wa ye şeş esker bi sîh hespî va berya me revîne, hatine ketine wê newalê. Me dereqep ew dîl girtin. Me çek û silehên eskeran jê girtin, ew li hespan sîyar kirin, hespên din jî hildan destkêşê û em ji newalê derketin. Me ew hesp ji hevalên me yên bê hesp ra dibirin. Dema ku em ji newalê derketin, wê mitralyozê dîsa reşande me. Wê demê piranya hespên di

destkeşê da hatin kuştin. Eskeran jî hema xwe ji ser hespan avêtin erdê. Hespên ku ew lê sîyar bûn jî hatin kuştin. Ez jî di çîpa xwe da birîndar bûm. Wê demê min deng li Evdilhemîd kir, got *"gulle li min ket, ez birîndar bûm."*

Evdilhemîd got; *"Cehd bike xwe li ser hespê bigire ku hetanî em ji vir derkevin. Tu ku ji ser hespê bikevî, di binê vî agirî da kes nikare te xilaske!"*

Min jî hişke hişk xwe bi hespê va girt û ez neketim. Dawyê da me xwe avête newala pêşberî me û xwe ji agirê mîtralyozî xilas kir. Hevalên me yên milê din jî hatibûn wira. Bi wî karî em carke din gihîştin hev. Li alîyê Tewfîq û wan jî çend esker hatibûn kuştin. Wana jî çek û silehên eskeran hildabûn, anîbûn.

Berêvarê me birînên hevalên birîndar derman kirin, pêçan û em ji çîyê daketin Deşta Elajgirê. Emê di ser Gelyê Berazan ra dîsa derbasî alîyê Milazgirê bibûna. Hayê me jê tunebû. Dema ku em derbasî alîyê Gelyê Berazan bûn, em pê hesyan. Tu nebê wexta ku em ji alîyê Serîqamîşê vegeryane, hukûmatê texmîn kirye ku emê di Gelyê Berazan ra derbasbin, ji Qersê, Sarîqamîşê, Qerekilîsê, ji Mûşê, ji Erzurumê û Hesenqelê esker rakirîye û ew devera tijî esker kirîye.

Ew kilama ku li ser Şerê Kosedaxê hatîye gotin qala şerê Melemistefayê jî dike. Dengbêj him ew herdu şer kirîye mijara kilamekî, him jî qala wan çar qewimandinên din dike. Kilam mînanî kurteçîroka serhildanê ye. Dengbêj di vê kilamê da qala lehengên serhildanê dike û taybetî û navnîşanên wana yek bi yek rêz dike.

Bi sitrana Reso kilam waha ye;

## *WEYLO WEYLO*

*Weylo weylo weylo...*
*Ez nemînim ji mêra ra*
*Lêxin bavê bavê mino lêxin*
*Canfidayê mala Bişar û Seydo lêxin*
*Nîşan bigrên*
*Qundaxê tivinga li erdê xin*
*Dûrbînê bavêjin*
*Mûma û şemdanan vêxin*
*Eskerê Kemal giran e*
*Revê pê xin*
*Şûrê zabita jê bistînin*
*Li çerxê xin*
*Esker gune ne*
*Çavê kozî-kulfetê wan li rê ne*
*Jê kin serê yuzbaşîya û cendirma*
*Bigrin li çerxê xin*
*Li ber Qolordîya Qerekilîsê*
*Bigrin defê û dawetê*
*Miziqê ji wan bistînin*
*Ji inyata li borîyê xin*

*Weylo weylo weylo*
*Ax weylo ez nemînim li dinyayê*
*Li ber Fewzî Çaqmaq Mûstefa Kemal*

*Nedayî Bey* nezan e*
*Digo bajone pêşîya çar Kurda ne*
*Heyran were rûnê li ser têl û telxirafan e*
*Ez ji te ra bixwînim secera wan Kurdan e*
*Em ne çar Kurd in*
*Ew ku hene cerda Elîcan û Seyîdxan e*
*Li dinyayê zulma wan zulmeke giran e*
*Êrîşên wan li ser pişta hespan e*

*Gullê wan tê ji xeyban e*
*Hewarîya wan tê*
*Meriv dizane milayeketên li ezman e*
*Şerê wan ne mînanî şerê Yezîd û Mervan e*
*Mînanî şerê dewra berê*
*Şerê qehremanê qatil û dêwan e*

*Were rûnê li ser têl û telxirafan e*
*Ez ji te ra bixwînim şohretê wan e*
*Ez ji te ra yek bi yek bidim methê mêran e*

*Riza ku heye qesasê serê meryan e*

---

* Nedayî Beg ewê ku bi Dewrêş Begê ra Gelyê Zîla biriye, ew e. Piştî serhildana Berazan û Seyîdan ew jî bi Dewrêş Begê ra hatiye Gelyê Berazan. Li gor gotinê hukûmatê qerar daye ku Gelyê Berazan jî mînanî Gelyê Zîla bibire û Nedayî Beg û Dewrêş Beg jî ji bo wê yekê hatine wira. Hatina wan gel jî pir tirsandiye. Şervanên Berazan û Seyîdan jî bihîstine ku hukûmatê wê Gelî bibire. Fesîh di derbarê vê meselê da waha dibêje "Li Gelyê Berazan esker ku dora me girt, me tevdîra xwe kir ku ji xwe ra cîhakî baş kifşkin. Bi esker ra şer bikin û bi wî karî çemberê biqelêşin, xwe xilaskin. Evdilhemîd ji me ra got: Heger ku em li vê derê bikevin şer, eskerek jî bê kuştin hukûmatê wê Gelyê Berazan jî eynî mînanî Gelyê Zîla bibire. Ji ber vê yekê em bi esker ra nekevin şer. Û me xwe veşart. Piştî çûyîna esker me xwe ji wê derê xilas kir."

*Tewfîq qaçaxê sîyasetê li serê çîyan e*
*Qanûna we bi temamî dizane*
*Evdilhemîd Şêrê Bi Gulî*
*Girtîye dewsa Elîcan e*
*Feyzula birayê biçûk*
*Bi me ra dibîne dewa dewleta Elî Osman e*
*Evdilbaqî mînanî otomatîka li ser milan e,*
*Îro ji Bostankendê ji Seyida du zilam e*
*Yek Tewfîq yek Seyîdxan e*
*Seyîdxan ji jahra mêran e*
*Tewfîq jî teyarê mêran e*
*Wana canê xwe di ber dînê xwe feda dane*
*Fesihê Mihê Mîrze*
*Pelatek ewrê reş e li ezman e*
*Evdilezîz û Sulhedînê Hido du bira ne*
*Her yek ji wan xwedanê duwazdeh bomba ne*
*Elîyê Feqî Silê*
*Ji berê da karê wî nîşan e*
*Wexta ku li meydanê çog dide erdê*
*Ji te dikûje pênc canan e*
*Îro li meydanê ji te hildidin*
*Heyfa şêrê bi gulî bavê Sulêman e*

*Wey lolo wey lolo wey lolo...*

*Dîdarê digo Besê Têlo rebenê*
*Ezê bi dîyarê Qazgolê diketim*
*Mîla şebekê li mi lê da*
*Şerekî çêbûye li korta Milazgirê di Melefmistefê da*

*Esker nema di wîlayetên Romê da*
*Bi temamî hilşîyayê ser berxê mala Ûsibê Seydo*
*Mala Haî Axa*
*Seet di dudu û nîvê şevê da*
*Tekbîr selewatê mala Bişar û Seydo di herbê da*
*Ji agirê devê tivingê wan xweşmêra*
*Birq vedida mînanî birqê masîyê di bahrê da*
*Qolordîyê digo Tewfîq, Evdilhemîd, Evdilbaqî û Feyzula*
*Werin teslîm bibin*
*Emê efûya we derxin ji Enqerê da*
*Digon heyran wê da herin em efûya we nexwazin*
*Di şerê ewil da me diranê wê şikandîye*
*Şêrê bi gulî birîndar bû di şerê Kosedaxê da*
*Li textê Qereyazîyê di Çepê da*
*Şerê paşîyê me xweş kirîye*
*Li Milazgirê di Melemistefê da*
*Eskerê bavê Mihemed Reşîd kekê Sulhedîn*
*Tîpê sîyarê nazikî nazelînin li ser qaşa zîne*
*Gava çog didin erdê*
*Acara we li dinyayê diqelîne*
*Şûnda herin hûn merivên xayin in*
*Efûya we ji me ra lazim nîn e*
*Ez îro bala xwe didimê*
*Alaya bavê Mihemed Reşîd kekê Sulhedîn*
*Ji Binxeta şewitî tê ez reben bim*
*Ez çi bikim, reîsê wan di nav da nîn e*
*Hîngê min dizanîbû feleka me xayîn e, me dixapîne*
*Wey lo wey lo wey lo...*
*Wey lo wey lo wey lo...*

Di kilama ku li ser komkûjîya Gelyê Zîla hatîye gotin navê Nedayî Begê wekî berpirsîyarê yekemîn derbas dibe. Bi sitrana Reso ew beşa wê kilamê weha ye;

*Dayê rebenê*
*Dilê mi ji bona egîtê mala bavê min pepûkê*
*Fenanî pirekî*
*Li devê heft rîya duwazde newala*
*Sibe bû ezê bi dîyarê Kordîna Qerebûlaxê diketim*
*Mi dî bûkeke cahilî teze ji wê de tê*
*Kolozekî sipî di desta da*
*Qundaxake lawîn di milla da*
*Birao... digo û digirîya*
*Ez çûme pêşîyê*
*Min digo xwengê çi bû? Çi qewimî? Çi cirîya?*
*Digo lolo lolo bira*
*Ez hatime Hepsa Kela Bazîdê*
*Bo dîtîna berxê mala bavê xwe gulîkurê*
*Bira kula xwedê bi kul be*
*Têkeve mala NEDAYÎ BEGÊ*
*Wî ocaxa berxê mala bavê mi qelandin*
*Sêr bikin li destê mi pepûkê*
*Kolozê xorta mane vikî vala*
*Berxê mala bavê mi herçî kuştin*
*Yên mayî girtin surgûn kirin*
*Berê wan dane Anadolê, Sînopê, Zonguldaxê*
*Dayê rebenê nav duwela*

## ŞERÊ MELE MISTEFAYÊ

Firar diçin li Gulo nan dixwun. Gulo gundekî piçûk e. Du-sê mal in û di ber çîyayê Çaqmaqa da ye. Wexta ku derdikevin, dîyarê gund bi dûrbînê mêze dikin. Hew dibînin ku ew gundana gişt tijî esker in. Nêzîkî kîjan gundî dibin, hema esker derdikevin û wan didin ber gullan. Wekî me li jor got, ji tirsa birrîna Gelyê Berazan ew bi esker ra nakevin şer. Ji wir derbasî alîyê Xunûsê dibin. Di *"Kara sor"* ra diçine gundê Bilanixê, Şêwranşêxê.

Li wir em dîsa dora pirsê bidin Fesîh;

- Esker dabû pey me. Bêhna me çikandibûn. Tu cîh û warî sitarî li me nedikir. Em birçî, westîyayî û bê xew û mînanî qaşilê gûzekî bi ser avê ketibûn. Li Şêwranşêxê esker em kirin çemberê. Me bi esker ra şer kir. Bi halekî me xwe ji wir xilas kir, lê du hevalên me jî birîndar bibûn. Gulle li lingê Evdilhemîd ketibû. Ev cara duduyan bû ku Evdilhemîd ji lingê xwe da birîndar dibû. Ehmedê Mamo jî ji zikê xwe da birîndar bibû. Esker dev ji me bernedida. Dîsa dabû pêy me. Me xwe avête gundê Melemistefayê. Esker Melemistefa jî hilda nav çemberê. Bi qasî du hezar eskerî êrişî me kir. Esker bi bomba û mîtralyozan êrişî me dikir. Qîyameteke wusa li serê me rabûbû ku hew xwedê dizane. Hetanî nehê şevê şer dom kir. Esker êdî ketibû nav gund û çend hevalên me jî birîndar bibûn. Em gişt di xanîyekî da hatibûn ser hevûdu. Me bi hevra mişewire kir û qerar da ku em bi hev ra li cîhekî xin, çemberê biqelêşin û derkevin. Li pêşîya me kuştin hebû. Me şer nekira jî wê em bikuştana me şer bikira jî. Ya baş ew bû ku me yê bi mêranî şer bikira û emê bi mêranî bihatana

kuştin. Xem nebû. Seet di nehê şevê da me giştika bi hevra êrîşî cîhekî kir. Me çember qelaşt û me hevalên xwe yên birîndar jî hildan û em ji çemberê derketin.

Me xwe ji wir xilas kir, em wê şevê çûne gundê Nazûkê. Di pey me ra esker digrê gund bi temamî dişewitîne. Gundîyên ku mecalê bi xwe ra dibînin, direvin canê xwe xilas dikin. Esker yên mayî top dikin û giştika dikûjin. Gundî zarî dibin, lava dikin, Dibêjin; *"Firar bi zorê hatin ketin gund. Me belengazê xwedê çi dikarîbû bi wan bikira? Wa ye dewlet bi ewqas esker pêka wan nayne, tiştek ji destê me nedihat."*

Dibêjin; *"Ferqa we û wan tune. Hûn jî ji xwîna wan in!"*

Bi wî teherî esker gundîyên kal û pîr jî dibe, gulebaran dike. Du hevalên me yên ku xedar birîndar bibûn, me ew li Nazûkê hiştin. Me du tiving dane gundîyan, ji bo ku li wana binihêrin. Li ber gund gola Nazûkê heye. Di golê da jî giravek, li wê giravê şikeftek hebû. Hevalê me Evdo, birîna wî sihêl bû. Me ew hilda bire şekefta wê giravê. Em ku ji gundê Nazûkê diqetin diçin, piştî me esker tê wêderê. Esker wan herdu hevalên me yên birîndar dibin serê wan bi saxî jêdikin. Çi bi serê wî hevalê me yê dinê di şikeftê da hat, ez nizanim. Hetanî îro jî (1975) hayê min jê nebû.

Paşê me bihîst di şerê Melemistefê da gelek esker hatine kuştin û gelek jî birîndar bûne. Hinek hevalên me jî li ber wê zor û zextê nema dikarîbûn di ber xwe bidana û ji me qetîyabûn. Em bîst û çar kes mabûn.

## ŞERÊ ÇÎYAYÊ TALORÎKÊ Û KUŞTINA TEWFÎQ

Bîst û çar firarên Berazan û Seyîdan piştî Mele Mistefayê dîsa berê xwe didin başûr. Çar kes ji wan jî birîndar bûne. Berê diçin Sasonê, nav eşîretên Modkan. Li wê hêlê jî dîsa milîs bi pey wan dikevin. Ew û milîs şer dikin, piştî du rojan ew xwe digihînin çîyayê Sasonê. Li wê derê diçine mala serokeşîrê Modkan Çûroyê Mela. Çûro bi dostayî wan diezimîne. Çar kesên birîndar; Evdilhemîd, Fesîh, Mihemed Reşîdê Elîcan û Hemoyê Heftmexelan li mala Çûro dimînin. Hevalên wan yên din jî ji wir bi rê dikevin, diçine çîyayê Meleto. Fesîh dibêje;

*"Hevalên me wê li çîyayên Meleto li hêvîyê me bimana. Çendekî şûnda ku birînên me hinekî pak bûn, emê biçûna û meyê xwe bigîhanda wana."*

Ewên ku diçin çîyayê Meleto, li wir du roj-sê rojan dimînin. Paşê haspên xwe li wê derê dihêlin û derbasî çîyayê Telorîkê dibin. Li wê hêlê eşîreta Xîya hebûye. Eşîreta Xîya, bi taybetî serokeşîr Emerê Mihê berya wexta ew xweyîkirinê. Ew bi fikra dostayê diçin wira lê hêvîya wan dişikê. Bala xwe didinê ku rewş bi temamî hatîye guhertin. Serokeşîrên wê hêlê navbera xwe û dewletê xweş kirine û gişt bûne milîs. Wanên li cem Çûro li hêvîya xebera hevalên xwe heyş-neh rojan dimînin. Wê demê ew alaya ku ji alîyê Mûşê şopa wan digerîne, hatîye wê hêlê. Fermandarê wê alayê albay ji Çûro ra xeberê dişîne dibêje; *"Wan firarên li cem xwe teslîmke, ezê efûya te derxînim."*

Çimkî Çûro çil rojî berîya hatina wana bi hêzên dewletê

ra şer kirîye û sî esker û yuzbaşîyek kuştîye. Çûro bi çîr û şoran va ji albay ra xeberê dişîne û daxwaza wî red dike.

Ji wê şûnda çi bûye, çi qewimîye Fesîh di derheqê wan da weha dibêje;

- Wê demê Tewfîq bi Şêx Evdila ra (Şêxê Qorqutê) ji me ra xeber şandibû. Gotîbû; *"Em diçine alîyê eşîreta Xîyan. Bila ew jî werin wir!"*

Birîna lingê Evdilhemît hê baş nebûbû. Ew li wir ma, roja din em bi rê ketin. Çûro birayê xwe Ferman û kurapê xwe Fethî bi me ra şand. Roja din em çûne gundê Hergokê, mala Bişar. Li vir me xeber hilda ku eşîreta Xîyan bi daxwaza hukûmatê êrîşî hevalên me kirine. Em çûne hawarîya wana. Milîsên Xîyan gundê ku hevalên me tê da bûne ew hildane nav çemberê. Gund di newaleke kûr da bû. Em li jorî gund bûn. Me kir û nekir, me mecal nedît ku em herin cem hevalên xwe. Em demekî wusa di kozikên xwe da man. Demekî şûnda ez ji kozika xwe derketim ku êrişî wana kim, hevalên din nehiştin û gotin, *"Heger ku em herin, milîs wê dora me jî bigirin û emê bêne kuştin."*

Ez carek din ketim kozikê. Min serê xwe da ser qundaxa tivinga xwe û ez fikirîm. Ev çi hal bû ya rebbî... ew çi qîyamet bû ku wî wusa li serê me rakiribû. Min dixwest ku ez hema wê demê bimirim û xilasbim ji vê dinya rezîl. Herkes û hertişt li me bûbû dujmin. Hukûmat dujminê me bû, lê vî miletê me çi ji me dixwest? Çima li kuştina me digerîyan?... Wê ji kuştina me çi feyde bidîtana? Sirf ji bo ku ji hukûmatê ra şelafîyê bikin û bikevin çavê hukûmatê dujminaya me dikirin. Ne dibêjin, kurmê darê ji darê be, xêra darê tune, wê birize. Ya me jî eynî wusa bû.

Demekî şûnda birazîyê Bişar Akif hate cem me û got *"Hevalên we xwe ji çemberê xilas kirin û berbe çîyayê Lobasorê vekişîyan. Werin ez we bibim bigihînim wan."*

Akîf da pêşîya me, em çûn li çîyê gîhiştin hevalên xwe. Li wêderê em pê hesîyan ku Tewfîq û Şakiro hatine kuştin. Feyzulla û hevalekî me yê din jî birîndar bûbûn.

Kilama ku li ser kuştina Tewfîq hatîye gotin, bi sitrana Reso; waha ye.

***EZ REBEN IM***

*Ez reben im, reben im, reben im*
*Ezê bi rebena bavê Salih peyayê xerîb*
*Îro çend roj e*
*Li welatê xerîb maye, di kesirîyê da dayê*
*Dîdarê ba dikirî*
*Digo lêlê Hedyayê, wî rebenê*
*Ezê bi dîyarê pira Batmanê, çemê Xezalyê diketim*
*Ji kula dilê mi ra bi kendal e*
*Bira kula xwedê têketa mala serê sebeba*
*Emerê mihê eşîra xîya, gire girê Badika*
*Ji êvar da dor li kozika bavê Salih girtine*
*Heyla nemayê, mîratê çapilîya û mavzera*
*Ji êvara xwedê da li ser bavê Salih da*
*Zare zar û nale nal e*

*Ezê îro li vî welatê xerîb çavê xwe digerînim*
*Xortekî qalçê bavçê nabînim*
*Destê xwe li ser dilê xwe dayne*
*Bi orta çapilîya xwe bigire*
*Di gazîya Bavê Salih here*

*Ez hêsîr im reben im*
*Ez li orta meydanê*
*Ji bavê Salih ra*
*Bibim balgî û berpale dayê*

*Dîdarê bang dikirî digo lêlê hey dayê*
*Ezê bi dîyarî pira Batmanê diketim*
*Ha bi darî ter e*
*Bira kula xwedê têkeve mala serê serbeba*
*Emerê Mihê, lawê Perîxanê, eşîra Xîya, giregirê Badika*
*Dor li kozika bavê Salih girtine*
*Ji êvar da li ser bavê Salih şer e*

*Ezê îro bala xwe didimê*
*Berxê mala Ûsivê Seydo*
*Peyakî tekî bi tenê*
*Li vî welatê xayin û bêbext*
*Di kozika xwe da dimire tev nagere*
*Şaneşûnê berxê mala Ûsivê Seydo gelek hene*
*Ez pepûka xwedê çavê xwe digerînim*

*Xortekî xalçê bavçê nabînim*
*Destê xwe li ser dilê xwe dayne*
*Gavekî di gazîya bavê Salih here*

*Xwezî ji xêra xwedê ra*
*Xeberek bida Binêxetê*
*Birayê dilşewitî bavê Sulhedîn*
*Bigota mala te mîrato*
*Tu bi gazîya birayê xwe here*
*Dayê rebenê ezê bi tirkî nizanim*
*Bi Kurmacî jê ra dibêjin*
*Seyîdxanê Kerr* e*
*Ez reben im reben im*
*Bi rebena bavê Salih peyayê bi tenê*
*Îro çend roje li welatê xerîb*
*Maye di kesîrîyê da dayê...*

Piştî kuştina Tewfîq firar hîjde kes dimînin û paşda vedigerin. Sê roj û sê şevan dimeşin, têne çîyayê Şerefdînê. Li wê derê di newalekî da rastî gomekî tên. Du hevalên wan diçin gomê. Du kîlo rûn û tenekekî ard bi perê xwe distînin, ji xwe ra pê xurek çêdikin û dixun. Ji wir diçin Qarliovê, mala Evdilê Selîm Begê Cibrî. Firar pênc-şeş rojan li mala Evdila Begê dimînin. Pey ra ji hev diqetin. Firarên Berazan berê xwe didin alîyê Milazgir û Qereyazîyê, Fesîh jî tevî Sebrîyê Hilo û Şêxoyê Seyidî li vir dimînin. Li wêderê qirarê didinê

* Seyidxan salekî beriya Tewfîq hatiye kuştin. Ya dengbêj vê nizane, yan jî bi zanistî wisa gotiye. Û Seyidxan qet neçûye Sûriyê.

ku careke din herin, derbasî Sûrîyê bibin. Herdu hevalên din jî ji wan diqetin. Şêxoyê Seyidî ji xwe ra nasnama yekî din peyde dike, diçe. Fesîh bi serê xwe tenê dimîne. Serpêhatîya Fesîh ya çûyina Sûrîyê pir balkêş e.

Fesîh wê rêwîtîya xwe weha neqil dike;

- Ez ku bi tena serê xwe mam, min nekarîbû êdî bi tivinga xwe va bigerîyama. Ez ji wê derê rabûn, çûm gunde Kanîtextê. Berya demekî jî ez çûbûm vî gundî. Min fikra xwe ji wan ra got. Tivinga xwe da wana, wan jî ji min ra cilên kevn peyda kirin. Min ew li xwe kirin û ez bi rê ketim. Ez li wan nêzîkan rastî gundekî hatim. Li wir min derîyê malekî vekir û ez ketim hundur. Min nihêrî jineke çil-çil û pênc salî li ber kuçik rûniştîye, digirî. Min jê pirsî; *"Tu çima digîrî?"*

Wê bersiva min da; *"Kurikekî min ê mîna te hebû. Par hate kuştin. Min tu dîtî, ew hat bîra min, loma digirîm."*

Min got; *"Tu ji kîjan eşîretê yî?"*

Wê got; *"Ez Bêrtî me."*

*"Kurê te çend salî bû?"*

*"Kurê min panzdeh salî bû."*

*"Nasnama kurê te heye?"*

*"Belê heye."*

Min girt deh panot (Lîra) danê, nasnama kurê wê jê sitand. Xwendin û nivîsandina min tunebû. Min ji jinikê navê kurê wê, navê wê, navê bavê lêwik, navê gundê wana gişt pirsî. Ewê yek bi yek gişt ji min ra gotin. Min ew jiber kirin ku panzdeh salî bûye, sûretê wî li cuzdan nebû, ji xwe ez jî huvdeh-hîjdeh salî bûm.

Ez wê êvarê mêvanê wan mam. Bi berbanga sibehê ra bi

rê ketim û çûme ser rîya Erzurumê. Li wir ez rastî karwanekî hatim. Ez çûm, min xwe gîhandê. Ew diçûne Licê. Ez jî tevî wana bûm û meşîyam. Gava ku wana ji min pirsî, min ji wan ra got; *"Ez Bêrtî me, koçer im. Me pezê xwe bir li Erzurumê firot, niha jî paş da vedigerim, diçime Mêrdînê mala xwe."*

Em bi hev ra meşîyan, hatin Darahênê. Em wê şevê li wir man. Sibetirê wana hêstirên xwe bar kirin û em ketin rê. Em nîvro hatin çîyayê Zaza. Li wê hêlê Kanîya Qîza heye. Em ku hatin wir, firaran pêşîya me birî. Wana ji bo her hêstirekî ji karwanvanîyan sê mecîdî sitandin. Yekî wana ji firaran ra got; *"Eva Bêrtî ye. Wî çûye li Erzurumê pez firotîye. Pere pê ra pir in!"*

Li ser gotina wî kesî, firaran ez şêlandim. Di bêrîka min da du seet hebûn, ew ji min sitandin. Ji bêrîka min cuzdanê min derxistin, tê da şêst panot hebûn, ew hildan. Pey ra jî îşlikê min ji min kirin. Min pênc zêrên xwe di pêçenga milê îşlikê xwe da dirûtibûn. Wana ku îşlik ji min sitandin, qûrrîn bi min ket, ez girîyam. Firaran gotin;

*"Tu çito mêr î? Qet mêr ji bo tiştên wusa digirîn?"*

Min got; *"Ez ji bo şêlandinê nagirîm, ji bo tiştekî din digirîm."*

*"Lê tu ji bo çi digirî?"*

*"Ez jî mînanî we firar bûm, min dev ji firarîyê berda. Niha jî ketime vî halî, ez ji bo vî halê xwe digirîm."*

Li ser wê xeberdanê wana ez hildam, birim cem reîsê xwe. Navê reîsê wan Xelîl bû. Xelîl ji min pirsî, min jî hal û hewalên xwe ji wî ra got; *"Ez hevalê Seyîdxan bûm."*

Pey ra min birîna çîpa xwe rayî wan da. Li ser wê, wana girt, seet û perê min, îşlikê min paş da dane min.

Xelîl got; *"Tu jî were tevî me bibe!"*

Min qebûl nekir û got; *"Min qirara xwe daye, ezê herim Sûrîyê."*

Em ku ji firaran qetîyan, demekî çûn, karwanvanîyan ez girtim û ji min ra gotin; *"Emê te bibin teslîmî hukûmatê bikin. Hukûmat wê pêncsed panotî bide me!"*

Em demekî wusa di rê da çûn. Em hatin perê çemekî. Gava ku em li wir sekinîn, min got *"Ezê destmêjê bigirim."*

Wana merivekî xwe bi min ra şandin ber avê. Wexta ku em hatin ber devê avê, min çarixên xwe ji lingên xwe derxistin û xwe avête nava avê. Min di avê da sobanî kir û ez derbasî alîyê din bûm. Ewî merivê wan çend gulle avêtin min, lê gulla ji min negirt. Dora çem tev darê berrû bûn. Ez ketim nava dar û beran û çûm.

Fesîh di dawîya payîza 1933yan da derbasî Sûrîyê dibe.

Di sala 1995an da min bi Mehemedê Qancîyan (Mehmet Bîlîz) ra hevdîtinek kiribû. Di vê hevpeyvînê da Mehemed dibêje *"Evdilhemîd û birazîyê wî Mihemed Reşîd wê zivistanê çûne Goma Bostançî (Dilediza Jorîn) hetanî biharê li cem Mihemedê Bostançî mane."*

Fesîh jî dibêje *"Evdilhemîd wê zivistanê di nav Modkan da maye. Û biharî çûye li Gelyê Berazan tevî birazîyê xwe Mihemed Reşîd, birayê xwe Feyzulla, Elîyê Feqî Silê û wanên din bûye."*

Ji firarên din Çaçanê Nazê, Mehemedê Şêxo, Îzo û du-sê hevalên wan diçine Gomka Milazgirê (Gomka Qocelî). Wê zivistanê li wir dimînin. Lê berbe biharê wana ixbar dikin, esker tên wana digirin, bê pirs û bê suwal teva dikûjin.

## DELÛ KEMAL Û KUŞTINA FEYZULA Û ELÎYÊ FEQÎ SILÊ

Fermandarê seyarê (gezici suvarî alayi) Albay Alî Kemal di serîda dikeva pey şervanên Seyîdan û Berazan li gellek deveran îşkenceyên bê hed dike, lê tiştekî bi dest naxe. Elîcan, Seyîdxan, birayê wîTewfîq û kurapê Elîcan Mihê Xelîfe û gellek şervanên mêrxas têne kuştin, lê bi hebûna Evdilhemîd û Feyzulla va serhildan dîsa mînanî berê dewam dike. Ji ber vê yekê hukûmat dikeve tengasîyê û fermandarên leşkerî dixwazin gavekî pêşta wana ji ortê rakin û dawîyê li sehildanê bînin. Fermandarên alayên sîyarîyê ji bo vê yekê bi xezebeke hovane davêjin ser gel. Di nav wan da jî yê herî zulumkar Delu Kemal bûye.

Evdihemîd û Feyzulla mînanî ku me li jorê jî qal kiri bû, zivistana sala ewil, ya 1931î û 1932ya li alîyê Batmanê di nav eşîreta Xîya da derbas dikin. Piştî vegera ji Sûrîyê, zivistana sala 1933-34 a li Goma Mihemedê Bostancî derbas dikin. Gom di quntara çîyayê Mêrgemirê da ye û li cîyekî pir asê ye. Hayê kesekî wê zivistanê ji wan nabe. Lê paşê berpirsîyarên dewletê jê haydar dibin ku ew zivistanan naçine Sûrîyê li wan deveran dimînin.

Jibo wê yekê Bînbaşî Xulûsî jî diçe navenda Qereyazîyê Bêrexdar ji xwe ra dike qerergah û tevî leşkerên xwe li wêderê bi cih dibe. Evdilhemîd, Feyzulla û hevalên wan jî wê zivistanê, (*ya sala 1934 -35"*) diçin di Ava Reş da bi cih dibin. Li Ava Reş jî tenê mala Taştan hebûye. Ava Reş goma gundê Paywêranê bûye û ji Qereyazîyê 7-8 km wêda ye. Wana tînin di binê mala Taştan da ji xwe ra cih çêdikin, bi

rojê di wir da dimînin, bi şevê jî derdikevin derva. Ew difikirin kû di binê pozê Xulûsî da bi cih bibin, kes şikê nabe wir û bi wan nahisse.

Xulûsî wezîfê dide Xido û dibêje; *"lêpirsînê bike û cîyê wana kivş bike!"*

Li vir ez dixwazim bi kurtî qala Xido bikim. Xido muxbirekî ûsa bûye, heçi kesên ku wî tilîya xwe dirêj kirîye xêra wî tunebûye û mala wî wêran bûye. Sedemê vê jî fermandarên leşkerîyê bi pirsa Xido yeqîn bawer bûne.

Xalitê Şano ji min ra qal kiribû. Wexta kû mufreze hatîye Mele Osman, Xido ji pêra bûye, Xalit wê çaxê muxtarê gund bûye. Apê Xalit got; *"Demekî ez û Xido ku tenê man, min jê ra got; "Xido tu ji Xwedê natirsî tu muxbîrîya xelkê dikî û mala xelkê wêran dikî!"*

Xido hema cilên xwe ji xwe şiqitand û pişta xwe ya tazî rayî min da. Min hew dît kû pişta wî zox zoxî ye, şûna ço û qamçîyan wusa reş bûye. Pey ra vegerîya ser min û got; *"Tu di gora bavê....., min dikûjin. Heger ez ku tiştekî bibihîzim û ji wan ra nebêjim! Aweha li min îşkenceyê dikin!"*

Xido lêpirsînê dike, pê dihese kû ew li gundekî Textê Qereyazîyê da dimînin, lê kijan gunde nizane.

Wê demê Delû Kemal mufreza xwe hildide, dikeve rêza gundan û li gundîyan îşkenceyê dike. Li Çûlîyê jê ra dibêjin;

*"Me jî bihîstîye ku li van gundan da dimînin lê em nizanin kîja gunde.*

*Gundîyên Paywênanê yeqîn dizanin, tu ku wana bidî xeberdanê tuyê hîn bibî."*

Delu Kemal diçe Paywênanê, gundîyan top dike, diavêje

feleqê, piştî feleqê bi sergînan va agirekî gûr dadide, bêrên hesin dike nav êgir, sor dike û bi pişta gundîyan va dizeliqîne. Îşkenceya herî mezin li Şikoyê Eyib dike. Bi bêrê va mil û pişta wî dax dike. Şiko lava dikê, dibêje; *"Ez di ber bextê te û xwedê ketim e, dev ji vê îşkencê berde û gulekî berî min bide, min bikûje!"*

Delû Kemal vedigere ser koma gundîyan, waha xeber dide: *"Hela li vî kurê kerê mêzekin, dibê gullê berî min de... lo kurê kerê!... Ma tu dizanî buhayê fîşengekî bi çi ye?! Paxirê qoxanan ewqas pere, barûda wê ewqas, dendika wê jî ewqas... Kire çi? Kire ewqas pere... Ka xwîna te xercê fîşengê derdixe? Ez ji bo heywanekî mînanî te dewletê çawa bikim zerarê?!"*

Bi wan îşkenceyan va gundî cîyên firaran ji Delû Kemal ra dibêjin. Delû Kemal jî ji gund du rêberan hildide û berê xwe dide Ava Reş.

Li gor gotinên Evdirehman Ayhan (Ji Paywueranê) û Hesen Şekerci (Ji Ava Reş) pêştahatyê gund rêberan temî dike, dibêje; *"Kuro vana ji yalê jêr da, di ber avê ra bibin, wexta ku esker diçe, belkî firar wana bibînin û birevin!"*

Lê ku ew bi rê dikevin, muxberên Delû Kemal wana di devê avê da nabin, ji yalê Axlê Reş da dibine ser Ava Reş. Ew alî ji nepenîye û firar wana nabînin. Leşker top û mitralyozan li malê girê didin. Feyzula, Evdilhemîd û hevalên wan jî ji hundir derdikevin û bi leşker ra şer dikin. Feyzula ku Xido di nav esker da dibîne, derdikeve ser xanî, helanan dide xwe û derbekî diavêje Xido. Xido deverû dikeve ser berfê. Birîndar dibe, xwe li mirîtîyê diavêje û ruhê xwe xilas dike. Esker ku bi hev ra direşînê, Feyzulla dikeve. Evdilhemîd, Elîyê Feqî Silê û hevalên wan wê rojê şerekî bêeman dikin. Demekî şûnda

Elîyê Feqî Silê jî dikeve. Evdilhemîd û wanên din şer didomînin. Piştî demekî ku şeş heft esker, baş çawîşek û milîsek tên kuştin, esker ji ser wan vediçixe û paş da dikişe. Wê demê Evdilhemîd tine çardarekî çêdike, cenazeyên Feyzula û Elîyê Feqî Silê pê va girê dide ku di avê da berde ku av cenazeyan bibe ji wir dûr xe. Cemeda çem pir qalind bûye, Evdilhemîd dike-nake bûz naşikê. Wê demê Evdilhemîd, Mihemed Reşît, Elîyê Gewrê Tifingan hildidin û gund terk dikin û berê xwe didine Gelyê Beraza. Esker dikeve pey wan. Ew di Gelî da av bi av diçin, li serfîza Darqut xwe diavêjin Kevirê Nêrîyan. Esker dor li xilxilê Kevirê Nêrîyan digre, lê culet nake ku bikeve nav xilxilê. Li gor gotina Mihemedê Qancîyan, xilxilê ku ew tê da bûne li bilindahîyê bûye û esker di bintarê da bûye. Fermandar difikire, erge ku esker êrîş bibe xilxile, wê gelek xesarê bibîne. Ji ber wê yekê hetanî ber êvarê esker li wir dimîne, paşê lê dixe diçe. Piştî ku tarî dikeve erdê, Evdilhemîd û hevalên wî ji wê derê diqetin diçin alîyê Parsînê. Li gor gotina Mihemedê Qancîyan ew li Tawûsê çûne mala Kerem Begê, Fesihê Mihê Mîrze jî dibêje *"Ew çûne mala Bedîh Begê Cemaldînî."* Pirsa herduyan jî rast e. Evdilhemîd û hevalên wî berê çûne mala Bedîh Begê, piştî demeke kurt çûne Tawûsê mala Kerem Begê û hetanî biharê li wir mane.

Em vegerin ser mesela Feyzula û Elîyê Feqî Silê. Esker ku diçin ser cenazê Feyzula û Elîyê Feqî Silê, digrên serên wan herduyan jêdikin. Di tilya Feyzula da gustîleke zêr hebûye, Xidoyê Saclixê û milîsekî hevalê wî digirên tilya Feyzula jêdikin û gustilê jê derdixînin, hildidin û dibin. Pey ra esker serên wana dibin Qerekilîsê, bi serê du darên têlgirafan va mîx dikin û li meydana Qerekilîsê tîk dikin. Ji bo ku çavên gel bitirsînin serên Feyzula û Elîyê Feqî Silê sê rojan li meydanê

teşhîr dikin. Xelk qefle qefle diçine temaşê. Hinek kes bi dizî, hinek jî eşkere ji wan ra dûa dikin. Ew kesên ku eşkere dûa dikin, yan jî yên ku diçin di nêzîk da li wana dinihêrin, dereqeb ji yalê nobedar û muhafizan va tên sualkirin. Dibêjin; *"Te çima bi xêrxwazî ji wana ra dûa kir?"*, yan jî *"Te ji nêz va lê nihêrî, herhal tu wana nas dikî, berya wexta te ew dîtine?"*

Kilama ku li ser kuştina Feyzula û Elîyê Feqî Silê hatîye gotin, bi sitrana dengbêj Şakiroyê Şewranşêxê (Şakiroyê Kopê) waha ye;

***HÊ BIRA HÊ BIRA***

*Hê bira hê bira hê bira*
*Were hê hê bira hê hê bira hê hê bira*
*Bira xwedê xerab bike*
*Çetîn e kula biratîyê*
*Çîyayê bilind qeyayê asê*
*Miletê vî zemanî rûsar e*
*Kesek li birayê min nake sitaryê*
*Hê hê bira hê hê bira hê hê bira*

*Dîdarê kire gazî*
*Go lêlê Besê Tello rebenê*
*Lawo sibe ye ez bala xwe didimê*
*Ezê bi diharê Qereyazîya şewitî diketim bi kevire*

*Hê hê bira hê hê bira*
*Bira kula xwedê bi kul be*
*Bikeve mala qolordî qomitanê Erzurumê*
*Cenderme qumandarê Qereyazîyê*
*Top li peyayê mala bavê min girêdane*
*Li Avziravka şewitî miqabil e*
*Hê hê bira hê hê bira*

*Dengê topan û tivingan*
*Ser peyayê mala bavê min tê giregire*
*Hê hê bira hê hê bira*

*Têlo kire gazî*
*Go lêlê Besê lawo*
*Sibe ye bira li me nehata sura sibê*
*Bîna bayê lê nexista li bejn û bala Elîyê Feqî Silê*
*Feyzo bavê Îpekê kekê Çîçekê girêdana xetê tîpa Londirê*
*Gustîla di desta da zêrê zer e, qaşa di serî da mucewher e*
*Hê hê bira hê hê bira*

*Hatîye kuştinê Elîyê Feqî Silê*
*Mihê Xelîfe, Bavê Îskender e*
*Hê hê bira hê hê bira hê hê bira*

*Lê lê dayê rebenê*
*Birîna birayê min xedar e*
*Weyla min nemayê li serê dil e*
*Hekîmê Loqman rabe were*
*Birîna birayê min xedar e, kew nagire*
*Hê hê bira hê hê bira*
*De birano devê min dibêje*
*Dilê mi gulîbirê, li birangê min nabuhure*
*Hê hê bira*

*Dîdarê kire gazî*
*Digo lêlê Besê Têlo lawo*
*Sibe ye ezê bi dîyarê Avziravika şewitî diketim*
*Şer giran bû ji êvar da berfê lê kir*
*Hê hê bira hê hê bira*
*Sê sîyar sîyar bûne*
*Berê xwe dane Qerekosa şewitî*
*Ji bo peyayê mala bavê min mahrûmê*
*Li cem Delû Kemal îmana xwe avêt*
*Dînê xwe avêt xwe ji xwedê kir*
*Hê hê bira hê hê bira*
*Îxbarîya mala bavê mi rebena xwedê*
*Elîyê Feqî Silê Feyzo bavê Îpegê kir*
*Hê hê bira*

*De derbeke xedar lê dane*

*Li bejn û bala Mihê Xelif e*
*Feyzo bavê Îpekê, Elîyê Feqî Silê*
*Rextê Romanyê di xwînê da kesk û sor kir*
*Hê hê bira hê hê bira*

*Têlo kire gazî*
*Go lêlê Hedo Besê gulîbirê*
*Ca werin li kêleka xwenga xwe rûnên*
*Ezê ji we ra bêjim*
*Îxbarîya kekê mi kê û kê kir*
*Xidoyê Saclixê...*
*Her sê lawê Tûlin Emê kir*
*Hê bira*

*Belkî rebê alemê ûrt û ocaxa Xidoyê Saclikê biqelîne*
*Derbekê lê dane li bejna Feyzo bavê Îpegê*
*Ji bona xeleka zêr tilya kekê mi ji ber da jêkir*
*Hê bira hê bira de bira bira*

Kilameke din jî qala kuştina Feyzula dike. Lê kilam bi gelemperî rewşa firarên Berazan û Seyîdan tîne ziman. Di vê kilamê da dengbêj dibêje ku Feyzula bûye şehîdê Bostankendê. Berya kuştina wî Feyzula di şerê Bostankendê da birîndar dibe. Paşê di Ava Reş da tê kuştin.

Kilam dîsa bi sitrana Şakiroyê Şêwranşêxê waha ye;

## *LI MI LO LO*

*De li mi lolo li mi lolo li mi lolo*
*Dîdarê digo lawo ez şaş û matel im*
*Nizanim firarê me kanê*

*Dîdarê dikire gazî*
*Digo lêlê Besê Têlo rebenê*
*Sibe ye tîpek sîyarên me sîyar bûne*
*Dajone Qazgolê vê birekê*
*De tu bala xwe bidê, kula xwedê bi kul be*
*Têkeve mala Dewrêş Begê,*
*Bi tevî Xulûsî û Nedayî Begê*
*Baîsê Gelyê Zîla lawo*
*Sîyar bûne li Mûşa şewitî*
*Li derê seraya hukûmatê*
*Gotin walî paşa mala te şewitîyo*
*Tu bide me sed mêrê cendirme*
*Çarsid û çil mêrê înzibatê*
*Emê pey mala Bişar û Seydo*
*Li rasta Rasileynê bigerînin taqîbatê*
*Walî paşa kire gazî*
*Go Xulûsî Beg, Dewrêş Bego*
*Agirê kulê li mala we keto*
*Ez nikarim bidme we*
*Çarsid û çil mêrê înzibatê*
*Lewra mala Bişar û mala Seydo*
*Ji berêberê da du malên xûnxur in*

*Wê li we bînin qira mêra*
*Ezê paşê çi cewabê bidme ordîgeha hukûmatê*

*Li mi lolo li mi lolo li mi lolo*
*De dîdarê digo ez şaş im lawo*
*Nizanim firarê me kanê*

*Dîdarê digo Besê Têlo lawo*
*Sibe ye tîpek sîyarê me sîyar bûne*
*Berê sîyara kete deşta Rasileynê*
*Li gaza Mêrdînê hesirîm lawo Qamişloka şewitî*
*Berê bavê Sulhedîn ketîye qada sûrê*
*Kullê tê bi kul bî*
*Bikevi mala şeytan û fesadê Kurmanca*
*Alayê Sêrtê qolordîya Dîyarbekirê*
*Bi pey sîyarê mala bavê mi ketine*
*Ji ser peyayê mala bavê min tê*
*Dengê têkbîra qêrînê selewata*
*Li milê rastê nayê dengê berxê mala Hecî Axa*
*Jê ra dibêjin Feyzula bavê Îpegê*
*Min pirs kirîye*
*Debên birayê mi porkurê,*
*bûye şehîdê (birîndarê) şerê Bostankendê**
*Ax li mi lolo li mi lolo*
*Dîdarê digo lawê ez şaş û metal im*
*Nizanim firarê me kanê*

---

* Mînanî ku me li jorê jî got, Feyzula di şerê Bostankendê da birîndar dibe; di eslê kilamê da jî wisa ye lê gelek dengbêj wekî "şehîdê şerê Bostankendê" distirên. Lema me di nav kovikê de wisa nivîsand.

Ez dixwazim bi kurtayî qala Evdilhemîd, Elîyê Feqî Silê û nîşandarîya wî bikim. Di dema zaroktîya min da, min ji mezinan gelek tişt bihîstibûn. Şêx Ehmedê Qerecan li gundê me melayê remezanê bû. Rojekî wî qala Elîyê Feqî Silê kir û waha got; *"Elîyê Feqî Silê, mêrqasekî di ser pozê xwe ra mêr bû. Pir bi cûlhed bû û pir nîşandan bû. Dema ku wî biavêta nîşanê, ewî nukulê kewê dihingavt. Wexta ku dikete şer, di xizna tivinga wî da çend fîşek hebûya, wî ewqas neyarên xwe totî erdê dikir. Gulla wî tu carî vala nediçû."*

Ji gundê Hespreş Sedredînê Hecî Celal jî di derheqê Elîyê Feqî da ji min ra qala serpêhatîya xwe kir.

Sedredîn got; *"Rojekî ez û çend cînarên me, ji Kalo diçûne Hespreş. Elîyê Gewrê jî bi me ra bû. De tu dizanî ku ew jî firar bûye. Em dimeşîyan. Me rê nîvî kiribû. Li wê hêlê li serfêza rê zinarek heye. Êpê dûr bû. Em ku hatin tanga wî zinarî, Elîyê Gewrê awha serê xwe bilind kir, berbe jorê meze kir, di ber lêvan da kenîya û bi xwe ji xwe ra got "Ya îlahî, ya rebbî!"*

Min jê pirsî *"Çibû xalo? Te çima wusa got?"*

Elîyê Gewrê got; "*Rojekî ez, Evdilhemîd, Elîyê Feqî Silê, tevî çend hevalên me yên din, em dîsa di vê rê da berbe Hepreş diçûn. Em ku hatin vir, me hew dît ku di ber vî zinarî da dengê hurmehurma hirçekî hat. Elîyê Feqî Silê ji min ra got; "Hela bifîtîne bila hirç bizîvire."*

Gava ku min fîtand, hirç berbi me zîvirî. Bi zîvirandinê va wî avêtê. Bi avêtina wî va hirç wergerîya û tilor bû hate jêr.

Ewî deng li min kir û got; *"Here mêzeke, min di mêtikê da lêxist."*

*Min çû lê mêze kir, emrê îlahî gulle tam li orta nêtika hirçê ketibû."*

Loma dengbêj di kilamê da gotîye; *"Wexta ku Elîyê Feqî Silê çok dide erdê, pênc kesî ji te werdigerîne."*

Min di derheqê Evdilhemîd da ji gelek merivan pir tişt gohdarî kirin. Ji wana ezê tenê bi kurtî qala xeberdana Xalitê Şano bikim. Bi qasî ku tê bîra min, havîna 1959an bû. Min di lîsê da sinifa duduyan dixwend. Ji Kejik xalê Xalit mêvanê me bû. Merivekî bi xeberdan û xweşsohped bû. Mesele çawa vebû, nizanim, ewî dirêj dirêj qala Evdilhemîd kir. Me jî bi meraq ew guhdarî kir.

Berî wexta mala wan li Îdirê bûye, paşê hatine gundê Elaşgirê Melesilêmanê. Di serê salên 1930î da jî hatine gundê me Mele Osman û çend salan pey ra jî çûne di Kejik da bi cîh bûne. Xalê Xalid waha got;

"Wexta ku Elîcan û Seyicxan rabûn, ez muxtarê Meleosman bûm. Wê çaxê Feyzo û Elîyê Feqî Silê di Ava Reş da hatin kuştin, dem zivistan bû. Evdilhemîd tê di Textê Qereyazîyê ra derbasî gelî dibe. Çem û çem diçe heta Darqut. Esker û milîs jî didin pey. Milîs jî pismamên wan (Berazî) bûn. Ji xwe wê çaxê ji Berazan gelek kes bûbûn milîs û muxbir. Li pişt Darqut baxirek heye. Jê ra dibên Kevirê Nêrîyan. Evdilhemîd xwe diavêje wî baxirî. Tivinga xwe tijî dike, li benda esker û milîsa disekine. Heger ku esker wî bibîne dê bi wan ra şerke. Şopa wî digerînin, hetanî ber baxir tînin lê nizanin di ku da ye. Esker demekî li ber baxir diçe tê, lê culhed nake ku têkeve baxir. Hesab bikin, hewqas esker culhet nake ku here ser merivekî. Navê Evdilhemîd saweke wusa xistibû dilê esker. Ji xwe wexta ku di cîyekî da digirtin

ser wan, esker gava ku navê Evdilhemîd û Feyzo dibihîst, dest bi revê dikir. Hela navê Evdilhemîd sûbay bi cina dixistin.

Xulase esker hetanî êvarê li ber baxir diçe û tê, paşê vedigere diçe. Piştî çûyina esker Evdilhemîd ji baxir derdikeve, çaruxa xwe derdixe, berevajî dixe lingê xwe û çem û çem diçe. Hetanî jora Gelyê Berazan, paşê çaruxa rast dike û lê dixe derbasî Parsînê dibe.

Şevekî Evdilhemîd hate cem me. Me xirabî nedikir. Wana jî em ji xwe ra dost dihesibandin. Evdilhemîd ji lingê xwe da birîndar bibû. Gulle ji jor da li lingê wî ketibû û tê da mabû. Me lambe vêxist, got ji min ra miqarekî û tevşokî bînin. Me jê ra miqar û tevşo anîn. Ewî li ber ronkaya lambê girt, miqar da ser birîna lingê xwe û bi tevşo va miqar kuta. Mînanî meriv çawa mîxekî di dar da dikute, hema wusa kuta. Û gule di binê lingê wî ra derket. Me jî şaş û ecêbmayî lê mêze dikir. Wî malmîratî ne got ax, ne got of, ne jî ruyê xwe tirş kir. Meriv digot qey ew karekî xwe yê edetî dike.

De îja ezê qala tivinga bavê te û fesadîya vî welatê me bikim. Evdilhemîd* çûbû Sûrîyê. Êdî firan mirar nemabûn. Mala bavê te jî teze hatibû Meleosman. Tivingeke bavê te hebû. De ew ji cîhê rehet hatibû, hayê wî ji rewşa vê derê tunebû. Cînar jê ra Dibêjin; *"Eman yeman wê tivingê winda ke. Hukûmat ku bibihîze, xêra te tune."*

Ew jî digre tivingê dixe yayêxê dew, li erebê dike dibe Parsînê, gundê xwe yê kewin.

Mehekî du mehan pey ra rojekî mudûrê nehîyê gazî min kir got; *"Hela were, tu çito muxtar î ku ewha li ser guhê xwe*

---

* Navê bavê min jî Evdilhemîd bû.

*dikevî, tu xeberê nadî me?"*.

Min got; *"Çi ye? Çi xeber e mudûr beg?"*

Mudûr got; *"Lê tivinga Evdilhemîd li vira kirine yayêxê dew, li erebê kirine, birine Parsînê, tu hayê me pê naxî."*

*"Kîjan Evdilhemîd mudûr beg?"*

*"Ma çend Evdilhemîd hene? Helbet Evdilhemîdê birayê Elîcan."*

Ez kenîyam û min got; *"Welle te rast bihîstîye, lê muxbirê te derew kirine, tu xapandine. Ew tiving ya wî Evdilhemîdî nîn e. Ya vî Evdilhemîdê cînarê me ye. Apê wî yuzbaşîyê mîllî şûra Qaqizmanê bû, bi wê tivingê va şerê Ûris kiribû. Gundê wan cînarê gundê me yê berê bû. Ez baş pê dizanim wî camêrî jî wekî dîyarîya şer tivinga xwe bi xwe ra anîbû. Cînaran ku jê ra gotine tiving dê serê te bixe belayê, wî jî paş va şandîye!"*

Mudûr got; *"Way kerê kurê keran!"*

Min got; *"Lê mudûr beg, tu fesadê vî miletî baş nas nakî. Te ku tiştek bihîst, bi ruh bîne, paşê karê xwe bike."*

De hesab ke, ez ku ji vî karî hayîdar nebûma, ji bo navê Ev-dilhemîd kî dizane wê çi bianîna serê bavê te. Fesadên welatê me çawa tiştan berovajî dikirin û mala xelkê dişewitandın.

Ez qala Evdilhemîd û Kerem Begê Tawisê jî bikim. Evdilhemîd ça ku me li jorê jî qal kiribû, ji Darqut vedigere diçe Tawisê mala Kerem Begê. Tawis nêzîkî Hesenqelê ye. Kerem Beg wî heta biharê xwedî dike. Kerem Beg li wê hêlê him merivekî bi nav û deng û him jî dewlemend bûye. Ji Tirkên Hesenqelê û ji berpirsîyarên dewletê pir nas û dostên wî hebûne. Piştî ku Evdilhemîd ji vir vediqete, Xidoyê

Saclixê dîsa diçe muxbirîyê dike û dibêje; *"Kerem Begê hetanî biharê Evdilhemîd xweyî kirîye."*

Cendirme tên, Kerem Begê digirin, dibin Hesenqelê. Lê pir îşkencê dikin û diavêjin hepsê. Di hepsê da jî tînin hustîyê wî bi nîrê erebê va zincîr dikin. Mînanî ku wî li çarmixê dixin.

Demekî şûnda nas û dostên wî dikevin navê, bi bertîl û ruşwetan wî xilas dikin. Piştî berdanê nas û dostên wî diçine dîtina wî. Kifşe ye ku Kerem Beg merivekî bi henek û laqirdî bûye. Ji nas û dostê xwe ra laqirdîyan dike û dibêje; *"Kuro herin ji Misto ra bêjin, bila navê min jî têke kilamê. Wexta ku dibêje Evdilhemîd Şêrê hustû bi gulî, di pey ra jî bila bibêje Keremê Şêrê hustu bi zincîrkirî."*

Ewê ku Kerem beg dibêje; *"Misto"*, ew dengbêj Mistefayê Xelê Heyran e. Min berê jî gotibû, piranîya kilamên ku li ser serhildana Berazan û Seyîdan tên gotin wî derxistine. Di kilaman da Mistefa, Evdilhemîd wekî "*Evdilhemîd şêrê hustu bi gulî*" bi nav dike. Loma Kerem Begê wusa bi xwe henek kirîye.

## KUŞTINA XIDOYÊ SACLIXÊ

Xido dibe muxbirekî wisa, di bin heft tebeqê erdê da çi dibe, yan jî li heft tebeqê ezmanan çi dibe ew ji giştî bi xeber bûye. Li her derê li her gundî fesadên wî hebûne. Li gor salixê salixdanan eger Xido ku tilîya xwe dirêjî yekî bikira û bigota sileha wî heye, yan jî wî nan daye firaran, êdî wî kesî tu xêr ji emrê xwe nedidît. Bi pirsekî Xido mala xelkê mîrat dike. Ji ber wê yekê dogotin herkesî ji tirsa xwe bac û bertîl wekî pere, zêr, pez û dewar didane Xido. Xido bi wî karî pir dewlemend dibe û du bir pez dikire, li çîyayê Çaqmaqan dide mexelên Gozelderê. Piştî kuştina Feyzula û Elîyê Feqî Silê Evdilhemîd sond duxwe dibêje; *"Hetanî ku ez Xido nekûjim, ez ji vî welatî dernakevim."*

Evdilhemîd li pey digere, diçe nav pez cem şivana. Şivan ji Elajgirê bûne û ew jî Berazî bûne. Yek ji wan dengbêj bûye. Ewê dengbêj, ji Evdilhemîd ra distirê jî. Evdilhemîd şivana tembîh dike, dibê *"Xido wexta ku hate nav pez, hûn hayê min pê xin."*

Rojekî ku Evdilhemîd tê, şivan xeberê didinê û dibêjin;

*"Xido wê filan rojê bê pez bixesîne."*

Evdilhemîd wê rojê tê li benda Xido dimîne. Bala xwe didê ku wa ye Xido û kurê wî hatin. Evdilhemîd deng lê dike û dibêje;

*"Xido! Te ewqas xirabî kir, te mala feqîr û belengazan wêran kir. De hela were hesabê wî bide."*

Xido ku dengê Evdilhemîd dibihîze, direve. Evdilhemîd ku davêjê, bi derbekî da Xido weldigerîne. Kurê wî jî direve.

Evdilhemîd deng li lawik jî dike, dibêje; *"Nereve, ez te nakûjim. Gunehê bavê te hustîyê wî da ye, di hustîyê te da nîn e."*

Wexta ku diçe cem lawik, dinihêre ku egala Feyzula di hustîyê wî da ye. Pey ra ew dibîne ku Gustîla Feyzula ya ku Xido ji tilîya wî derxistîye, di tilîya wî da ye. Evdilhemîd lê dixe, wî jî dikûje.

Ew çîya, çîyakî asê ye. Erebe, merebe lê naxebitin. Ji ber wê, cenazê Xido li kerê dikin, ji çîyê dadixinin jêrê. Paşê dengbêj ku li ser Xido kilamê derdixin bi vî karî qala kuştina wî dikin. Destpêka kilama weha ye;

*"Xido mi ji te ra nego neçe Gozelderê*
*Evdilhemîd wê te bikûje,*
*Wê cenazeyê te bide ser barê kerê"*

## MELE ÛSIV Û MUFREZEYA XULÎSÎ

Di dema serhildanê da, Mele Ûsiv jî melayê gundê me Meleosman bû ye.

Cînarê me Fethulayê Ehmedê Salih (Çîftçî) çend sal berê ji min ra waha qala hatina firaran û hatina mufreza Xulûsî û Mele Ûsiv kiribû;

- Di zemanê firaran da melayê gund Mele Ûsiv bû. Merivekî xweşbin, bi henek û leqirdî bû. Xelkê pir jê hez dikir. Mala bavê te hê nehatibû gund, ez jî wê çaxê duwazdeh-sêzdeh salî bûm. Rojekî firarên Berazan hatin, di gund ra derbas bûn. Ew ji alîyê jor da dihatin û berbi alîyê Milazgirê diçûn. Qet ji hespên xwe peya nebûn. Evdilhemîd ji gundîya ra got; *"Hinek nanê patî ji me ra top kin, emê derbasbin herin."*

Ji nav gund nan top kirin û dane wan. Wana nanê xwe kirin heqîban ew li terqîyên hespên xwe kirin û bi rê ketin. Lê berya wê Evdilhemîd ji pismamên xwe gazin kir. Wê demê ji Berazan jî çend kes li vir bûn. Mele Ûsiv meyla wana dikir. Lê ji tirsa xwe beyan nedikir. Ma tu kesî dikarîbû ji tirsa fesadan di lehê wan da tiştek bigotaya. Fesad hema diçûn, ixbarî dikirin. Çendek pey ra mufreza Xulûsî hate Meleosman. Eskerekî bêhed, li milê kanîya Qamîş ji hespê xwe peyabûn. Dorhêla kanîya Qamîş tijî esker bû. Mîna çawa ku reşêlek di dema biharê da li rûyê zevîyan dihewirin tomarî reş dikin, hema wusa bû. Esker ketin nava gund, mêr top kirin birin ber Kanîya Qamîş. Mele Ûsiv jî di nav wan da bû. Em çend zar jî çûn, me lê temaşe kir. Bê pirs û gotin gundî avêtin feleqê. Wexta ku mêrên gund birin li wê derê kom kirin, Xulûsî emir kir û got; *"Melayê gund kîjane, berê wî biavêjin feleqê."*

Mele Ûsiv jî hema ji nav mêra derket, çû xwe dirêjî erdê kir. Hema du esker bi lez û bez lingên wî di qayîşa tivingê da şidandin û bilind kirin. Başçawîşek bi darekî qalind va hat bi dora mele ket. Başçawîş ku bi zerp darê ewil li lingê wî xist mele got;

*"Ya ellah!"*

Piştî darê duduyan got; *"Ya Fettah!"*

Bi darê sisîyan ra qarîn jê hat got; "*Wî gulê dayê Dêranê!...*"

Wana mele kuta, mest kir û berda. Li pey mele gundî gişt di feleqê ra derbas kirin. Pey feleqê ra Xulûsî Beg li esker qîrîya û got; *"At bîîîîîîn!"*

Esker sîyar bû û berbi Qereyazîyê çû.

Wê demê milet pir ditirsîya. Digotin; *"Ji enqerê emir derketîye, wê Gelyê Berazan jî mînanî Gelyê Zîla bibirin."*

Berya Xulûsî jî Dewrêş Beg hatibû. Hatina wan elametê xêrê nebû.

Paşê gundîya bi mele henek dikirin digotin; *"Seyda! Xwedê ji te razî be. Ka te ya ellah, ya fettah got, te çima ya rezaq negot? Tu hema qarîyayî, çi bû bı te?"*

Mele jî bersiva wan bi vî teherî dida; *"Kuro de min çi dizanîbû ku ewana wusa kafır in, ewqas dilkevirin. Min got qey wê bêjin eva mela ye, ehlê xwedê ye, wê bi nermî li min xin. We jî dît ku di dilê wan da rehma xwe tune. Wan kafiran nahêlin ku meriv navê xwe jî bêje. Ez çi bikim."*

Cînarên me yên ku Mele Ûsiv dîtibûn, herdem qala wî û laqirdîyên wî dikirin. Mela ji mamûr û karmendên dewletê pir aciz bûye. Piştî feleqa Xulûsî, rojekî ew di mizgeftê da wahzan dide û dibêje; *"Her çi kesên ku raqî û şerabê veduxun, gunehê kebaîr hildidin hustîyê xwe. Hûn yeqîn bizanibin ku ewê di agirê cehnemê da bişewitin. Wê di nav qîr û qetranê da ezabê herî mezin bibînin. Hasilî kelam merivên ku raqî û şeravê veduxun, her wekî necis dixun."*

Ji cemaetê yek jê dipirse; "*Seyda, necis çi ye? Xwedê ji te razî be."*

Mela dibêje; *"Kuro bi zimanê xelkê em jê ra dibêjin gû, heger ku tu navê wî diguherînî jê ra dibêji bavo, ew jî tu dizanî."*

Paşê dîsa yek dikeve kirê mele, dibêje; "*Ma seyda, li vî welatî ka kesekî ku raqî û şerabê vexwe heye ku tu ewqa muhîm dibînî û li ser weaza didî. Mînanî ku tu hinekî sergirtî xeber didi.*

*Mele dibêje; "Ez dizanim mexseda te çîye lawo! Zêde tevnede!"*

## DELÛ KEMAL LI ALÎYÊ BILANIXÊ Û XINÛSÊ

Wexta ku serhildana Berazan û Seyîdan dest pê dike, ji wan der û doran ji firar diçin tevlî serhildanê dibin. Ji Şêwranşêxa Bilanixê Evdilhemîd û Ereb ji alîyê Xinûsê Heseno û pismamekî wî, demekê bi firarên Berazan û Seyîdan ra digerin. Bi wan ra tevî çend şeran dibin, paşê ji wana diqetin diçin alîyê Xinûsê, xwe vedişêrin. Sal û nîvekî-du salan hayê hukûmatê ji wana nabe. Di dawîya serhildanê da hukûmat bi wana dihîse. Ew pirî caran li alîyê Xinûsê digerin. Navê desta wan jî *"Çeta Heseno"* bûye. Delû Kemal bi kin û rik dikeve pey wan. Wê demê ku Evdilhemîd û çend hevalên wî yên mayî jî derbasî Sûrîyê bûne, li wê hêlê xêncî desta Heseno kesekî firar nemaye.

Tu elaqa desta Heseno û sîyasetê bi hevra tune bûye. Çi dibe bila bibe, ji bo Delû Kemal ferq nake, li gor Delû Kemal ew hevalên firarên Berazan û Seyîdan in. Û dûmayinên Elîcan û Seyîdxan in. Delû Kemal sond xwarîye, gotîye; *"Heger ku ez çeta Heseno ji ortê ranekim, bila jîyan li min heram be."*

Ji bo wê yekê ewî li wê hêlê gelek zulm û tahdayî kirîye.

### *"OLO! XWE BİDİN HEV, BİLA GULLÊ DEWLETÊ VALA NEÇİN."*

Havîna 1966an bû. Ez ji bo lêkolîna Evdalê Zeynikê digerîyam. Ji min ra gotin ku; *"Sadiqoyê Qirimqayê kilama Evdal û Gulê baş distirê û neqareta kilamê ya ku Evdal bi Ermenkî gotîye, wê jî dibêje."*

Gundê Qirimqayê pir dûrî me bû û li wê hêlê jî nasê min tunebûn. Qirimqa nêzîkî Xinûsê bû û ehlê wir Redkî bûn. Wê demê zavê me (mêrê meta min) Heyderê Nazê hatibû mala me. Mala wî li Kejik bû û ew jî Redkî bû. Min ji Heyder ra got;

*"Ez dixwazim herim Qirimqayê, bi Sadiqo ra xeber dim.*

*Lê ez kesî nas nakim, gelo em çawa bikin."*

Heyder got;

*"Ew gişt pismam û dostên min in. Ezê bi te ra bêm."*

Roja din ez û Heyder rabûn li hespên xwe sîyar bûn û çûne Qirimqayê. Em li mala Hecî Resûl bûne mêvan. Me ji wana ra got;

*"Em ji bo Sadîqo hatine."*

Wana got; *"Welle Sadiqo li gund nîn e. Çûye Mûşê. Hela îro li vir bin, belkî sibê tê."*

Em wê rojê li wir man, cînarên Hecî Resûl wê şevê hatin şevbuhêrka me. Şevbuhêrka me geş bû. Min nihêrî ku kurê Hecî Resûl yê mezin Mihemed bi henek ji cînarekî xwe ra got; "Kureder, çi ye tu mînanî Cezoyê muxtar cezûtîyê dikî?"

Wê pirsa Mihemed bala min kişand û min jê pirsî;

*"Welle di vî Cizoyê te da tiştek heye?"*

Mihemed got; *"Bavo qet qal neke, ew meselek dûr û dirêj e."*

*Min got; "Na welle te ez di meraqê da hiştim. Tuyê bêjî."*

Mihemed dest pê kir û got;

*"Ezîzê min, ez çi bêjim? Sîh salî berê muxtarekî me hebû, navê wî Cezo bû. Wê çaxê li vê hêlê çend firar hebûn, du-sê kes jî ji alîyê Bilanixê hatibûn gihiştibûn wana, li van deveran digerîyan. Reîsê wan jî ji gundekî Xinûsê bû; Heseno. Ew berya wexta çûbûn gihîştibûn Elîcan û Seyîdxan. Bi wana ra gerîyane paşê jî ji wan qetîyane û hatine. Seyara Delû Kemal jî hatibû bi pey wan ketibû. Min bi xwe Heseno nedît. Lê çawa ku salix didan ew merivekî şareza bûye. Delû Kemal vir da çû, wê da hat, kir û nekir rêça wî serrast nekir. Heseno diçû, xwe di cîhên cur be cur da vedişart, şopa xwe winda dikir. Tu qûlê xwedê pê nedihesîya. Delû Kemal bi ewqas esker va tu tiştek bi ser tiştekî nedixist. Merivekî pir zalim bû. Hukûmatê selehîyet dabûyê, çi bixwesta dikir. Girtin, berdan, kuştin, hiştin di destê wî da bûn. Esil navê wî Elî Kemal bû, albay bû. Merivekî*

*xulq teng bû, ji ber wê yekê milet jê ra digot Delû Kemal. Rojekî yekî çûye îmana xwe avêtîye. Jê ra gotîye;*

*'Çeta Heseno çûye Qirimqayê, gundîyan nan û av danê.'*

Tu rastîyê dipirsî ne kesî ji me ruyê Heseno û hevalên wî dîtibûn, ne jî kesî ew bi nan û av kiribû. Rojekî me hew dît ku eskerê Delû Kemal dora gund birrî. Di gund da çiqas mêr hebûn, hildan anîn li vê rasta pêşîya gund top kirin. Delû Kemal ji gundîyan ra got;

*"Min yeqîn xeber hildaye ku çeta Heseno hatîye vî gundî, bi nan û av bûye. Qet înkar nekin û xwe nedine cizirandin. Ew hatin mala kê û kê nan da wana ji min ra bêjin."*

Kesî tiştek negot.

Delû Kemal di ser gundîya da qarîya û got;

*"Ez dê niha bi we bidim gotin!"*

Pey ra anî, gundî bi rêz avêtin feleqê. Eskeran di feleqê da gundî wusa kutan wusa kutan giştmest kirin. Feryad û fîgana wana diçû erşê ela. Paşê bi fermana Delû Kemal esker sekinîn. Delû Kemal deng li gundîyan kir *û got;*

*"Kî dê îtiraf bike û bibêje?"*

Deng ji kesekî derneket. Ê Heseno nedîtibûn wê çawa derew têxistana hustîyê xwe.

Delû Kemal emir kir û got;

*"Herin Eyşo û Fatoyan bînin!"*

Cezo bûbû vizik li dora Delü Kemal diçû dihat. Bi wê pirsa Delû Kemal va Cezo da pêşya eskeran, çû nava gund. Gazi jina dike û dibêje;

*"Werin paşayê hukûmatê gazî we dike."*

Cezo û eskeran jinên gund top kirin anîn wir. Delû Kemal got;

*"Ji min ra sîtilek ava kelandî bînin."*

Cezo bi lez û bez çû ava kelandî anî. Piştî wê Delû Kemal got;

*"Parçeyek kulav bînin!"*

Çûn parçeyek kulav anîn.

Pery ra çawîşan bi qaseturan va ev kulav birîn, kirin çend parçeyên piçûk.

Delû Kemal deng li jinan kir û got;

*"Mêrên xwe temaşe bikin."*

Pey ra emir da eskeran û got;

*"Qûna wana pilûtkin!"*

Esker rahiştin gundîyan, gişt kûz kirin. Pey ra şal derpîyên wan şiqandin. De îja tu wî dimenî bîne ber çavên xwe. Qûnên gundîyan yên pilûtkirî yên rût û jin jî temaşe dikin.

Delû Kemal bi xwe girt ji wan perçên kulavan yek hilda, ew di ava kelî da kir, derxist da ser qûna yekî, bi ço va lêxist. Demekî şûnda sekinî û emir da esker û got;

*"De vê carê jî hûn dest pê bikin!"*

Eskeran ev perçeyên kulavan hildan, eynî mînanî wî di ava kelî da kirin û derxistin dane ser telmeqûnên gundîyan û bi çoyan va kutan. Dîsa bû gazî û qûrîna gundîyan. Zarîn ku bi jinan jî ket, Delû Kemal deng li eskeran kir got;

*"Temam!"*

Esker ku sekinîn, Delû Kemal dîsa di ser gundîyan da qarîya û got;

*"Lawo, werin ji vî inyatê Kurdî biborin, ezê we giştika gulebaran bikim."*

Wê demê du-sê gundîyan gotin; *"Emê bêjin."*

Delû Kemal got; *"Hah! Hûn werin vî alîyî!"*

Ji wanên din ra got;

*"Ezê we gişka bidim ber gulan û bikûjim!"*

Emir da eskeran, esker li pêşberî gundîyan rêz bûn, Delû Kemal emir da û got; *"Tivingan tijî kin."*

Bu şeqeşeqa mekanîzmên tivingan.

Delû Kemal got;

*"Nîşan bigrên!"*

Eskeran tiving kutane milên xwe û nîşan girtin.

Delû Kemal got;

*"Dîqet!"*

Eskeran serên xwe kutan qundaxê tivingan û nîşan girtin. Êdî wê bêje; *"Atêş!"* eskerên bireşînin.

Wanên li pêşberî eskeran êdî ketibûne halê mirinê. Hacî xwe tunebûn hema wusa fellişîbûn. Bi zorê xwe li ser pîyan digirtin. Wê demê Cezoyê muxtar deng li gundîyan kir û got;

*"Olo xwe bidin hev, xwe bidin hev, bira gulleyên dewletê vala neçin!"*

Delû Kemal vegerîya ser Cezo û jê pirsî; *"Lawo te çi got, te çi got?!"*

Cezo bi cazûtî bersiva wî dayê û got; *"Fermandarê min, min got xwe bidin hev, bila gulleyên dewletê vala neçin!"*

Delû Kemal got; *"Ker kurê kerê de ev merivan cînarê te ne. Tu çawa bawer dikî ku ez dê ewqas merivî ji bo îtîrafekî bidim kûştin? Ji bo ku ez çavên wana bitirsînim ez waha dikim, kurê kerê!"* Pey ra vegerîya ser çawîşan û got;

*"Cazutîya vî kurê kerê jî ji hedê xwe derbas bû, bavêjin erdê!"*

Çawîşan Cezo avêtin erdê û danê, êdî gayê reşo te çi xwarîye û çi nexwarîye, lêdan û ew mest kirin. Pey ra Delû Kemal deng li esker kir got; *"At bîîîîn!"*

Esker rahişte hespan bi lez û bez ku sîyar bûn,

Delû Kemal got;

*"Marş marş!"*

Eskeran hespê xwe ajotin û çûn.

## EVDILHEMÎDÊ BILANIXÊ

Desteya Heseno demekî li alîyê Xinûsê digere,paşê Evdihemîd vediqete diçe alîyê Bilanixê û Milazgirê. Delû Kemal kû jê haydar dibe, diçe wê hêlê û şopa wî digerîne. Çi bi Heseno, Ereb û hevalên wan yên din bûne, kifş nîn e. Dibe ku ew hatine kuştin, ya jî çûne deverên dûr û dereke rêça xwe winda kirine. Evdilhemîd bo ku xwe ji teqîbata Delû Kemal xilas ke, diçe derbasî alîyê Intabê (Tutak) dibe. Ji tirsa xwe jî nêzîkî gunda nabe, derdikeve Çîyayê Qetewîn. 15 rojan li çîyê dimîne, tenê çêrê duxwe. Li gor salixan ew çêra gihayê din jî ku dixwe, aqil-hiş di serê wî da namîne. Çakêtê xwe derdixe, tivinga xwe di milê çakêt ra dike, diçe gundê Qereaxacê. Wexta ku dikeve nava gund bîhna nanê patî tê pozê wî. Xwe li bîhna nan digrê, diçe dikeve malekî. Dinhêre ku jinek li ber tendûrê nan dipetîne. Dibêje;

*"Nanekî bide min, ez birçî me."*

Jinik nanekî didê, ew jî dest pê dike, li pîya nanê xwe dixwe.

Wê demê muxtarê gund dikeve hundur. Muxtar wî nas dike, jê ra dibêje;

*"Evdilhemîd, çima? Çi bûye ku tu li ser pîya nan duxwî? Were li odê rûnê, bira ji te ra xurek bînin û bixwe."*

Evdilhemîd ku diçe di odê da rûdinê, muxtar digre derî ser da zirzê dike û diçe xeberê dide qereqolê. Cendirme tên destên wî girêdidin û dibin teslîmî Delû Kemal dikin. Delû Kemal êdî lê îşkenceyên curbecur dike. Dibê;

*"Bêje kê tu bi nan û av kirî, tu li kîderê çûyî mala kê?"*

Evdilhemîd dibêje;

*"Ez qet neçûme mala tu kesî û kesekî jî nan û av nedaye min. Nanê xwe min bi devê tivinga xwe va sitandîye."*

Delû Kemal tîne bêra hesinî di nav agir da sor dike, cilên wî jê derdixe û bêrê bi pişta wî dizeliqîne, dax dike. Dibêje;

*"Bêje!"*

Evdilhemîd dibêje;

*"Welle tu kafir î, ez ji te ra çi bêjim bê feyde ye. Tu kesî nan nedaye min. Nanê xwe min bi zora devê tivinga xwe ji xelkê sitandîye, hema çi dikî bike!"*

Delû Kemal dîsa wê berê dike nav agir, dîsa sor dike û bi serê wî va dizeliqîne, dax dike. Dilê gundîyan pir pê dişewite. Her yek di tanga xwe da tê pêş, yek dibêje;

*"Min nan dayê."*

Yekî din dibêje;

*"Min jî dayê."*

Bi wî teherî pênc-şeş kes wusa dibêjin ku êdî Delû Kemal dev ji îşkencê berde. Evdilhemîd dibêje;

*"Lawo dûrî min herin!"*

Pey ra ji Delû Kemal ra dibêje;

*"Gişt viran dikin, qet yekî jî nan man nedaye min. Nanê xwe min bi devê tivinga xwe ji xelkê sitandîye. Welle tu kafir î, bêxweda yî, hema çi dikî bike!"*

Wê demê Delû Kemal dev jê berdide, emir dike dibêje;

*"Nan bînin ji eskeran ra, bila esker nan bixwin!"*

Gundî ji esker ra nan tînin. Wê demê nan tînin, didin ber Evdilhemîd û dibêjin;

*"Birçî ye, gune ye, bila ew jî nan bixwe."*

Ew waha li nan mêze dike û dibêje;

*"Lo welle ez te naxwim. Tu nîn î ku ez kirim vî halî"*

Nan naxwe. Piştî nan, Delû Kemal emir dike, esker bi rê dikeve. Dema ku ji gund dûr dikevin, gundî dengê silehan dibihîzin. Gundî ku diçin mêze dikin, cinazê Evdilhemîd dibînin. Paşê cinazê wî hildidin dibin li gund defin dikin.

Paşê merzelê wî dibe "Zîyaret!" Gundîyên wê deverê, yên nexweş, bayî û tayî diçine ser, lê dua dikin, jê hêvîya şifayî dikin.

Kilama ku li ser Evdilhemîd hatîye gotin bi sitrana Şakirê Şewranşêxê waha ye;

***WERE LÊ LÊ***

*Were dayê ez nemînim ji bo Evdilhemîd*
*Firarê dewletê, qaçaxê hukûmatê*
*Hêsîrê destê muxtarê Qereqayê*

*Ezê li dîyarê Qereqayê dikevim li vî girî*
*Xwedê kula xwe têxe mala muxtarê Bostanqeyaye vî gawirî*

*Berê xwe da kela Kopê gilî kirî*
*Destê Evdilhemîd dane ser darê kelepçê*
*Berê wî dane kela Kopê*
*Bi emrê vî mudûrî*

*Evdilhemîd Dibê walî paşa ez bi gora bavê te kim*
*Minê heta roja îro*
*Bi tivinga destê xwe*

*Xwe xweyî kirî*

*Xwedê kula xwe têke mala vî muxtarî vî gawirî*
*Minê qesta nanê tendûrê kirî*
*Evî malmîratî sifre da ber min î*
*Derî di ser min da kilît kirî*
*Minê bala xwe dayê*
*Derî di ser min da maye zirzekirî*

*Walî paşa ez bi gora bavê te kim*
*Başçawîşê kela Kopê*
*Neynukê tilyê min*
*Sî û sê diranê min*
*Bi kelpetana ji devî min hilkirî*
*Ez rakirime ser sêla sorkirî*
*Heta bezê çoka min helîya*
*Kete ser kozîyên darê mazî*
*Ji berê wî agir ditemirî*
*Ez bi gora bavê te kim*
*Mi bi tivinga destê xwe*
*Xwe xweyî kirî*

## KUŞTINA ŞÊX EVDILREHÎM Û SULHEDÎN

Ferûdûn Qamîş mesela Şêx Evdilrehîm weha neqil kir.

- Di sala 1935an da birayê Şêx Seîd Efendî Şêx Evdilrehîm gazî bavê min dike. Jê ra dibêje ;

*"Min ji şervanên jêhatî meriv top kirine, emê herin Turkîyê, tu jî were. Em dê serhildaneke mezin derxinin!"*.

Bavê min xeberê ji apê min ê Sulhedîn ra dişîne. Çimkî apê min li hêleke din bûye. Bavê min bi apê min ra xeberdide, pey ra diçin cem Şêx. Bîst kes ji vir bi rê dikevin, tên derbasî Turkîyê dibin. Kurê Seyîdxan Sulhedîn jî tevî wan dibe. Yuzbaşîyek û merivekî wî jî bi wan ra bûne. Apê min Sulhedîn ji yuzbaşî dikeve şikê û fikra xwe ji bavê min ra dibêje. Hevalekî wan ê şareza hebûye. Ew jî dikeve şikê. Di navbera Mêrdînê û Dîyarbekirê da li cîhekî disekinin. Dem esir bûye, li wir jî sarînceke avê hebûye.Ew li wir destmêj digirin, nimêja esrê dikin. Ew merivê yuzbaşî lê dixwe û wî hevalê wana dikûje. Dibêjin bêhemdî wî ew hate hatîye kuştin. Ew yuzbaşî jî qaşo bi sedemên sîyasî çûye, derbasî Sûrîyê bûye.

Bavê min û apê min ji Şêx ra dibêjin,

*"Eva xayin e. Ewê me giştika bibe bide kuştin."*

Şêx Evdilrehîm Efendî guh nade wan, wî yuzbaşîyî çi kirîye, bi çi teherî kirîye êdî nizanim Şêx îkna kirîye. Bawerîya Şêx bi wî tam bûye. Ji wir dimeşin tên deşta Dîyarbekirê. Wexta ku têne cîhekî asê, yuzbaşî digre Şêx dide pişta xwe û wî ji avê derbas dike. Bavê min û apê min mêzedikin ku Şêx wekî kurê xwe pê bawer e. Qefîle tê, li cîhekî bi dar disekine. Li wir kevirek hebûye. Apêmin ê Sulhedîn diçe li ser wî kevirî rûdinê. Tivinga xwe jî dide ser çokê xwe, dinihêre ewê hevalê

wan kuştîye, merivê yuzbaşî, rabûye vir da-wê da digere. Çavê apê min li ser wî bûye. Apê min got;

*"Min nihêrî hat, di binya min da rûnişt û tivinga xwe da ser çoka xwe. Wî tiving zîvirand û hey zîvirand. Lûla tivingê ku hat ber sîngê min, min destê xwe li lûla tivingê xist û wê de pekand. Ez rabûm ku wî bikûjim, bavê te û Şêx Evdilrehîm Efendî bi hev ra li min kirin qêrîn û gotin; 'Têkil nebê!"*

Apê min got;

*"Yuzbaşî ji me dûr bû. Em bi Şêx ra mijûl bûn, me jê ra got ev yuzbaşî xayin e. Me dibe dike dafikê."*

Me kir û nekir Şêx îkna nebû.

Apê min û bavê min dinihêrin ku Şêx qanî nabe ji wan diqetin paş da vedigerin Sûrîyê. Piştî veqetandina wan qefîla Şêx diçe, di nav zevîkî da dîsa disekine. Yuzbaşî ji wan ra dibêje;

*"Hûn li vir bisekinin, ezê herim ji nav gund nan bînim. Cilîn eskerîyê li min in, kes ji min şikê nake."*

Wexta ku diçe, wî merivê xwe jî bi xwe ra dibe. Herhal li gund qereqol hebûye. Yuzbaşî li gund bi têlsizê xeberê dide Dîyarbekirê. Ji Dîyarbekir alayak esker radibe, tê dora wana digre. Zevî genim bûyê genim jî seridîbûye. Esker agir berî zevîyê dide. Şêx Evdilrehîm û hevalên wî giştika bi zevîyê ra dişewitînin.

Li gor gotina dengbêj Şakirê Şewranşêxê, Şêx Evdilrehîm û hevalên wî ji Sûrîyê hatine, di navbera Batman û Bismilê rastî gundekî hatine. Navê gund Sînan e û nêzîkî Bismilê ye. Li nêzîkê gund rastî du merivan hatine. Navê wana Ûsivê Rehîmê û Elîyê Şarê bûne. Ew diçin, xeberê didin axayê gund Silêmanê Evdilqadir. Silêmanê Evdilqadir

jî diçe cem yuzbaşîyê Bismilê, êxbarîya wana dike û bi wî karî esker diçe ser wan û wan di nav zevîya genim da dişewitînin.

Nebîyê Seyîdxan Mistefa (Alçîn) di derheqê tarîxa vê bûyerê da awha got;

*"Ev bûyer, di serê havîna 1938an da qewimîye. Wanên ku li wir hatine kuştinê, li gundekî Bismilê defin bûne. Min bi xwe mezelên wana dîtin. Li ser kêlika mezelê Şêx Evdilrehîm tarîxa 1938an heye. Ew ji bo ku herin tevî serhildana Dersim bibin, derbasî Turkîyê dibin. Apê min ê Sulhedîn jî di wî şerî da hatîye kuştin. Ji mala me êdî tu kes nemaye."*

Dengbêjan li ser vê qewimandinê jî kilam derxistine. Bi sitrana dengbêj Şakirê Şewranşêxê kilam waha ye;

***AXAO AXAO***

*Axao axao bav û kalê te aqilmendê eşîrao*
*Camêro mêrê mêrao*
*Kula welatê Serhedê, zozanê Qicixê*
*Emerê Mihê, lawê Gulperyê*
*Di dilê te da mao*

*Axao sibe ye dilê mi ji dilanî dîn e*
*Yuzbaşyê cendirma yuzbaşîkî del û dîn e*
*Berê xwe da Sînanê dilezîne*
*Qamçîyê ji ber gîzmê dikişîne*
*Di ser serê Silêmanê Evdilqadir da dihejîne*
*Dibê ji min ra rast bibêje*
*Ew firarên ji Binya Xetê hatine kî û kî ne*

*Silêmanê Evdilqadir dibê*

*mixtaro lo lawo yuzbaşîyo bê bexto*

*Qey hûn nizanin firarên Binya Xetê kî û kî ne*

*Du cendirma bişîne pey Ûsivê Rihîme, Elyê Şarê*

*Bira wana hilde bîne*

*Lingê wana di qawîşê tivinga da bi ser hev da bişidîne*

*Qamçîyê di ser da bihejîne*

*Ewê ji we ra bêjin firarên Binya Xetê kî û kî ne*

*Yuzbaşî du cendirma dişîne*

*Ûsivê Rehîme û Elyê Şarê tîne*

*Lingê wan di qawîşê tivinga da dişidîne*

*Qamçîyê di ser wan da dihejîne*

*Dibê ji min ra rast bibêjin*

*Firarê Binya Xetê kî û kî ne*

*Ûsivê Rihîmê, Elyê Şarê dibêjin yuzbaşîyo lawo*

*Yekê wana Şêx Mizbeh lawê Şêx Noredîn e*

*Yekê wana Cemîlê Seyda Bavê Evdilbarî ye*

*Dujminê serê Romê ye*

*Eger çavê wî bi te bikeve*

*Ûrta te li dunyayê diqelîne*

*Yekê wana Şêx Şemsedîn e*

*Yekê wana Şêx Evdilrehîm e*

*Ji mala Şêx Elyê Paloye*

*Di nava hemû kesî da bejnê wana belî ne*

*Yekî wana navê wî Sulhedîn e*

*Ji mala Ûsivê Seydo ye*

*Heyf û rêça bavê xwe digerîne*
*Wane li Çola Çewlikê, zileka kampax*
*Di nava zevya genim da rûniştî ne*

*Axao axao, bav û kalê te aqilmendê eşîrao*
*Camêro mêrê mêrao*
*Kula welatê Serhedê zozanê Qicixê*
*Emerê Mihê, lawê Gulperîyê*
*Di dilê teda mao...*

*Axao li rasta Perîşanê Çola Sertîla diketim li hember e*
*Eskerê nafîamê giran e*
*Bi topa û mîtralyoza, bi kamyon û cîpa hate ser e*
*Tivinga destê Sulhedîn berxê mala Ûsivê Seydo*
*Malê Romê ye bazinzer e*
*Sulhedîn bi sê denga badikirî*
*Digo Cemîl tu bavê min kiribî*
*Çê be çê bixwebite*
*Bikûje yuzbaşî banbaşîya*
*Segbavê cendirma bide ser e*
*Eva rasta Resûla nîn e*
*Çemê Hamîd Binyamîn e*
*Ne dar e ne devî ye*
*Berxê mala Ûsivê Seydo*
*Devê tivingê çar tilya bilind ke bide ser e*

*Axao axao, bav û kalê te aqilmendê eşîrao*
*Camêro mêrê mêrao*
*Kula welatê Serhedê zozanê Qicixê*
*Emerê Mihê, lawê Gulperîyê*
*Di dilê teda mao...*

Ji hêla Mêrdînê dengbêj Cemîl Basawî jî  kilamekî li ser vê bûyerê dibêje. Pirsên wê kilamê û gotinên Ferîdûn Qamiş hevûdin digrin. Xêncî vîyayî gotinên nebîyê Seyidxan Mistefa jî vana teyîd dike.

Li gor kilama Cemîl Basawî wê çaxê fermandarê leş-kerê Dîyarbekirê Kenan Paşa (Kelhan Paşa) bûye. Kenan Paşa ekser dike "iştimayê" û dibêje; "Kî ku here Binxetê wan fîrarên navdar arxayînke û bine ewê bi dereceya herî bilind bê mukafatkirin. Ew, Şêx Evdirehîm, Şêx Mizbeh, Cemîlê Mala Seyda û Sulhedînê kurê Seyîtxan in. Yê ku here wana ji Binêxetê (Surîyê) bîne bike dafikê, ev 'onbaşi' be jî ezê wî bikim general!"

Efserekî xelkê Meletîyê navê wî "Osman Efendî" û kurmancekî bi rutbeya 'Yuzbaşî" hebûye. Ev dibêje; "Ezê herim!"

Kenan Paşa jê ra ewraq hazir dike. Tifingeke Alemanî dide û dişîne. Bi vê rusqetê di kû va here êdî serbest e.

"Osman Yuzbaşî" diçe suka Dîyarbekirê, ji xwe ra cotek çarixê mezbox û rextekî çar parçeyî dikire û lêdixe  diçe Surîyê.

"Osman Yüzbaşî" Şêx Evdirehîm, Şêx Mizbeh, Cemîlê Mala Seyda, Sulhedînê kurê Seyîtxan, Huseynê Elî Begê û hevalên wan dibîne. Bi wan re xeberdide û dibêje:

"Ez jî mînanî we ji ber zulma dewleta roma reş revîme

hatime vir. Werin em herin Turkîyê!"

Berîya wê gera em qala Sulhedîn bikin. Li gor gotina Cemil Basawî, Qedrî Beg, Mihemed Beg û Ekrem Begê Cemil Paşa wê demê li "Talukê" bûne. Qedrî Beg ji Sulhedîn ra dibêje: " Kurê min em te bişînin mektebê, ji xwe ra bixwîne!"

Sulhedîn dişînin mektebê. Kurê Mihemed Beg jî di wê mektebê da bû ye.

Rojekî ku kurê Mihemed Begê ji Sulhedîn ra ku dide çiran, ew jî tabança xwe dikişîne gulekî berî wî dide. Lawik ji ranê xwe ve birindar dibe. Xeberê didinê Mihemed Begê, dibêjin: "Sulhedîn lêxist kurê te kuşt!", Ev jî dibêje; "Karê we jê nîn e! Birê lexistîye bira kuştî ye, têkilî nebin!"

Lawik namire, ev jî çi pirsekî ji Sulhedîn ra nabêjin, wî weke kurê xwe dibînin. Peyra Cemîlê Seyda diçe, diçe bi mezinên mala Cemîl Paşa ra xeberdide, dibêje: " Eger îzna we ku hebe, ezê Sulhedin bibim cem xwe!"

Ev jî dibêjin: " Tu çawa dixwazî wusa bikî?"

Cemîlê Seyda, Sulhedîn ji mektebê derdixe, dibe cem xwe. Wexta ku 'yuzbaşî' çûye bi wan ra xeberdaye, Sulhedîn li cem Cemîlê Seyda bûye.

Şêx Evdirehîm û hevalên wi qerara xwe didinê û bi Yûzbaşi ra tên, dı Çiyayê Omeryan ra derbasî hêla Sinanê dibin. Ew dever di navbera Bismîl û Batmanê da ye.

Dîsa li gor gotina dengbêj Cemîl Basawî, ew ku tên ber gundê Qerecuxê, Cemîle Seyda ji hevalê xwe diqete, diçe nav gund bi muxtar ra xeberdide. Ji muxtar dipirse ku rewşa hêzen dewletê li wê hêlê çawanin. Muxtar jê ra dibêje: "Keremke were hundur, runê em ji te ra nan-xwarinekî bînin,

nanê xwe buxwe, hineki raweste, ezê ji te ra salix bidim. Cemîlê Seyda ku diçe hudur rûdinê muxtar û merivên wi lê tên hev, wi digirin û girêdidin. Peyra muxtar meriveki xwe dişîne qereqola "Şeletê" û xeberê dide hukmatê. Lê gor pirsên kilama Şakirê Kopê Cemilê Seyda bi hevalên xwe ra bûye û şer kirîye.

Disa li gor pirsen kilama Cemîl Basawi, "Yuzbaşi" di wê arê da ji wan qetîya ye û çûye ji ciyeki nêzik telefonî Diyarbekrê kirîye. Kenan Paşa ku xeberê hildide, tevi alayik ekser tê dora wana digirê, bi top û tiving û mitralyozan va bi wan ra dikeve şer.

Li gor gotina nebîyê Seyîdxan gellek milîsan ji bi ekser ra erîşî wana kirine. Ew gelleki ber xwe didin, şer demeke dirêj dom dike, ekser zêde newêre ser wan da here, asil milîs êrişê dibin ser wana.

Milîsek ji nêzikî va gulleki beri Şêx Evdirehim dide û wi xedar birindar dike. Sulhedin jî hema ye kozika xwe radibe erişî wi milîsi dike û wi dikuje. Peyra jî diçe ser Şêx, dibêje: "Min di saxiya te da heyfa te hilda, te bi çavên xwe dit, bira dilê te rihet be! Ji me ra jî xwedê kerim e!"

Efser (Kenan Paşa) dinihêre ku bi wi karî nikare şervanan ji holê rake, emir dide leşker û dibêje: "Agir berî zevîyêdin" Lewra şervan di nav zevîya genim da bûne û genim ji seridîbûye.

Dawîyê da ku leşker ji çaralî va agir berî zevîyê didin, hemû şervan bi zevîyê ra dişewitin û jiyana xwe wunda dikin.

Li gor gotina nebîyê Seyidxan, Mistefa Alçin; merzelên van şervanan 3 km nêziki gundê Şeletê li ber rêya Batman û Bismilê ye.

## 'PAŞAYÊ DEWLETÊ DIVÊ HEFT ZIMANÎ ZANIBE, ÇAWA KURMANCÎ NIZANE?'

Bi wan kirinên xwe va Delû Kemal baş dikeve çavê dewletê. Paşê dibe general û li Qerekilîsê dest bi wezîfê dike. Rojekî qamçîyê wî di desta da, li pêşîya mahfêla eskerîyê pêgermokê digerîne. Mahfêl di nava bajêr da ye. Hew dibîne ku gundîyekî bi şaşik di sûkê da dimeşe. Emir dide eskeran;

*"Wî gundîyê bi şaşik bigirin û bînin!"*

Esker bi lez û bez diçin gundî dibin cem Delû Kemal.

Delû Kemal dibêje;

*"Lo ker kurê kerê, tu çito wetandaşê vê dewleta cûmhûrîyetê yî? Tu di sûkê da bi pêç û şaşik digerî... ma tu çima nizanî em ji bo pêç û şaşikê serê merîyan difirînin?"*

Digre çend qamçîyan dikişîne zoxê gundî. Belengazo bi Tirkî nizanîbûye. Bi Kurmancî dibêje;

*"Olo ev kî ye? Çima li min dixe?"*

Delû Kemal dinihêre ku gundî bi Tirkî jî nizane, bêhtir hêrs dibe, digre dîsa çend qamçîyên din dikişîne zoxê wî û dibêje;

*"Hela li min û vî kurê kerê... Him bi pêç û şaşika xwe va hatîye nav bajêr û him jî bi Tirkî nizane."*

Gundî qet rewşa xwe naguhêrîne, bi xwînsarî dîsa ji wan kesên dora Delû Kemal dipirse;

*"Olo heyran, ev kî ye? Bi çi heqî li min dixe?"*

Ji wana yek bi Kurmancî bersiv dide û dibê;

*"Eva paşayê dewletê ye. Pêç û şaşik qedexe ye. Ji bo wê li te xist. Îja dît ku tu bi Tirkî jî nizanî, bêhtir hêrs ket."*

Gundî dipirse û dibêje;

*"Niha ev camêr paşayê dewletê ye?"*

Mêrik dibê;

*"Erê lê, ew paşayê dewletê ye."*

Gundî dike niçe niç û dibê;

*"Çima paşa bi Kurmancî nizane?"*

Delû Kemal bi hêrs dipirse;

*"Ev çi dibêje?"*

Ew merivê li cem wî gotinên gundî jê ra tercûme dike.

Delû Kemal pir hêrs dikeve û dibêje;

*"Kurmancî çi ye ku ez zanibim?"*

Gundî dibê;

*"Paşa çima hewqas hêrs ket?"*

Mêrik dibê;

*"Paşa dibê Kurmancî çi ye ku ez zanibim?"*

Gundî dibêje;

*"Jê ra bêjin, jê ra eyb e eyb. Qoce paşê dewletê divê heft zimanî zanibe, çawa Kurmancî nizane."*

Zilam vê gotinê jî ji Delû Kemal ra tercûme dike.

Delû Kemal ji dara xwedê dikeve, dike qirin û dibê;

*"Zû vî ji ber çavên min winda bikim. Ewî ez bi cina xistim."*

Mêrik ji gundî ra dibêje;

*"Bavo zêde xeber nede, te paşa pir bihêrs xist, lêxe here."*

Gundî dibê;

*"Wayyy! Paşê dewletê çiqas bêhnteng e."*

Pişta xwe dide wan û diçe.

## KÎ HAT Û KÎ NEHAT?!

Kurê Elîcan yê piçûk Hecî Silêman got;

- Bavê min û hersê apê min jîyana xwe winda kirin; Elîcan, Evdilhemîd, Feyzula û Evdilbaqî. Apê mînê Evdîlhemîd di artêşa Fransî da dest bi vazifeyê dike, dema ku ev li ber depoyê nobedar bûye, wî çend kesên ku hatine dizîya sîlehan bikin, gule berî hev dane, li wêderê apê min tê kuştın. Pişt vê bûyerê ra apê minê Evdilbaqî û yekî ermenî şer dikin, ev jî di wê pevçunê da tê kuştin. Tenê birayê min Mihemed Reşîd sax ma. Ew heta sala 1950 li Sûrîyê bû. Piştî hilbijartina 1950yî ku efû derket, ez çûm Sûrîyê, min ew û Alîyê Gewrê anîn. Li Helebê ez bi yekî Ermenî ra hevnas bûm. Ewî û Mihemed Reşîd hevûdu nas dikirin. Ew camêr ji alîyê Edenê çûbû. Wî û bavê min bi hev ra şer kiribûn. Mêrik ji min ra got;

*"Kurd Elî Begê şerê me kir. Berî me da, em ji welatê me avêtin. Heger Kurd Elî Beg nebûya qet Romê bi me nekarîbû. De îja li şuxulê xwedê mêze bikin; ewî bi me ra şer kir, em kuştin, Romê jî berî wan da ew kuştin."*

Kurê kurapê Elîcan Ferîdûn awha got;

*"Bavê min Evdilezîz û apê min Sulhedîn gava ku ji Şêx Evdilrehîm vediqetin, şûnda diçin Sûrîyê. Hukûmeta Firansî di artêşa xwe da wan wezîfedar dike. Ez di sala 1937an da li Sûrîyê hatime dinyayê. Paşê ku efû derket, bavê min em û dîya me şandin. Paşê jî ew û apê min hatin."*

Ji malbata Seyîdxan kes namaye. Tenê du-sê pismamên wî ji Sûrîyê vegerîyane hatine. Di serhildanê da xêncî Seyîdxan birayê wî Tewfiq, kurê wî Sulhedîn, birazîyê wî Mistefa jîyana xwe winda kirîne.

Fesihê Mihê Mîrze ji di sala 1937an da ku ji alîyê Fransî-yan va hatîye girtin, Fransîyan ev teslîmî Turkîyê kirine. Ew hetanî sala 1944an di hepsê da ma ye. Paşê hatîye berdan...

## PÊYWENDÎYÊN MELE MISTEFA Û SEYIDXAN

Li gor salixê salixdanan Mele Mistefa salekî berîya serhildanê, ango di sala 1930 î da hatîye mala Seyîdxan bûye mêvanê wî. Li gor gotina merivên bi emir, Mele Mistefa neh roja li cem Seyîdxan maye. Bi texmîn ewî jî bihîste kû Seyîdxan li çareserîyekî digere, lema hatîye pê ra xeberdaye.

Di sala 1966-1967an da Mele Evdilayê Timoki çûye Kurdistana Iraqê Mele Mistefa dîtîye. Mele Mistefa ji Mele Evdilayê Timoki pirsa malbata Seyîdxan kirîye. Gotîye;

*"Gello ji zarê Seyîdxan kî heye, ew niha çi dikin, hal wextê wana çawa ye?"*

Mele gotîye;

*"Welle kurekî wî û qîzeke wî û çend nebîyên wî hene."*

Lî gor gotina nebîyên Seyîdxan Heci Sulhedîn û Mistefa, Mele Mistefa ji bavê wan Birêz Mitliq ra namek nivîsandîye. Di namê da gotîye;

*"Bavê te ji bo me zilamekî bi rêz û hurmet bû, eger kû hûn dixwazin, werin li cem min bi cih bibin!"*

Fotoxrafekî xwe jî kirîye zerfê ji kurê Seyîdxan ra şandîye.

Mistefa got; *"Piştî dozdê Adara 1971 î da polês û eskeran kû diavêtin ser mala û bahoza terorê li ser gel dimeşandin, meta min ji tirsa ew name şewitandîye, di destê me da hew ew sûretê Mele Mistefa tenê maye"*

Nebîyê Seyîdxan Hecî Sulhedînjî got; *"Wexta kû bavê min di sala 1987î da wefat kir, birêz Mesût Berzanî ji bo ser saxîyê ji meta min ra nameyek şandibû.*

## *EW KESÊN KU MIN PÊ RA XEBERDA, HEVPEYVÎN KIR Û JI ZANÎNAN WAN ÎSTIFADE KIR*

1) Hecî Silêman (Ak), Kurê Elîcan. Qereyazî
2) Hecî Evdilezîz (Kamîş), Kurapê Elîcan. Qereyazî
3) Sulhedînê Hido (Kamîş), Kurapê Elîcan. Qereyazî
4) Ferîdûn Qamîş, Kurê Hecî Evdilezîz. Qereyazî
5) Mihemed Qamîş, Kurê Hecî Evdilezîz. Qereyazî
6) Mahmûdê Mihê, Kurkurapê Elîcan. Qereyazî
7) Xalit Ak, Kurê Mahmûdê Mihê. Qereyazî
8) Evdilqadir Ak, Nebîyê Elîcan. Qereyazî
9) Hecî Sulhedîn, Nebîyê Seyîdxan. Mûş
10) Mistefa, Nebîyê Seydixan. Mûş
11) Şahîn, Nebîyê Seyîdxan. Mûş
12) Qîyasedîn Emre. Parlamenterê Mûşê yê kevn
13) Şex Emînê Pîyongê, Pismamê Seyîdxan. Mûş
14) Dr. Mûzafer Demîr, Pismamê Seyîdxan. Bilanix
15) Fesihê Mihê Mîrze (Kaya). Milazgir
16) Esad Kaya, Kurê Fesihê Mihê Mîrze. Milazgir
17) Mihemedê Qancîyan (Bîlîz). Qereyazi
18) Necmedîn Kanad, Pismamê Elîcan. Qereyazî
19) Munîr Bînîcî. Gundê Sêylemeza Jorîn, Qereyazî
20) Fetula Cîftçî. Gundê Meleosman, Qereyazî
21) Mihemedê Hecî Resûl. Gundê Qirimqayê, Xinûs
22) Hecî Mihemed (Mihemedê Selbîyê). Sarîqamîş
23) Husamedîn Ozturk, Kurê Xalis Begê. Tûtax
24) Xalis Ozturk, Nebîyê Xalis Begê. Tûtax
25) Îshaq Öztürk. Gundê Canbegayê Xerabe, Elaşgir
26) Hecî Sêwdînê Remedana. Elaşgir
27) Mele Seyîdxan. Qereyazî
28) Kemal Şenol. Gundê Delîkîyê, Qereyazî
29) Kemal Aras (Mao Kemal). Qerekilîs
30) Xalitê Şano. Gundê Kejik, Qereyazî
31) Mele Mihemed. Gundê Nordînê, Milazgir
32) Fîrar Alabay, Kurê Emerê Perê. Gundê Korsvagê Motka
33) Vedat Alabay, Kurê Fîrar. Modka
34) Mihemed Zeynedîn Unay. Qiziltepe, Mêrdîn
35) Mihemed Çelik. Gundê Karbilasê, Xoresan
36) Mele Ehmed. Gundê Qerecan, Tûtax
37) Kemal Subhandax, Nebîyê Kor Husên Paşa. Patnos
38) Salîh Şahîn. Gundê Înaqa, Varto
39) Evdirehman Ayhan gundê paywêran-Qereyazî
40) Hesen Şekercî gundê paywêran-Qereyazî
41) Dr. Omer Uluçay



Seyîdxanê Ûsivê Seydo




Mele Mistefa Berzanî ew wêne yê xwe ji kurê Seyîdxan Mitliq ra şandîye.



Dengbêj Şakirê Kopê (Şakroyê Piçûk)



Mistefa Alçin (Nebiyê Seyîdxan)



Hecî Silêman (kurê Elîcan yê piçûk)




Mihemedreşît (kurê Elîcan yê mezîn) û kurê wî Mucahît




Tewfiq (birayê Seyîdxan) û Fesihê Mihê Mîrze




Fesihê Mihê Mîrze (Hepsa Mûşê, 1977)



Kûrê Fesih Esat Kaya



Mehmûdê Mihê (kurê kurapê Elîcan)



Mitliq (kurê Seyîdxan)



Evdilezizê Hido (kurapê Elican)



Sulhedînê Hido (kurapê Elîcan)




Hecî Sulhedîn (nebyê Seyîdxan)



Feridun Kamiş (kurê Hecî Evdilezîz)



Halit Ak (kurê Mehmûdê Mihê)



Kurê Hecî Evdilezîz Şexmus Kamış



Şêx Qiyasedin û Ahmet Aras



Hacî Ak (kurê Hacî Silêman)



Emerê Perê û kurê wî Firar Alabay




Hecî Mihemedê Selbi Xanimê û Ahmet Aras



Merzelê Seyîdxan (li hinda Sultan Şexmus)




Deverên Serhildanê




Ciyên ku şervan lê şer kirine û tê ra derbasbûne çûne Binxetê



**Ahmet Aras;** di sala 1944an da li gundê Qereyazîyê, li Melleosman hatîye dunyayê. Di sala 1961î da lîse qedand. Pey ra Fakulteya Karsazîyê ya Zanîngeha Erzurumê xilas kir. Di salên 1965-66an da ji sedemên sîyasî hate girtin.

Piştî Darbeya Leşkerîyê ya 1971î derket derveyî welêt. Li Swêdê bi cîh bû, hetanî sala 1978a li wir memostatî kir.

Piştî darbeya 1980yî da carekî din hate girtin.

***

Di sala 1963ya da di kovara "***Dîcle - Firat***"ê da nivîsên wî hatin weşandin.

Di salên 1969-1970yî da li ser pirsgireka Kurdî di Kovara "***Ant***"ê da gotarên wî hatin weşandin. Ji wê demê wirda di gelek kovar û rojnameyan da nivîsen wî hatin weşandin.

Ji mêj va li ser çand û edebîyata Kurdî lêkolînan dike.

Ji wan xebatên wî; destana "***Kerr û Kulık***" ya "***Sîyabend û Xecê***" di sala 1993ya da, lêkolîna li ser "***Evdalê Zeynikê***" jî di sala 1996a da hate çapkirin.

Destana "***Kerr û Kullik***" di sala 1995a da li Swîsre bi zimanê Almanî hate weşandin.

ISBN 978-975-9010-99-7